**zûrafa:** zuraf (n), zurafa (m)



Sönmez, N. (2021). Dua di Edebîyat û Folklora Kurdan da – Mînak Herêma Hekkariyê, The Journal of Mesopotamian Studies, 6 (1), 43-60 DOI: 10.35859/jms.2021.865486.

---

#### MAKALE BİLGİSİ/ARTICLE INFO

---

Article Type/Makale Türü: Research Article /  
Araştırma Makalesi  
Received / Makale Geliş Tarihi: 21.01.2021  
Accepted / Makale Kabul Tarihi: 08.03.2021  
Doi: 10.35859/jms.2021.865486

# DIA DI EDEBÎYAT Û FOLKLORA KURDAN DA -Mînak Herêma Hekarîyê-

Nesim SÖNMEZ

Doç. Dr., Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Enstitû-  
ya Zimanê Zindî, Beşa Ziman û Çanda Kurdî,  
e mail: nesimsonmez@gmail.com, <https://orcid.org/0000-0002-6315-6075>

#### KURTE

Folklor, ji ber ku çanda maddî û manewî ya gelerî derdixîne pêşberî mirovan û nasnameya miletan dide ber çavê mirovan ji bo her mileti muhîm e. Mijarên folklorê gelek zêde ne û ev zanist, wan mijaran ji gelek alîyan va vedikolîne. Ji mijarên folklorê yek jî dia ye. Tê zanîn ku di diroka mirovatîyê da dia hebûye û di nav edebiyata devkî da jî cihek girîng girtî ye. Di navbera mirovan da dema têkilîyek xweş tê danîn di bersivdayînê da hewcedarî bi gotinek xweş heye ku ji vê gotinê ra dia tê gotin. Di nava kurdan da edebiyata devkî gelek dewlemend e, ji wan dewlemendîyê vê edebîyatê yek jî dia ye. Di diroka kurdan da bi sedan sal e hevokên diayan têne gotin û ew hevok wek qalib cih girtine. Ew diayênu ku di nav gel da têne gotin li gorî herêman jî xwedîyê hinek cudahîyan in. Em di vê gotarê da li ser diayan û bi taybetî jî li ser diayênu ku li herêma Hekarîyê têne kirin, disekezin û wan li gorî rê û rîbazêñ edebiyata gelerî dinirxînin.

**Peyvîn Sereke:** Bawerî, Çand, Dia, Hekarî, Edebîyata Devkî.

### Kürt Edebiyatı ve Folklorunda Dua - Hakkari Bölgesi Örneği

#### ÖZ

Maddi ve manevi kültürü ortaya çıkardığı için folklor her millet için önem arz etmektedir. Pek çok konu ve alanda araştırmalar yapan folklor bilimi araştırma alanlarını farklı yönlerden incelemektedir. Folklorun ilgi alnlarından biri de duadır. Duanın insanlık tarihi boyunca varolduğu ve sözlü edebiyat alanında da önemli bir yeri olduğu kabul edilmektedir. İnsanlar arasında iyi ilişkilerde olumlu bir cevap verme gereği hissedilmektedir, bu cevaplara dua denilmektedir. Kürtler arasında çok zengin bir sözlü edebiyat geleneği bulunmaktadır, bu zenginliğin bir kısmını da dualar oluşturmaktadır. Kürtler arasında yüzyıllar boyunca dua sözleri söylendiği için bu sözler kalıp sözlere dönüşmüştür. Dua şeklinde ifade edilen sözler yöresel farklılıklar da arz etmektedir. Bu çalışmada dua, özellikle Hakkari bölgesinde edilen dualar üzerinde duracak ve o duaları halk edebiyatının yöntemleri ile değerlendireceğiz.

**Anahtar Kelimeler:** İnanç, Kültür, Dua, Hakkari, Sözlü Edebiyat.

#### Prayer in Kurdish Literature and Folklore -Hakkari as Sample-

#### ABSTRACT

44

As it contents concrete and abstract values of a culture, the folklore is very crucial for national identity. It demonstrates every historical and cultural points of life. The folklore has got many subjects and studies those subject in many various ways. Prayer is one of those topics that folklore is interested in. As it is known, prayer has been performed since the human was created. Besides, it is a fact that prayer is also an important topic for oral literature. When people chatting and getting related they need to use pleasing speeches and words which are named as prayer as they carry positive effects. Kurdish oral literature is strong and very rich in terms of prayer. Prayers have been used among Kurds for a long time and they have become daily and common phrases. Prayers differ from region to region as well. Through this present we would like talk about prayer importance in Kurdish folklore, especially in Hekarî cultural tradition in terms of folklore science.

**Key Words:** Belief, Culture, Prayer, Hekarî, Oral Literature

#### Extended Summary

Folklore is important for each nation as it reveals the material and spiritual culture of a people. Folklore has many subjects, and this branch of science deals with and explores its subjects from many angles. One of these subjects is prayer. As it is known, there is prayer throughout human history and it has an important place in folk literature. When a good relationship is established between people, the need to make beautiful and meaningful sentences arises during the conversation. Making these beautiful wishes is called prayer. In Kurdish literature, sentences containing prayer have been used for centuries. These sentences have taken place in folk culture as idiomatic expressions. These exp-

ressions used among in community also show some changes from region to region. In this article, we investigated the general prayer ritual performed by the public. Then, we investigated how prayer is performed among the people in Hakkari province and region, which sentences are used and what are the features of these sentences.

In the introduction of the article, we briefly touched on the etymology of the word folklore. Later, we tried to show what this concept meant. We mentioned what kind of studies on the subject in the field of Kurdish folk literature were done by whom. In the first part of the article, what the word prayer means in general, since when such a worship has been done, why people need such a worship, what the subjects of prayer are, etc. we asked questions and tried to answer them. In the second part, we examined the place of prayer in literature in general. In the third part, we investigated how prayer takes place in the literature and folklore of Hakkari province. In our research in this section, Ahmedî Khani, Fakiyi Teyran, Melaye Bateyi etc. who lived in Hakkari region and worked in the field of classical Kurdish literature. We tried to explain how poets use prayer sentences in their poems by giving examples from their poems. While researching prayer, which is one of the subjects of folklore, we went to Hakkari province and its region and did fieldwork. We met face to face with the people living there personally and compiled the kind of prayer phrases they used. Later, we have determined to classify these prayer sentences that we have compiled and which prayer sentences should be examined under which title. As a result of classifying the compilations we made, in general; belief, clothing, illness, fortune and luck, condolences, eating and drinking, children success and protection, marriage and family, road and travel, etc. We came to the conclusion that there was certain prayer for each matter.

45

Although prayer is a religious concept, it has an important place in the life and culture of every nation. Undoubtedly, one of them is literature, especially folk literature. This subject is included in most of the literary works written both in verse and prose. The same is true for Kurdish literature. As a result of our researches, we have seen that both in classical Kurdish literature and Kurdish folk literature, the subject is sometimes included in the subject of the work, sometimes in a part of the work, and sometimes it is interspersed between the topics in the work.

We have seen that the Kurds have a deep-rooted belief and that they firmly preserve these beliefs, and we have seen that they manifest their beliefs in this field as well as in other fields. In Kurds, as in other nations, prayer is made not only for worldly wishes but also for requests for the hereafter. When people pray, they express their unconditional submission to the greatness and authority of Allah with their language, state and actions. When people pray, they do so by taking refuge in their creator, who is their only guardian. People pray for their spouses, friends, relatives and children as they pray for themselves. In general, when Kurds pray, they ask for worldly possessions, to have children, ask be happy to married couples, ask for mercy for the dead, condolence to grieving people, protect those in danger, etc. they pray and beg God for different matters. We have seen that there is not a big difference between the prayers made in Hakkari region and the prayers made in other regions, but the prayer phrases are expressed using the local dialect.

## Destpêk

Folklor, bi eslê xwe peyvek îngîlizî ye û ji peyva “folk” yanê gel û “lore” yanê zanist an jî lêkolînê pêk tê (ji Dundes, 1980 vgz. Keskin: 51). Folklor wek zanist, çanda maddî û manewî ya gelerî li gor rîbazên xwe yên taybet vedikolîne, berhev dike, disenifine, şîrove dike û di dawiyê da jî di navbera wan da sentezekê çêdike (ji Gennep, 1924: 6 vgz. Yıldırım, Pertev, Aslan, 2013: 11; Örnek, 2000: 15) e. Li gor Kaya, folklor ew zanist e ku çanda gel; vêdikolîne, berhev dike û digihîne sentezekê (2007: 327). Li gor Artun jî folklor, di jiyana mirovan da ji dayîkbûnê hetanî mirinê, hemû hêmanên çanda maddî û manewî vedikolîne, wan dinirxîne, şîrove dike û serencama pêşketina çanda gel nişan dide û di navbera wê çandê û yên din da cudahî û hevbeşîyan tesbit dike (2010: 16).

Hema mirov dikare bibêje çalekiyên jiyana gelerî bi giştî mijarên folklorê ne. Di derbareyê mijara folklorê da Celadet Bedirxan (1893-1951) dibêje ku “*folklor tevaviyata adet, çîrok û stranê milletekiye. Ev adet, çîrok û stranê ku ji nav xelkê bi der ketine û di dora nifşan da bi ser ve ketine û gihaştine nifşen nû.*” (2012: 514). Wek tê zanîn ku folklor beşek ji mijarên çandê ye. Ji ber vê sedemê mirov dikare bibêje dîroka folklorê bi dîroka mirovahiyê ra destpê kirîye.

Naveroka folklorê ji mît, efsane, çîrok, bijîşkiya gelerî, pêşbaziyên gelerî dia, nifşir, dijûn û hwd pêk tê (Dundes, 2007: 328). Ji ber ku mijara me di folklorâ kurdî da dia ye emê vê mijarê tenê binirxînin.

Di edebîyata kurdî da têgeha folklorê bi wateya zanista gelêri yan jî lêkolîna li ser gel tê bi kar anîn. Celadet Elî Bedirxan derheqê têgeha folklorê da wiha dibêje “*Folklor; zanîn an zanistiya xelkê ye.*” (2012: 514). Ji folklorê ra kurdên Kurmanc “zargotin” û “zanista gel”, Soran “xelknasî” û Zaza jî “zanistîya şarı” dibêjin. Wisa xwîya dike ku cara ewil kurdên herêma kafkasyayê têgeha folklorê bi kar anîne û kitêbek bi navê *Folklorâ Kurmanca* weşandine (bnr. Cindî, 2008).

Di warê folklorê da ji alîyê kurdan va jî gelek kesan xebatê baş kirine. Di vî warî da cihê Mela Mehmûdê Bazidî gelek girîng e. Wî bi rojhilatnâse Rûsi Alexandre Jaba (1801-1894) ra li Erzurumê li ser dîrok û çanda Kurdî gelek xebat kirine. Wek mînak ji wan berhemên wî yek jî bi navê *Adat û Rusûmâtnameyê Ekradiye* ye. Ji bili Bazidî jî gelek kesan wek Hecîyê Cindî, (1908-1990) Celîl Celîl (1936-....), Ordîxanê Celîl (1932-2007), Mihemed Tewfîq Wirdî, Sadiq Bahaddîn Amêdî (1918-1982), Elaeddîn Secadî (1907-1984), Mihemed Mukrî, Seydayê Tîrêj (1932-2002), Îzedîn Mustefa Resûl (1934-2019), Şukriye Resûl Îbrahîm (1951-....), Mehmet Emîn Bozarslan (1934-....), Emînê Evdal (1906-1964), Qanâtê Kurdo (1909-1985) û gelek kesen din di vî warî da xebat kirine lê hetanî vê gavê listeyeke bi rîkûpêk nehatîye amadekirin.

Armanca me ji vê xebatê ewe ku me xwest di edebiyat û folklorâ kurdan da bi taybetî jî di herêma Hekarîyê da dia çawa û bi kîjan hevok û gotinan tête kirin bi kar anîn em li ber çavên lêkolîner û xwendevanan raxînin. Lewra ev mijar heta roja îro di jîyana kurdan da heye û wisa tête xwîyakirin ku ewê berdewam jî bike.

Di xebata xwe da me ji alîyekî va ji berhemên nivîskî sûd wergirt ji alîyê din va em li herêma Hekarîyê derketên qadê û me bi niştecîhê herêmê ra rûberû hevditîn çêkir. Li gor çavkanîyên zindî gotin û hevokên diayan ên ku di herêmê da têne bi kar anîn me ew qeyd kirin, senifandin û nirxandin. Me di nav çavkanîyên zindî da jî kîjan dia ji kî/ê hatîye girtin jî wek çavkanîyên zindî nişan da.

## 1. Dia

Di bin vê serenavê da em bi gelempêrî li pey şopa pirsên wek gelo wateya diayê çî ye, kengê destpê kirîye, hewcedarîya mirovan çi bi diayan heye û mijarêni diayan çi ne, ketin û me hewlida ku em bersiva wan pirsan bidin.

### 1.1. Girîngîya Dia û Hewcedarîya bi Wê

Ziman, wesleyek ji wesleyê bedena mirovan e û mirov dikarê bi wê wesleyê hestêni xwe û fikrêni xwe bibêje. Însan, bi ziman; xemgîniya xwe, kêfxweşîya xwe kelecana xwe, hêrsa xwe, diayê xwe û hwd ifade dike. Em di vê xebata xwe da di nava gelê kurd da bi taybetî jî li herêma Hekarîyê dia çawa têne kirin sekinîne.

Peyva “dia” yê bi eslê xwe peyveke Erebî ye, ji lêkera “de-‘a”yê hatîye dariştin û tê wateya *alîkarî xwestin, deng lêkirin, gazîkirin, lavakirin, şandin, vexwendikirin û berîdayîna Xwedê* (Îbn Manzûr, 257-262; er-Razî, 1995: 86; Feyyûmî: 194; el-Fîrûzabadî, 1995: 1154-1155). Dia di nava civata mirovahîyê da wek unsûrek muhîm cih girtîye. Him di dînê semawî da him jî di dînê ne semawî da cihek taybet ji bona diayê heye. Her weha di edebiyat û dîroka her milefi da giringîya diayê bi awayekî eşkere xwe dide xwîyakirin. Mirov dema berê xwe dide edebiyata kurdfî dibine ku kurdan jî xwe ji vê rastiyê dûr nexistine û qîmetek gelek muhîm dane diayê. Mirov dema metnêni klasik yên edebiyata kurdfî di ber çavan ra derbas dike dibine ku şairêni kurdan di berhemêni xwe da gelek caran daxwazêni xwe û hêvîyêni xwe bi rîya diayê di helbestêni xwe da hûnandine.

Bi armanca ku hewcedarîyêni xwe yên dinyayê bi cih bînin û di axretê da jî xwe bigîhînin meqamêni bilind alim, sofî û welîyan qîmetek mezin dane diayê. Li gorî ehlê tesewufê dia; kilîla hewcedarîyê, stargeha hewcedaran û destengan e (Timurtaş, 2018: 23). Bawermendêni dînê İslâmî gelek girîngî dane diakirinê. Lewra Nebî Mihemed (s.x.l.) di derheqê mijarê da “*Dia, çeka mu’minan e, histûna dîn e û ronahîya erd û asîman e.*” (Nîşabûrî: 429). Tê zannîni ku dema mirovek dia dike di tevgera wî/ê da serastkirin çêdibe û nefspîçûkî û dilnizmî lê xwîya dike. Ji ber ku mirovek dema dia dike bi aram dibe û dizane ku hêzek mezin heye û ew, dema gazi wê bike ew hêz tê hewara wî/ê. Ev rewşa hanê jî kul û kederêni di dilê wî/ê da hene vedigerîne bal rihetîyê û aramîyek dide rihê wî/ê.

Li gorî pisporêni derûnnasîyê dia yek ji dermanê nexweşîyêni derûnnasîyê ye. Gelek derunna dibêjin ku bi piranî sedemêni nexweşîyêni derûnnasîyê û tenegezarîyê xem û giranî ye, tedawîya wan jî parvekirina pirsgirêkî bi dostêk dilgerm û dilnerm ra dibe. Lewra veşartina van pirsgirêkan, nexweşîyêni bi vî rengî girantir dike. Kesekî/ê xemgîn dema gazi Xwedayê xwe dike, daxwazêni xwe jê ra dibêje û jê alîkarîyê dixwaze bîhna wî/ê fireh dibe û qey tu dibêjî barek mezin ji ser pişta wî/ê rabûye. Ji ber vê yekê dia yek ji serkanîya tendurustîya ruhî ye (Ehmed Hîcazî, 2007: 43).

Yek ji girîngîyêni diakirinê jî ew e ku kesê/a ku dia dike qabiliyeta wî/ê ya di alîyê ziman û edebiyatê da bi pêş va dikeve. Ji ber ku mirovek dema ji bona mijarêni cur be cur diayêni cuda cuda ji ber dike û wan dibêje, ev yeka hanê jî raterast an jî ne rasterast tesîreke mezin li ser fîkr û ramanêni wî/ê çêdike û wî/ê di vî warî da dike xwedîyê xezîneyeke mezin (Timurtaş, 2018: 26). Mirov dikare bibêje dia tesîrek berbiçav di jîyana mirovan da, di tevgera wan da û di fîkr û ramanêni wan da çêdike.

### 1.2. Dîroka Diayê

Di destpêkê da zanîna li ser derketina diayê û cihgirtina wê di nav zanistên din da ji bo têgehiştina mijarê gelek muhîm e. Bi armanca hînbûna pêvajoya derketina têgeha diayê hewce ye mirov di mîtolojîyê da li pey şopa wê bigere. Lewra tê zanîn ku fikra bawerîya bi Yezdan ji sedsalêن berê heta niha bi mirovan ra heye. Her çiqas mîtolojî di derheqê Yezdan da fikreke seretayî be jî ew temsîlîyeta fikr û ramanêñ berîya xwe jî dike. Heta mirov dikare bibêje destpêka têkilîya di navbera mirovan û diayê, destpêka mîtolojîyê ye. Lewra mîtolojî, quwet û hêza mirovan sinordar dike û wê quwetê dişîne cem hêzên xwezayê û li bende ye ku ew ji wan alîkarîyê bixwaze. Bi vî rengî dia yek ji îbadetê kevnare hatîye qebûlkirin (ed-Debbax, 1992:129; Timurtaş, 2018: 29).

Eger mirov berê xwe bide şaristanîyêñ kevnare, dibîne ku mirovan di wan deman da ji xwe ra gelek yezdan qebûl kirine, daxwazêñ xwe bi rêya dia ji wan xwestine û ji wan ra qurban serjê kirine. Wek mînak ev yeka hanê di şaristanîya Rojhilata Dûr, Mezopotamya û Misrê da jî heye (Timurtaş, 2018: 29). Di Cihûtî û Xaçperestîyê da dia di nav doktirênen pirtûka pîroz da derbas dîbin. Minakêñ diayan him di Încîlê da him jî di Tewratê da gelek hene (bnr. Kutsal Kitap, 2002: 676-784).

Eger mirov berê xwe bide dîroka diayê û li ser lêkolînan bike dibîne ku koka wê ji quncikêñ dîrokê tê. Hema mirov dikare bibêje dîroka diayê bi Adem Pêxember destpê dike.

Di Qurana Pîroz da Xwedê Teala emr û ferman dike û dibêje: “(*Xwedê Teala got*) *Ey Adem! Tu û kevanîya xwe (Hewa) li bihiştê bi cih bibin, hûn çawa divêñ wisa jê bixwin. Lébelê nêzî vê dara hanê nebin, (eger hûn jê bixwin) edî hûn ê bibin ji sitemkaran. Şeytan, ji bo ku ji dara qedexekirî bixwin ji her duyan ra weswese çêkir ku şermgeha (awretê) wan a vesartî nîşanî wan bide. (Ji wan ra) Got: Bes ji bo ku hûn nebin melek, an jî hûn heta bi hetayê lê nemînin, Xwedayê we hûn ji (xwarina) vê darê dane paş. Ji wan ra sond xwar (û got): Bi rastî ez her ji bo we şîretkar im. Edî bi hîle û pîle dar ravayî wan da. Dema ji fêkîyêñ wê xwarin, şermgeha wan, ji wan ra dîyar bû û hema dest avêtîn pelên darên bihiştê û xwe pê nixûmandin. Xwedayê wan gazî wan gir: Ma min ev erd li we qedexe nekiribû Şeytan ji we ra neyarekî eşkere ye?!*” (Quran, 7/19-22).

Adem pêxember û xanima wî dema xwarina ku li wan hatîye qedexekirî dixwin cil û bergêñ wan ji ser wan diçin ew rût û tazî dimînin. Hema her du bi hev ra gazî Xwedê dikin û wiha dibêjin: “(*Adem û Hewa*) *Gotin: Xwedayê me! Me neheqî li xwe kir, eger Tu li me neborî û rehmê li me nekî teqezi em ê bibin ji yên xesiri.*” (Quran, 7/23). Gazî û lavakirina Adem û Hewayê dibe cirûskêñ yekem yê mirovan li ser rûyê erdî ji bo diayê. Li gor bawerîya İslâmê bi vî rengî ilm û zanistên di derheqê ilmê diayê da cara ewil tîrêj da û di dîroka cihanê da cihê xwe girt.

### 1.3. Mijarêñ Diayê

Mirov dikare mijarêñ diayan li gorî cureyêñ diayan wiha dîyar bike:

**Diayêñ ku ji bo hemd û sena û mezinatîya Xwedê têne kirin:** Ev cure dia gelek caran bi armanca ku mirov xwe nêzîkî Xwedê bike, bi wî ra têkilîyan dayîne û ji bo bidestxistina rizaya îlahî tête kirin. Hinek caran jî bawermend di wê bawerîyêda ye ku eger ew, ji bo dînyaya xwe û axreta xwe diayek bike ew daxwaza wî/ê tê pejirandin.

**Bawermend, gelek caran bi armanca ku hewcedarîyên wan, yên eslî werine qebulkirin dia dîkin:** Mirov ji bo tendurstîya bedena xwe, ruhê xwe û xwe ji bela û afatênu bi ser wanda têne biparêzin dia dîkin. Wek mînak dema li mirovek zilim tête kirin ew mirov bi armanca ku xwe ji zilma neyarê xwe biparêze ji Xwedê ra dia dike.

Mirov dema derdikevin rîwîtîyê, kesekî/ê wan dimire, ji bo wan zarokek çêdibe, piştî xwarin û vexwarinê, berya razandinê û pişti wê, di derketina sûkê û kirîn û firotinê da û hwd. dia dîkin. Ew ji Xwedê dixwazin ku karê dîkin bi bereket û bê qeza û bela be. Hinek caran nefsa mirovan, mirovan dide xapandin û wan ji rîya rast derdixîne û bi wan, gunehan dide kirin û dilê wan reş dike. Bawermend bi armanca ku Xwedê, wî/ê ji daxwazên wek nefsa wî/ê biparêze, rîya rast nîşanî wî/ê bide û exlaqê wî baş bike dia dike (Parladır, 1994: 535).

Ji ber ku di afirandina mirovan da aferîner, hesta xweparastina bi quweteke ji quweta mirovan bi hêztir daye mirov, însan her dem ji hêz û quweta ku ji wî/ê mezintir yanê ji Xwedê daxwaza alîkarîyê dike. Ev fîkr û raman jî di her dem û her çandê da rîya hewcedarîya bi diyan li pêşîya mirovan vedike.

## 2. Dia Di Edebîyatê Da

Dia di edebîyat û çandêna cuda da cihek gelek berfireh girtîye. Têgeha diayê di mijarêni dînî da, di edebîyatê da, di helbestan da, di gotinêni pêşîyan da û di biwêjan da zêde hatine bi kar anîn (Tekin, 2012:95). Mirov dema berê xwe dide edebîyata kurdî jî vê yekê dibine. Ci helbest be, ci gotinêni pêşîyan be ci jî çîrok be mirov tê da bi dehan mînakêni diyan dibine.

49

Hinek dîroknas û rexnegirêne edebîyatê yên wek Şewqî Dayf (1910-2005) cureya diayê wek cureyeyek serbixwe ji cureyêne edebîyatê nedîfîne û ew perçeyek ji edebîyata tekyayê qebûlkirine. Halbûkî dia, di gelek berhemêne nezmê û nesrê da an beşek serbixwe ye an di helbest û pexşanêni serbixwe da ye an jî di nav helbestê da yan jî di nav metnê da cih girtîye. Ji ber van sedeman li gor me mirov dikare diayê, wek mijarek ji mijarêni edebîyatê qebûl bike.

Keresteyê edebîyatê yê sereke ziman e. Hunera edebîyatê, karek beşerî ye, cih û zemanê wê dîyar e û ew epîstemolojîya çanda serdemek dîyar e. Ji ber vê sedemê edebîyat, tiştek e were ye ku bi rengêni serdemêna cuda cuda hatîye boyaxkirin û bi şêweyêne beşerî şikil hafîye dayîn û roj bi roj jî têda guher-tîne çêkirin (el-Kewaz, 2012: 35).

Li vir hewcye ev pirs were kirin. Gelo ew tişte/a ku dia dike beşek ji beşenê edebîyatê ye. Mirov dema berê xwe dide dia dibîne ku ew taybetmendîyêni di pexşanêni edebî da hene, di diyan da jî hene. Berya her tişti dia gazîkirin û lavakirina bi bal Xwedê va ye. Ew kesê/a ku dixwaze xwe nêzîkî Xwedê bike, hêvî dike ku diayê wî/ê dê were qebûlkirin. Mirov dema dia dike hevokêni watedar bi kar tîne û dixwaze wana li gor rê û rîbazên edebîyatê bixemilîne. Ji ber ku ew kesê/a dia dike dizane ku ew, daxwazên xwe ji keseke ji xwe bi hêztir dike. Mirov dema ji meqamek bilind tiştekî dixwaze hevokêni xwe hildibijêre û dibêje. Yanê ci hat devê mirovan, mirov nikare bibêje. Ji ber van sedeman jî mirov dikare diayê cureyek ji cureyêne edebîyatê bihesibîne.

### 3. Dia Di Edebîyat û Folklora Herêma Hekarîyê Da

Edebîyata miletikî, cureyek ji cureyên zimanê wî mileti û nîşaneyâ bikaranîna zanista zimanê wî ye. Keda edebîyatê di vê maneyê da gelek mezin e. Edebîyata kurdî jî ji çesîtdarıya zimanê kurdî û ji nîşaneka bikaranîna zanista zimanê kurdî ye. Keda edebîyata kurdî jî her wekî edebîyatê din di vî warî da têra xwe heye. Herweha folklor û kelepora milletekî di heman demê de neynika wî milletî ye. Baştırîn rêya naskirina milletekî di naskirina folklorâ wî mileti ra derbas dibe. Lewra serûberê wî milletî girêdayî bi çand û folklorâ wî milletî va ye. Dema ew çand û folklor bi rê û rîbazê zanistî tê vekolandin silûtê wî milletî tête xwîyakirin. Her wekî milletên dinyayê milletê kurd jî bi alîkarîya çand û folklorâ xwe dikarin hêmanên nasnameya milletê xwe derxînin meydanê. Ji bo ku Kurd bikaribin nasnameya milletê xwe derxînin hewcye ku ew wan keresteyan tomarbikin, bisenifînin û vekolînin (Kaplan, 2015: 158-182). Dia jî cureyek ji cureyên çand û kelepora kurdî ye û hewcye lêkolînê zanistî li ser bêne kirin.

#### 3.1. Dia di Berhemên Klasîk yên Devera Hekarîyê da

Edebîyata kurdî ya klasîk, di serdema Îslâmî da destpêkirîye, di bin tesîra dînê Îslâmî da maye û hînek unsûrêner erebî û farisî jî di xwe da dihewîne (Akkuş, 2015: 34). Di vê serdemê da helbestvanê klasik di berhemên xwe da an bi besêr serbixwe an jî di nava helbestên xwe da cih dane mijara diyan. Her weha dia, bûye mijara helbestvanê klasik yên derdora Herêma Hekarîyê jî.

Li jêrê çend helbestvanênu ku bi eslê xwe ji devera Hekarîyê ne û di berhemên xwe da mijara diayê jî hûnandine me wek mînak dan. Sedema dayîna van mînakan jî ewe ku berhemên klasik jî wek keres-teyên folklorê têne qebûlkirin û di xwe da mînakên folklorê dihewînin. Bi armanca ku di serdema wan helbestvanan da li herêma ku ew li wir jîyane ka gelo gotin û hevokêne diyan bi ci rengî hatine bi kar anîn, bibînin me berê xwe da berhemên wan.

##### 3.1.1. Feqîyê Teyran

Feqîyê Teyran, di nîvekê dawîya sedsala 16an û di nîvekê serî yê sedsala 17an da jîyana xwe boran-dîye. Ew, di sala 1561?ê da li navçeya Mîksê li gundê Warezûzê hatîye dinê û di 1632?an da jî mirîye (Sadinî, 2010:16; Teyran; 2014:45; Sönmez, 2018: 1231). Ew, helbestvanekî ehlê dilan e û li paş xwe gelek helbest hîstîne. Feqî, di hînek helbestên xwe da bi rîya dia gazî Xwedayê xwe kirîye û daxwazan xwe ji Xwedayê xwe ra gotîye. Wek mînak di helbesta xwe ya bi navê “*Îlahî Lew Dikim Zarî*” da gazî Xwedê dike û daxwaza lêborîn û bexşandina xwe dike:

*Îlahî lew dikim zarî*

*Van roj û şevêñ tarî*

*Ji zunûban ra xemxwarî*

*Gunahê min bi xufranî*

*Mîm û Hê pir gunehkar e*

*Belê navê te xeffer e*

*Qewî pir myflis û jar e  
E'ta û fezl û ihsanî* (Sadînî, 2010:1434)

Dîsan, Feqî di helbesta xwe ya bi navê “*Xwedawenda Gunehkar im*” da wiha gazî Xwedayê xwe dike û dibêje her çiqas ez gunekarbim jî tu bi mezinahîya xwe û bi xatirê pêxemberê xwe dikî gunehê min bibexşîne:

*Xwedawenda gunehkar im  
Bi heqqê zatê ekber key  
Pelîtê mucbîrê nar im  
Bi wê rewza munewwer key*

*Belê Mîm û Hê bi nalîn e  
Bi heq Taha û Yasîn e  
Xwedayê min bixefrîn e  
Bide me dê mubeşser key* (Teyran; 2014:66-69)

### 3.1.2. Ehmedê Xanî

Ehmedê Xanî di sala 1651-2an da li bajarê Agirîyê li navçeya Bazîdê hatîye dinyayê. Her çiqas ew li Bazîde were dinyayê jî malbata wî bi eslê xwe ji bajarê Hekarîyê koçber bûye û hatîye li vê derê bi cih bûye. Xanî, li pey xwe bi navê “*Nûbihara Piçûkan, Eqîda Îmanê, Mem û Zîn û Dîwan*” çar berhem hêştine (Resûl, 2007: 42; Fîndî, 2008: 35; Yıldırım, 2011: 23; Yaşin, 2012: 31; Dündar, 2017: 224; Sönmez, 2018: 669-671). Ehmedê Xanî di van berhemên xwe da gelek caran bi rîbaza helbestê gazî xwedayê xwe kirîye û jê ra dia kirîye. Wek mînak di berhema xwe ya bi navê “*Mem û Ziné*” da wiha gazî Xwedayê xwe dike û dibêje her çiqas em gunekarbin jî em bi rehma te bawerin ku tu gunehê min dibexşînî:

51

*Ger kafir û ger gunahekar in  
Bîlcumle ji te umîdewar in*

*Kes nîne ji kafir û usatan  
Mezher ne bitin ji bo sfatan*

*Kafir buwîn em bi îsmê “Qehhar”  
“Xeffer” e ku em kirîn gunehkar*

*Kufrê tu meger ne şî bibexşî  
Ger dê gunehan bi me binexşî*

*Dê şadi bibin li me şeyatîn  
Mesrûri bibin gelek melaîn*

*Fîlcimle: Me cumle xas û aman  
Asî yû şeqî yû natemaman*

*Têkra bi şefaeta xwe xas ke  
Vêkra me ji agîrê xilas ke* (Xanî, 1995: 29)

### 3.1.3 Melayê Bateyî

Mela Huseynê Bateyî di sala 1675?an da li Hekarîyê li gundê Batê hatîyê dunyayê û di sala 1760?î da jî çûye ser dilovanîya xwe (Adak, 2015: 245; Sadînî, 2013: 29). Lê mirov nikare bibêje ev dîrok ji sedî sed teqez e. Melayê Bateyî yekem kes e ku bi zimanê kurdî li ser jîyana Nebî Mihemed (s.x.l.) mewlûd nivîsandîye. Mewlûda Bateyî di nav kurdan da bi sed salan e tê xwendin. Bateyî di dawîya mewlûda xwe da bi vî rengî gazî Xwedê dike û ji wî dixwaze ku xwedayê wî diayê wî qebûl bike. Di beşa “Tehmidê” da wiha dia dike:

*Hêvîdarin em, ji te şahê Kerîm!  
Îhdîna ya Reb sirate 'l-musteqîm*

*Nê ji me sûc û xeta têñ û sitem  
Lê ji te îhsan û xufran û kerem*

*Ya Reb îmanê dixwazîn em, mudam  
Jêrê ala ya Muhammed wesselam* (Bateyî, 2015:20)

Bateyî di beşa XVIan da ya ku bi navê “Haze 'l-Mewazî'u Mewzûi 'd'-Dua” da berê gazî Nebî Mihemed (s.x.l.) dike, jê şefacetê dixwaze û paşê jî gazî Xwedê dike û wiha dibêje:

*Ya Resûlellah! Resûlê îns û cin  
Ya şefî 'ê sedrê dîwana mezin*

*Tu şefa 'et ke ji bo me 'asîyan  
Werne, nefsa şûme naket qencîyan*

*Ya Kerîm û ya Îlahe 'l-'alemîn  
Ya Rehîm û ya 'Ezîm û ya Metîn*

*Hêvîdarê rehm û îhsana te yîn  
Talibê îkram û xufrana te yîn*

*Hazir û guhdarê mewlûda Resûl  
Hêvîya me tu bikey ya Reb qebûl*

*Nê tu xeffar î û settarê 'uyûb  
Ma bi bexşî û bi xufranî zunûb* (Bateyî, 2013: 112)

### 3.2. Dia di Folklora Kurdî da

Dia di çand û folklora kurdî da li gor bi kar aninê erkdar dibe. Mirov li gor peywend û erkdariyê dikare diyan di bin van serenavan da bisenifine û her weha van serenavan ji bo herêma Hekarîyê jî bi kar bîne.

#### 3.2.1. Bîr û Bawerî

Dia, nişana teslîmûnê, bawerîyê û hêvîyê ye. Mirovên diakar di kirina diayê xwe da hêvî dîkin ku hêzekeke evsûnî bi rêya wan gotinan ji wan ra bibine alfîkar. Ji ber ku mîletê kurd bi piranî bawermendin û bawerîya wan bi Xwedê heye ew, ji Xwedê ra dia dîkin û daxwazêن xwe bi gotin û hevokêن qalibgirtî tînin ser ziman. Mirov dikare bibêje ev gotin û hevokêن diyan her çiqas di nav xwe da hinek bêne guhertin jî ew navnetewî ne. Her wisa kurdêner verê Hekarîyê jî bi vê bawerîyê ji Xwedê ra dia dîkin û ew bi gotin û hevokêن qalibgirtî yên devera xwe wiha gazî Xwedê dîkin û dibêjin:

Ya Rebbî! Tu me bê îman neke.

Ya Allah! Bi qaweta te Xwedê.

Ya Rebbî! Tu me pêşeman neke.

Destê Xwedê û pêxemberan ser serê te bît. (Alkanat, 2019)

Ya Rebbî!

Hawara me Tu y(i)!

Gazîya me Tu y(i)

Tikaya me Tu y(i)

Penaya me Tu y(i)!

Ya delîlê zelîla

Ya xudanê bêxwedana

Ya kesê bêkesa!

Ya destegîrî nezana!

Ya çêkerê erd û esmana!

Diaya me qebûl bikey! Tu li me şerê şeytana, li şerê nefşê, şerê xîyanetê, şerê bêbextîyê, şerê ifti-rayê, şerê dirowê (derewê) biparêze!

Ya Rebbî!

Tu li me wan kesa binivîse ewêt ku tu lê razî yî!

Ya Rebbî!

Tu me dostê xo hisab bike, me dostê dostê xo hisab bike!

Ya Rebbî! Tu li min û daybabêt (dê û bavêñ) min xoş be.

Tu min û daybabêt min û bisilmana li agirê cehnemê biparêze!

Tu emelê li gel me neke!

Tu rehma xo li gel me bike!

Ya Rebbî!

Tu hemû bisilmana bigehîne êk!

Vê tefriqa û kêşmekêşê navbeyna bisilmana da rakey!

Tu ewladêt me salih bikey!

Ya Rebbî tu aqubeta me xêr bikey!  
Tu me ji bela musîbeta biparêze!  
Tu me bê îman nebey!  
Tu me muhtacî namerda neke.  
Ya Rebbî!  
Tu malê heram neke nisîbê me!  
Ya Xudayê Mezin!  
Belaya xo bide zalima!  
Tu me li kibrê dûr pêxe!  
Xweda hewar e, tu tewara me were!  
Me li kiryarêt pîs û xirab dûr biêxe!  
Ya Rebbî! Tu padişahêt me adil bikey! (Özer, 2020).  
Hewar ya Gulîreş.  
Hewar ya Xizir Pexember.  
Hewar ya Şêx Elîyê Dizê (Alkanat, 2019).

### 3.2.2. Cil û Berg

Dema mirovek cil û bergên nû li xwe dike dost û hevalên wî/ê bi sedem vê rewşa wî/ê ya guhertî wî/ê pîroz dikin û jê ra saxî û silametîyê dixwazin. Her weha ji bo vê rewşê li devera Hekarîyê jî bi hevokê folklorîk weha dia têne kirin.

54

Jiyanek xweş tê de biborîne.  
Li ser xêrê bidirînî.  
Pîrozî bit hezaran bidirînî.  
Rojeke rend pê derbaske.  
Xwedê mirazê te hasil biket. (Alkanat, 2019).

### 3.2.3. Èş û Nexweşî

Di jîyanê da her roj wekhev nabore, hinek roj bi xweşiyê û hinek roj jî bi zehmetî û nexweşiyê derbas dibin. Dema mirovek nexweş dikeve lazim e ew, him ji alîyê fizikî va him jî ji alîyê manevî va were dermankirin. Li gor bawermendant ewê şifayê dide nexweşan Xwedê ye, lewra nexweş, xwe dispêrin Xwedayê xwe û bi armanca ku ew ji nexwewşiyê sax bibin dia dikin. Bo nimûne li jêrê çend gotin û hevokê diayan yên ku li Hekarîyê ji bo nexweşan têne gotin, hatine dayîn.

Înşallah Rebbê Alemê sebra Eyub eleyhisselam bidit te. (Alkanat, 2019).  
Xwedê selameta xêrê rêket.  
Xwedê şifayê rêket.  
Xwedê jê def'e biket  
Rebbê alemê bo xatira navê xwe yê Şafî şifa biket (Öztunç, 2019).  
Tu têkevî ber şefa'eta pêxember.  
Ya Rebî tu vê xwînê rawestînî.

Zalimo! **Înşalah** Rebi'l-'alemin piştê bişkênit. (Öztunç, 2019).

Nexweşıya te av bibet.

Nexweşıya te bit dar û beran.

Nexweşıya te here gayê sor.

Xwedê te ji hemû bela û şetelan biparêzit.

Ya Rebî kâfir jî vî derdî nebînin. (Öztunç, 2019).

### 3.2.4. Bext û Miraz

Hezkirin û xwestina bext û mirazeke baş, ji bo dost û hevalan, mirov dikare bibêje hema hema di çanda her milefi da heye. Herweha ev yeka di çanda kurdan da jî heye. Di vî warî da kurdên Hekarîyê weha ji dost û hevalên xwe ra dia dikan û ji wan ra saxî û selametîyê dixwazin.

Xwedê emrê te dirêj biket. (Alkanat, 2019).

Xwedê li gel te bît.

Destê Xwedê û pexemberî li ser serê te bêt (Engin, 2019).

### 3.2.5. Serxweşî

Bê guman her mirovê jîndar ji kanîya mirinê avê vedixwe û li dûv xwe, ji dost û eqrebatê xwe ra gelek êş, kul, keder û xemgîniyan dihêle. Wek tê zanin sebirkirina li hember xwemgîni û diltengîyan, bi alîkarîya dost û hevalan dibe. Di dema serxweşîyê da xwedîyên mîrî gelek dilsoj in û ew dixwazin wê dilsojîya xwe bi dost û hevalên xwe ra parve dikan da ku ew agir û şewatata ku ketfîye nav dil û kezeba wan hinek sar bibe. Dost û hevalên wan jî bi dia û gotinê kurt û watedar dixwazin sebrê bidin xwedîyên serxweşîyê. Li Hekarîyê di nav gel da ji bo serxweşîyê ev dia têne kirin.

Xwedê rehma xwe lê biket.

Hizar rehmet li day û babêñ te. (Engin, 2019).

Ez bedela wî mirî bama.

Te kuçikê min reş kir.

Te mala min sot.

Tu koriya çavêñ min bit. (Alkanat, 2019).

Xwedê jê razî bit.

Xwedê ef û mexfiret biket.

Xwedê çû kederek din nedet.

Xwedê cihê wî/ê bikete cennet.

Serê we malbatê sax bî.

Xwedê cihê wî/ê xweş biket.

Xwedê bo bedel biket (ji bo zarokan).

Xwedê sebrê bidete we.

Xwedê awa rêhê dile we bike (Engin, 2019).

Te kuçikê min reş kir.

Te mala min sot.

Xwedê wî/ê zarokî/ê biket çuçika beheştê da bo te bînit roja mehşerê ava kewser ê.  
Tu koriya çavên min bit. (Engin, 2019).  
Cihê wî bo saxan bit.  
Cihê wî nîveka behîst bit.  
Serê we gelek sax bit.  
Warê wî bihuşt bit. (Öztunç, 2019).

### 3.2.6. Xwarin û Vexwarin

Kevneşopîya xwarin û vexwarinê di eslê xwe da çandeke qedîm e. Di derheqê vê çandê da gelek tişt hatine gotin. Lewra ikramkirina xwarin û vexwarinê nişaneyä comerdiyê ye. Di edebiyata klasik da gelek berhem li ser vê mijarê hatine nivîsandin. Bo nimûne el-Cahiz (k.d. 776-7) di berhema xwe ya bi navê *Kitabu'l-Buxela*/ Pirtûka Xesîsan da nav û sifetên xesîsan li ber xwendevanan radixîne û dîsa Îmamî Xezalî (k.d. 1126) ji di berhema xwe ya bi navê *Îhya'u 'Ulûmi'd-Dîn* berga sisêyan beşa heftan da fezileten comerdiyê û nebaşiyênen xesistiyê dûr û dirêj şirove dike. Her wek miletên din di çanda kurdan da jî dema xwarin an vexarinek were ikramkirin hewceye spasî ji xwedîyê ikramê ra were kirin. Li Hekarîyê piştî xwarin û vexwarina ku hatîye ikram kirin bi gelek gotin û hevokên watedar spasî ji mazûvan ra tête kirin. Me li jêrê ji hinek hevok û gotinên spasîyê ku li devera Hekarîyê di vî warî da têne bi kar anîn wek nimûne dane.

Tu, tu car nanê xwe ji jarîyê neşkêni.  
Înşallah bîte xana xwedê.  
Xwedê ji ber destê te kêm neket (Alkanat, 2019).  
Xwede kemasiya we neket.  
Xwedê ava biket.  
Xwedî mala we awa biket.  
Xwedê ji we razî bibit.  
Xwedê bereketê lê biket.  
Xwedê zêde biket.  
Sedeqe bit.  
Defî bela bit.  
Xwedê Teala mirovanîya ve kem neket.  
Ya Rebbî! Me kêm kir tu zêde biket.  
Xêra mirya sedeqa serê saxa bit. (Öztunç, 2019).

### 3.2.7. Çêbûna Zarokan

Berdewamîya neslê ji bo alema însanîyetê tişték gelek muhîm e. Ev berdewamî jî tenê bi bûyîna zarokan tête berdewamkirinê. Dema zarokeke mirovekî/ê dibe devûdora wî/ê çavronahîyê dide, wî/ê pîroz dike û hemd û spasîya xwe jî pêşkeşî Xwedayê xwe dike. Li herêma Hekarîyê dema zarokeke yekî/ê çêdibe dost û heval wî/ê bi van gotinan wî/ê pîroz dikan, kêfxweşîya xwe nişanî wî/ê didin û ji bo pîrozbahîyê weha dibéjin.

Têr ‘emr bit.  
Têr ‘emr dirêj bit.  
Xwedê piçûkêd te bihêlid.  
Xwîşka bira bit. (Engin, 2019).  
Peçûlka te bi day û bab mezîn bît.  
Îşellah hizar salî bît.  
Xwedê bo te pêlît, xwîşka bira bît.  
Nivîna xerê bît.  
Xwede bo te pelît û müyen spî li çuka bêñ. (Engin, 2019).

### 3.2.8. Zewac û Malbat

Zewac, yek ji qonxên herî girîng e ku jîyana mirovan têda derbas dibe. Çawa di serenava çêbûna zarok da ji derbas bibu mirov bi zewacê nesla xwe berdewam dike, malek e nû ava dike û dest bi jîyanke nû dike. Ji ber ku zewac di jîyana mirovan da merhaleyek gelek muhîm e ji bo berdewamîya zewacê gelek dia têne kirin. Çend mînakêñ diayêñ ku di derbarê zewacê û berdewamîya wê da li Hekarîyê di nav gel da tênekirin.

Bûk û zavayêñ we pîroz û mibarek bit.  
Hûn têr ‘emr bin.  
Pê û parê yêd te xêr be.  
Pêkve pîr bibin.  
Tu û mîrê xwe pêkve bin.  
Xwedê qîzeke baş têxe rizqê te.  
Xwedê ser balgehekî pîr ket. (Engin, 2019).  
Bûk û zavayêñ we pêk ve pîroz û mubarek bin. (Engin, 2019).  
Xwedê jinek baş nesîb ket. (Engin, 2019).

57

### 3.2.9. Rê û Rêwîti

Rê ê rêwîti ji alîyekî va kareke baş e û ji alîyekî va jî bi zor û zehmet e. Mirov dema ji mala xwe derdiikeve û dibe rêuî hêvî dike ku bi saxî û selametî vegere mala xwe. Ji bo vê sedemê rêuî him bi xwe dia dike û him jî dixwaze ku dost û heval ji wiê ra dia bikin. Him di warê dinî da him jî di warê edebiyata gel û folklorê da di derheqê dia da gelek berhem hatine nîvîsandin. Bo nimûne berhema et-Taberî ya binavê *Kîtabu'd-Dua* (k.d. 923) yek ji van berheman e. Di nav gel da jî gelek hevokêñ ku bi wateya diakirinê têne bi kar anîn hene. Bo nimûne çend hevokêñ diayan yên ku li Hekarîyê di nav gel da têne gotin hatine dayîn.

Barkirina we ji ser xêr bit.  
Xwedê we nehêlîte tengaviye de.  
Xwede silametiyê bidet.  
Oxira we li ser xêrê bit. (Engin, 2019).

#### 4. Encam

Dia, her çiqas têgeheke dînî be jî di jîyana her miletî da cihek berfireh girtîye û ji wan cihan yek jî bêguman edebiyat e. Çi bi şiklê nezmê be çi jî bi şiklê nesrê be dia di her cureyê edebiyatê da cihek muhîm girtîye. Mirov dikare heman tişti ji bo edebiyat û folklorâ kurdî jî bibêje. Di lêkolînê da me dît ku di folklorâ kurdî da kevneşopîya diakirinê gelek dewlemend e. Her weha di berhemên edebiyata kurdî ya klasîk û edebiyata gelerî da jî bi sedan mînakên diayan hene. Dia, di folklorâ devera Hekarîyê da cihek muhîm digire.

Piştî lêkolîna mijarê em gihêştin van encaman:

Dia ne tenê daxwazî û hêvkirina tiştîn fizikî bi tenê ye berevajî mirov bi rêya dia li hember mezinatî, hêz û quweta Xwedayê xwe; feqîrî, xizanî û netıştekbûna xwe nişan dide. Dia ji xwestekan zê-detir ji bo nîşandayîna dewlemendîya Xwedê ya bêsînor û pesindayîna wî, spasi û wesifdayîna wî ye.

Gelê kurd wek miletên din xwedî bawerîyek xurt e. Dema em ketin nava lêkolînê û me çand û folklorâ kurdî di ber çavan ra derbas kir, me dît ku têgehîn dînî bi rêya diayan di jîyana kurdan ya rojane da cihek berfireh girtine. Her weha em di berhemên klasik da jî rastî heman tiştan hatin.

Dema dia tê kirin di diayê da him mezinahî û pesnên Xwedê tê kirin û him jî tê da xwestin heye. Lewera ew kesê/a dia dike yan ji bo xwe yan jî ji bo malbat, zarok, eqreba, heval, dost û cîranê xwe yan ji bo kesekî/ê qencî pê kirîye yan jî ji bo kesek din daxwaza xweşîyek, qencîyek û başiyekê dike.

Di lêkolînê da me dît ku gelê kurd di diayên xwe da zêdetîr ji Xwedê; malê dinyayê, dayîna zarokan, aramî ji bo kesen dizewicin, rehma Xwedê ji bo kesen mirî, sersaxî ji bo malbatênu ku mirîyênen wan çêbûne, parastin ji bo kesen di talûkayanda ne, tendurustîyeke baş ji bo kesen nexweş, başî û qencîyê ji bo zarokan, xwegîhandina jîyanek e baş di axretê da û hwd dixwaze. Dîsan me dît ku gelê kurd; ji zarokênu xwe ra, dê û bavênu xwe ra, bûk û zavayan ra, keseke mirî yan nesax ra, ji bo bîdestxistina xanîyekê, zevîyekê, bexçeyekê, pez û dewar û hwd dia dîkin û ji Xwedayê xwe wan tiştan dixwazin.

Li devera Hekarîyê di berhevkrina gotin û hevokên qalibgirtî da yên ku mijara wan dia ne em gehîştin wê encamê ku gotin û hevokên qalibgirtî yên diayê gelek zêde ne. Di wan diayan da hevok û gotin bi piranî dişibihin hevûdin û di warê wateyê da jî gelek nêzîkî hev in.

### Çavkanî

- Adak, A. (2013). *Destpêka Edebîyata Kurdi*, Weşanên Nûbiharê, İstanbul.
- Akkuş, S. (2015). “Di Dîwanên Klasik û Çanda Kurdan de Dia” *Nûbihar*, Havin, 2015, Hejmar 132, rr. 32-37. 34.
- Arnold, V. G. (1924). *Le Folklore: Croyances et Coutumes Populaires Françaises*, Weşanên Librairie Stock, Paris.
- Artun, E. (2010). *Türk Halk Bilimi*, Kitapevi Yayınları, Çap. 6, İstanbul.
- Bedirxan, C. Elî. (2012). “Ferhengok”, *Hawar*, j. 30, Weşanên Belkî, İstanbul.
- Cindî, H., Evdal, E. (2008). *Folklora Kurmanca*, (werg. Tosinê Reşîd), Weşanên Avesta, İstanbul.
- ed-Debbax Taqî. (1992). *el-Fikru 'd-dînîyyul 'l-qedîm*, Daru's-Su'ûnî's-Seqafîyyetî'l-'Amme, Bexda.
- Dundes, A. (1997). *Folklor Nedir*, (çev., Gülay Mirzaoglu), Milli Folklor Dergisi, Kış.
- Dündar, M. (2017) “Ahmed-i Hamî'nin İlmi Kişiliği”, Türk ve İslam Dünyası Araştırmaları Dergisi, Tıdsad, Yıl: 4, Sayı: 4, Aralık 2017, pp. 222-229.
- Ehemêdê Xanî. (1968). *Mem û Zîn*, (Berhevkar: M. E. Bozarslan), Weşanên Deng, İstanbul .
- Ehmed, Hîcâzî. (2007). *Qanûnu'd-dia mefhûmu 'l-ilm we 'l-i'tîqad*, Weşanên Daru'c-celîs'z-ze-man, ‘Amman.
- Feqîyê Teyran. (2014). *Diwan*, (Amadekar: Kadri Yıldırım), Weşanên Kültür ve Turizm Bakanlığı, Ankara.
- Feyyûmî Ehmed, Mihemmed b. 'Eli. (?). *el-Misbahu 'l-munîr*, Beyrût, bd.
- Findi, R. (2008). *el-Fikru 'l-Kavmiyyu Beyne Hânî ve Haci Kadir el-Koyî* (*Dirasetun Nakdiyyetun*), Çapa 4an, Duhok.
- el-Fîrûzabadî, Mihemmed b. Ya'qûb el-Fîrûzabadî. (1995). *el-Qamûsu 'l-muhît*, Beyrût.
- İbn Manzur. (?). *Lisanu 'l- 'Ereb*, Beyrût.
- Kaplan, Y. (2015). “Strana Kurdî (Kurmancî): Devera Hekarîyan Wekî Nimûne” *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Sal:1, Berg1, Hejmar2, Kasım 2015, rr. 158-182.
- Kaya, D. (2007). *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*, Akçağ Yayınları, Ankara.
- Keskin, N. (2019) *Folklor û Edebîyata Gelerî*, Weşanên Avesta, İstanbul.
- el-Kewaz Muhemed Kerîm. (2012). *en-Nass we 'l-xîtab fî's-sahîfetî's-seccadîyye*, Menşûratu Kulliyatî'l-Îmamî'l-Kazim lî'l-'Ulûmî'l-Îslamîyye. Bexda.
- Kutsal Kitap*, (2002). Kitabı Mukaddes Şirketi Yayınları, İstanbul.
- Mela Huseynê Bateyî. (2015). *Mewlûda Nebî*, (Werg. û Şikar: M. Xalit Sadînî) Weşanên Kültür ve Turizm Bakanlığı, Ankara.
- en-Nîşabûrî, Ebû 'Ebdîllah Mihemmed. (?). *el-Mustedrek 'ele s-sehîheyîn*, I-VII, Daru'l-Kîta'bî'l-'Erebî, Beyrût bd.
- Örnek, S. V. (2000). *Türk Halk Bilimi*, Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara.

- Parladır, S. (1994). “Islam’da Dia”, *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, İstanbul, IX, 535.
- Quran: 7/19-22-23*. (2015). Weşanên Karubarên Dîyanetê, Ankara.
- er-Razî, Mihemmed b. Ebubekir b. ‘Ebdu’l-Qadir. (1995). *Muxtaru’s-siheh*, Beyrût.
- Resul, M., İ. (2007). *Ehmedê Xanî ve Mem û Zin*, (Werg. Kadri Yıldırım), Weşanên Avesta, İstanbul.
- Sadinî, M. X. (2010). *Feqiyê Teyran Jiyan Berhem û Helbestên Wî*, Weşanên Nûbiharê, İstanbul.
- Sadinî, M. X. (2013). *Mela Huseynê Bateyî- Jîyan, Helbest û Berhemên Wî*, Weşanên Nûbiharê, İstanbul.
- Sönmez, N. (2018). “Şeyh Ahmed-i Hânî’nin Mem û Zîn Mesnevisinde Ayetlerden İktibaslar (I-IV Bölüm)”, *Turkish Studies*, Volume 13/20, Summer 2018, pp. 665-686.
- Sönmez, N. (2018). “Yunus Emre ile Feqiyê Teyran’ın Şiirlerinde Gönül İmgesinin Mukayesesî”, *Turkish Studies*, Volume 13/18, Summer 2018, pp. 1227-1241.
- Tekin, M. (2012). *Ziyaret Fenomeni Çerçeveşinde Dia Ve Sosyal Sorunlar*, Rağbet Yayınları, Çapa 2yan, İstanbul 2012.
- Timurtaş, A. (2018). *İslami Edebiyatda Dia Delâ’iлю'l-Hayrât Örneği*, Çira Akademi Yayınları, İstanbul 2018.
- Yaşin, A. (2012). *Kürt Filozofu Şeyh Ehmedê Xanî Hazretleri*, Weşanên Lîsê, Diyarbakır.
- Yıldırım, K. (2011). *Ehmedê Xanî'nin Fikir Dünyası*, Weşanên Ağrı Kültür ve Yardımlaşma Derneği, İstanbul.
- Yıldırım, K., Pertev, R., Aslan, M. (2013). *Ji Destpêkê Heta Niha Folklora Kurdî*, Weşanên Zanîngeha Mardin Artukluyê, Mardin.

### Çavkanîyê Zindî

- Alkanat, A. Diroka Hevpeyvînê: 15.12.2019, Temen: 30, Hekarî, Tirkîye.
- Engîn, E. Diroka Hevpeyvînê: 11.11.2019, Temen: 50, Hekarî, Tirkîye.
- Özer, M., D., Diroka Hevpeyvînê: 15.01.2020, Temen: 71, Hekarî, Tirkîye.
- Öztunç, M. Diroka Hevpeyvînê: 11.11.2019, Temen: 51, Hekarî, Tirkîye.

Suvağci, İ. (2021). Lêkolînek li ser Komên Xwendinê yên Kurdî, The Journal of Mesopotamian Studies, 6 (1), 61-79 DOI: 10.35859/jms.2021.831033.

#### MAKALE BİLGİSİ/ARTICLE INFO

Article Type/Makale Türü: Research Article /  
Araştırma Makalesi  
Received / Makale Geliş Tarihi: 25.11.2021  
Accepted / Makale Kabul Tarihi: 17.02.2021  
Doi: 10.35859/jms.2021.831033

# LÊKOLÎNEK LI SER KOMÊN XWENDINÊ YÊN KURDÎ

İlyas SUVAĞCI

Dr. Öğr. Üyesi, Hakkâri Üniversitesi, Rektörlük  
Türk Dili Bölümü, ilyascembeli@gmail.com,  
<https://orcid.org/0000-0001-6409-1229>

#### KURTE

Wekî çalakîyeka takekesî, rewşenbîrî û pêkveyî komên xwendinê bandoreka girîng li ser edebîyatê dîkin. Di çend salêن dawî da di nav demeka kurt da gelek komên xwendinê yên Kurdî hatine damezîrandin. Ji van koman çend nivîskar derketin, her wiha wan çend kovar jî derxistin. Lewma çalakîyê van koman rîyeka nû ya girîng li ber edebîyata Kurdî vekir. Ji ber ku komên xwendinê nivîskaran di şêwirêن xwe da dîkin mîvan, pirtûkan dikirin têkilîyêن wan ligel nivîskar û weşanxaneyan jî hene. Lewma me jî di vê lêkolîna xwe da ligel 24 komên xwendinê, 7 nivîskar û helbestkar û 9 weşanxaneyan hevpeyvînêni nivîskî kirin. Me li gor dîtina van her sê alîyan behsa; têkilîyêن wan bi hevdu ra, awayê birêexistinbûna komên xwendinê, cureyêن edebî yên herî zêde têن xwendin, rexneyêن wan yên li ser pirtûkan, kêmasî, xeteriyêن li pêşîya wan û siberoja wan kir. Me dît ku komên xwendinê

yên Kurdî kêm yan jî zêde bandorek li ser firotina pirtûkan kirine. Girêdayî rewşa Kurdan ya siyasi hejmara wan zêde yan jî kêm bûne, xebatê wan geş bûne yan jî sekinîne.

**Peyvîn Sereke:** Komên Xwendinê yên Kurdî, Nivîskarêñ Kurd, Xwendina Pirtûkan, Weşanxaneyêñ Kurdî

### Kürtçe Okuma Grupları Üzerine Bir İnceleme

#### ÖZ

Bireysel, entelektüel ve toplu bir etkinlik olarak okuma gruplarının edebiyat üzerinde önemli bir etkisi vardır. Son birkaç yılda kısa bir süre içerisinde birçok Kürtçe okuma grubu oluşturuldu. Bunların içерisinden bazı yeni yazarlar çıktı ve onlar birkaç dergi yayımladılar. Bu nedenle bu okuma gruplarının etkinlikleri Kürt edebiyatında yeni önemli bir yol açtı. Okuma grupları toplantılarına yazarları davet ettiklerinden, yayınevlerinden kitap satın aldıklarından onlar yazarlar ve yayınevleri ile iletişim içersindedir. Bu nedenle bizler de bu incelememizde; 24 okuma grubu, 7 yazar, şair ve 9 yayınevi ile yazılı mülakatlar yaptık. Bu üç muhatabın birbirileri ile ilişkileri, okuma gruplarının örgütlenme tarzları, en çok okudukları edebi türler, okudukları eserler üzerine yaptıkları eleştiriler, onların eksiklikleri, onları bekleyen tehlükeler ve gelecekte onların durumunun ne olacağından bahsettim. Kürtçe okuma gruplarının az ya da çok kitap satışları üzerinde etkilerinin olduğunu gördük. Kürtlərin siyasi şartlarıyla ilişkili olarak okuma gruplarının sayısında artış ya da azalmalar, onların etkinliklerinde ilerleme ya da gerilemelerin olduğunu tespit ettik.

62

**Anahtar Kelimeler:** Kürtçe Okuma Grupları, Kürt Yazarlar, Kitap Okuma, Kürt Yayınevleri

### An Analysis on Kurdish Reading Groups

#### ABSTRACT

As an individual, intellectual and collective activity, reading groups have a significant impact on literature. In the last few years, many Kurdish reading groups have been established in a short time. Some new authors emerged among them and they published several journals. Therefore, the activities of these reading groups opened a new important area in Kurdish literature. Since reading groups invite authors to their meetings and buy books from publishers, they are in contact with authors and publishers. For this reason, we conducted written interviews with 24 reading groups, 7 authors and poets, and 9 publishers in this investigation. We talked about the relations between these three interlocutors, the way the reading groups were organized, the literary genres they read the most, their criticism of the books they read, their shortcomings, the dangers that await them and their future. We have seen that Kurdish reading groups have more or less influence on book sales. In relation to the political conditions of the Kurds we found that there were increases or decreases in the number of reading groups, progress or decline in their activities.

**Keywords:** Kurdish Reading Groups, Kurdish Writers, Reading Books, Kurdish Publishers.

### Extended Summary

People read books for different purposes, such as having a good time, learning, teaching, or being a good reader. This activity can be done individually or collectively. The collective reading activity is called literatur cirles, book clubs or reading groups. This activity, which is mostly done in a different way than academic reading, consists of individuals from the same or different professions coming together for different purposes. Books can be read in different fields or in different genres of literature. Although collective reading activity was previously carried out in different ways in different countries, it first emerged in an organized manner in the early 1990s and in a short time as reading groups it became widespread in many countries. Kurdish reading groups started in the early 2010s and became widespread afterwards. With this study, we aimed to convey the information we reached about the beginning of Kurdish reading groups, their organizational style, the problems they faced and their future. This research is important as no previous study has been conducted on this subject. Since the reading activity is versatile and related to more than one actor, we asked the founders of Kurdish reading groups, the authors invited to the reading activities and the publishers who sold books to these groups through written interviews. We reached 24 reading groups, 7 authors and poets and 9 publishing houses on the subjects we drew attention to. According to the answers we received, we asked the questions repeatedly to the participants in different ways and analyzed their answers. In this way, we tried to present a general framework about Kurdish reading groups. Accordingly, it was determined that the situation of Kurdish reading groups was directly related to the political conditions of the Kurds. It was observed that there was a great interest in reading Kurdish when the demands of the Kurds regarding language, identity and culture were met. Likewise, when these demands were ignored or suppressed, Kurdish reading groups dispersed or their activities stopped. Since most of the members in the reading groups are university students, when the members graduate from school, the activities of the group are interrupted and sometimes the groups are dispersed. The analysis of Kurdish works in reading groups contributed to the development of Kurdish literary criticism. However, this situation did not become permanent because the criticisms made on the works were mostly not published or recorded. Although books in different fields or non-literature are read in reading groups, these are limited. For this reason, a partial generalization can be made to name Kurdish reading groups as novel reading groups since they mostly read novels. In contrast with the postmodern literary theory ignoring the author, in Kurdish reading groups, writers are also a part of the reading activity. Readers directly asked the authors for their criticism of the book. Reading and criticism of their works were welcomed by Kurdish writers. Similarly, Kurdish publishing houses, which sell more books thanks to reading groups, also expressed their positive views on reading groups. Nevertheless, some criticized the fact that Kurdish reading groups mostly ignore other books while conducting reading activities on modern literary genres. Kurdish publishing houses stated that they had offered discounts on their book sales for Kurdish reading groups and helped them to provide reading spaces. It can be already said that Kurdish reading groups have had a significant impact on spreading Kurdish literature. Members of these reading groups have published magazines such as Wêje û Rexne, Zarema, Kund, Vejîn, Laser. Likewise, people in these groups such as Hasan Ildiz, Burhan Tek, Tahir Taninha, Erol Şaybak and İnan Eroglu wrote literary books.

## Destpêk

Di pêşketina takekesî û civakî da roleka girîng ya xwendinê heye. Lewma ferd yan jî civak bi rêya xwendinê li xwe vedigerin, bi nêrîneka cîyawaz berê xwe didin nirx û taybetîyêng xwe. Yek ji jêderkên sereke yên xwendinê pirtûk in û mirov bi armancêna cuda yên wekî dîlxweşkirin, hînbûn, hînkirin, borandina demê, ji bo ku bibe xwînerekî baş hwd. pirtûkan dixwînin. Ev çalakî herçend bi takekesi jî be carinan bi komelî jî dihê kirin. Ev çalakîyêng komî wekî derdorêng (xelqeyêng) edebiyatê (Ing. literature circles), kulübêng pirtûkê (Ing. Book Clubs) yan jî komên xwendinê (Ing. reading groups) dihêng bi nav kirin (Daniels, 2002:1). Endamên van koman ji bo nîqaşa li ser pirtûkekê bi awayekî bipergal dicivin û fikrîn xwe vedibêjin û parve dikan. Di qada perwerdehîyê da ji bo ku xwendevan pirtûkxwendinê wekî taybetîyekî hîn bibin û tiştêng ku dixwînin têbigihin mirov dikare ji rîbaza xelqeyêng edebiyatê jî istîfade bike. Lewma endamên xelqeyêng xwendinê ji xwendevanê dibistanê pêk dihê (Ji H. Daniels vgz. Avcı û yên din, 2010:6).

Herçend bi awayekî modern komên xwendinê û kulübêng pirtûkan di dûmahîka sedsala 20an da derketinge holê jî di sedsalêng 9 û 10an da eywanêng edebiyatê yên ereban, di sedsala 18an da eywanêng frensiyan, di sedsala 19an da derdorêng xwendinê yên li Dewletêng Yekbûyî di vî warî da mînakêng balkêş in. Di sala 1996an da li Amerîkayê hunermenda bi nave Oprah Winfrey di bernameya xwe ya televizyonê da behsa avakirina kulûba pirtûkan ya bi navê “Oprah’s Book Club” (Kulûba Xwendinê ya Oprahê) dike. Di demeka kurt da endamên vê kulûbê zêde dîbin, hejmara firotina pirtûkêng ku Oprah di van civînan da pêşnîyaz dike digihe 700.000î. Piştre li her derê cîhanê gelek komên xwendinê tên avakirin û ew belav dîbin (Burnett, 2015). Li gor daneyêng sala 2011an li Amerîkayê 500.000, li Îngilistanê 50.000 û li Kanadayê li dora 40.000î komên xwendinê hebûne (Procter û Benwell, 2015:5).

Endamên komên xwendinê bi dilê xwe tevlî van koman dîbin. Ev jî nîşan dide ku çalakîyêng komên xwendinê xwesteka xwîneran nebe pêk nayê û ev kom xitabî gelek xwînerenê cîyawaz dikan. Bi dîtina Swann û Allington (2009:248) di komên xwendinê da ji rexnegirêng profesyonel û akademîk cudatir em pêrgî xwîneren din dihêng bê ka ew deqêng edebî çawa şrove dikan û dinirxîn. Ji alîyê zayendî ve dibe ku hemû endamên komê bi tenê ji jinan yan ji mîran pêk werin yan jî ew tevlihev bin. Di navbera endamên komê da dibe ku têkilîyêng cuda hebin, dibe ku ew ji berê da heval bin û bi alîkarîya vê yekê komek ava kiribin. Hinek komên xwendinê tevlîbûna endamên nû dipejirîne lê hinek jî bi tenê ji kesêng heman pîşeyî pêk dihê û ew endamên nû napejirînîn lewma ew komên gîrtî ne. Dibe ku ew kom ji mamoşte, xwendevan hwd. pêk werin. Ji bîli endamên koman her wiha her kom bixwe jî dibe ku xwedîyê pratîkêng cuda bibin. Hinek ji yên din zêdetir civakî bin yan jî hinek ji wan xwedîyê têkilî û ideolojîyêng dînî û sîyasi bibin. Her wiha li gor naverok yan jî mijara pirtûkêng dixwînin ew wekî komên edebî yên modern, klasîk yan jî li gor cureyêng edebî wekî komên romanê, helbestê hwd. dikarin bêng bi nav kirin. Ev kom civînen xwe li malêng hevdu, pirtûkxaneyan, pirtûkfiroşan, navendêng çandê û komeleyan, xwarîngeh û cafeyan yan jî kargehan dikarin bikin (Peplow, 2016:1; Alvarez, 2016:2; Swann û Allington, 2009:251; Clarke û Nolan, 2014:124). Di komên xwendinê da carinan bi bijartina rîberekî/ê, carinan li gor danasînêng pirtûkan yên çavkanîyêng medyayê yan jî bi rîzê her endamekî komê pirtûka ku dê bê xwendin dîyar dike. Ligel vê yekê dibe ku komeka xwendinê di çarçoveya temayekê da pirtûkan dîyar bike. Wekî mînak dikare bê gotin ku 6 mehan dê nivîskarêng Afrikayî piştre jî helbestêng epîk dê bêng

xwedin (Peplow, 2016:36).

Xebatêni li ser komên xwedinê zêdetir di çarçoveya perwerdeyê û wekî rîbazeka perwerdeyê nemaze li ser xelqeyêne xwedinê hatine kirin. Di salêni dawî da di nav Kurdan da jî çanda komên xwedinê wekî çalakîyekê bi pêş dikeve û li çend bajar û navçeyan komên xwedinê hatine avakirin. Lê komên xwedinê yên Kurdi dijberî komên Ewropayî ji ber sedemên wekî xwedîlêderketina çand û zimanê xwe, pêşvebirin û berdewamkirina wê hatine avakirin û mirov dikare bibêje xwedîyê sekneke dijasimîlasyonîst e. Bêguman mirov nikare bibêje ku hemû endamên komên xwedinê yên Kurdi ji ber heman sedeman hatine nik hev. Dibe ku her yek ji ber sedemeka cuda tevlî komê bûbe. Lê dîsa jî ya ku wan digihîne hev ev refleskên wan yên neteweyî ne. Li gor lêkolînen me heta niha tu xebat li ser komên xwedinê yên Kurdi nehatine kirin lewma em dixwazin bi vê xebata xwe bala lêkolîneran bibin ser vê mijarê. Ligel vê yekê li ser van koman ji bilî çend agahî û bangewazîyên şêwira nivîskaran yên di tora internetê da me tu çavkanîyên nivîskî nedîtin.

Wekî Robert Escarpit dîyar dike berhemên edebîyatê; nivîskar, pirtûk û xwînerî yan jî bi gotineka din afirînerên hunerê, berhem û komên xwîneran di nav xwe da dihewîne (1992:7). Lewma ji ber ku komên xwedinê bi tevlîbûna nivîskaran ya li şêwiran têni zanîn û rastûrast li ser bazara firotina pirtûkên Kurdi bandoreka wan heye, me bi rîbaza hevpeyvînen nivîskî ligel damezirînerên komên xwedinê, nivîskarêne wekî mîvan tevlî şêwirê van koman bûne û weşanxaneyên Kurdi hevpeyvîn kirin. Me pêşiyê derbarê komên xwedinê yên Kurdi, pêvajoya avakirina wan da çend agahî dan. Piştire jî li gor nîrîna damezirînerên van koman, nivîskaran û weşanxaneyen pirsgirêk û pêşnîyazên derketine holê dîyar kirin.

## 1. Komên Xwendinê yên Kurdi

### 1.1. Agahîyên Ser Damezirandina Komên Xwendinê yên Kurdi

Di lêkolîna xwe da me navê 40 komên xwedinê yên Kurdi peyda kirin lê ji wan 24 koman bersiva pirsên me dan. Komên xwedinê yên bersiva me nedan ev in: Koma Lêkolîn û Xwendinê (Edene), Koma Xwendinê ya Gulistan (Stenbol), Koma Xwendinê ya Viyêname, Burdirê, Konyayê, Bismilê, Farqînê, Fêrikê Ûsiv (Batman), Nisêbînê, Midyadê, Evdalê Zeynikê (Agirî), Taksîmê (Stenbol), Stenbolê I, Stenbolê II, Antalyayê, Koma Wêjeyê ya Online. Navê komên ku me ligel hevpeyvîn kir û ahagîyên derbarê dîroka avakirina komê, cihê wê, hejmara pirtûkên hatine xwedin, periyoda şêwiran û dîroka şêwira dawîyê ev in:

		Dîroka Avakirina Komê	Bajar/Navçe	Hejmara Pirtûkêñ Hatine Xwendin	Perîyoda Şêwiran	Şêwira Dawîyê
1	Şêwira Xwendina Edebîyata Kurdi	Dawîya 2009an	Stenbol	80	14 roj	2017
2	K.X.ya Diyarbekirê	2010 (Îlon)	Diyarbekir	150	15 roj	25.12.2016
3	K. X.ya Qoserê	Pûşpera 2012an	Qoser	57	7-14-21 roj	2015
4	K.X.ya Celadet Ali Bedirxan	03.12.2013	Sêrt	?	21 roj	2014
5	K. X. ya Vejinê	2014	Mêrdin	69 (?)	7 roj	13.03.2020
6	K.X.ya Çewligê	24.05.2014	Çewlîg	?	15 roj	15.12.2019
7	K.X.ya Batmanê (I)	2015	Batman	57 (?)	1 meh	2017 Îlon
8	K. X. ya Wanê	2015	Wan	68	7 roj	15.03.2020
9	K. X.ya Amedê	07.04.2016	Diyarbekir	65	15 roj	30.09.2020
10	K. X. ya Mele Meh-mûdê Bazidî	05.11.2016	Agiri	15 (?)	1 meh	19.02.2017
11	Koma Sormeyê ya Xwendinê	10.11.2016	Qamişlo	15	1 meh	16.04.2018
12	K.X.ya Eğitim-Senê	2017	Diyarbekir	32	15 roj	08.03.2020
13	Koma Helbestê ya Amedê	27.11.2017	Diyarbekir	50	15 roj	16.08.2020
14	K. X. ya Ferzad Kemanger	2018	Stenbol	50	7 roj, 14 roj	?
15	K. X.ya Berken Bereh	26.08.2018	Batman	44	15 roj	25.04.2020
16	K. X. ya Cizîra Botan	01.10.2018	Cizîr	22	15 roj	?
17	K.X.ya Mersinê	19.11.2018	Mersin	20	15 roj	15.02.2020
18	K.X.ya Zankoya Mûşê	2019 (?)	Mûş	20	7 roj	07.06.2019
19	Koma Helbestê ya Stockholmê	12.01.2019	Stockholm	?	15 roj	Berdewam dike
20	Koma Nirxandina Wêjeyê	18.01.2019	Stockholm	?	15 roj	Berdewam dike
21	K. X. ya Weqfa İsmail Beşikciyê	15.09.2019	Stenbol	4	14 roj	13.11.2020
22	K.X.ya Mestûre Erdelanî	20.09.2019	Enqere	3	7 roj	19.10.2019
23	K.X.ya Batmanê (II)	19.01.2020	Batman	2	14 roj	22.02.2020
24	Klûba Wêje û Xwendinê ya Dîlokê	21.02.2020	Dîlok	?	15 roj	08.03.2020

Wexta em li tabloya li jor dinêrin em dibînin ku li gor daneyên hejmara pirtûkên hatine xwendin komên xwendinê bi gelempêri bi awayekî periyodik şewiran nakin, dîroka şewira xwe ya dawîyê jî nizanin. Niha jî em dê bi rêtê derbarê van komên li jor çend agahîyan bidin bê ka ji alîyê kê ve hatine damezirandin, endamên wan yên din kî ne, li kîjan mekanan şewiran dikin, ji bilî şewiran kîjan çalakîyên çandî û hunerî dikin hwd. Lê divê bê zanîn ku di hevpeyvînan da carinan damezirînerên koman ji ber sedemên cuda nexwestin bi awayekî eşkere navêne damezirîner û endamên koman bidin, heta carinan ev pirsa me nebersivandin.

**Şewira Xwendina Edebîyata Kurdî (Stenbol):** Berî vê komê cara pêşiyê li Bakur, li Mêrdînê di navbera salên 2006 û 2008an da mameste û nivîskarêne Kurd li avahîya KESKê (Kamu Emekçileri Sendikası: Sendîkaya Kedkaran ya Giştî) di şewirêne bi navê “Saeta Rexneyê/Elestiri Saati” da pirtûk dixwendin. Ev bername pêşiyê bi tirkî hatine kîrin piştre êdî bi Kurdî berdewam kirîye. Dîsa jî bi awayekî bipergal û domdar em dikarin bibêjin ku koma xwendinê ya ewil Şewira Xwendina Edebîyata Kurdî ye. Ev herdu kom ji hev cuda ne. Bi tenê yek ji damezirînerê koma KESKê Çetoyê Zêdo dema ji bo xwendina zanîngehê ji Mêrdînê diçe Stenbolê li wir ligel A. Rahman Çelik Şewira Xwendina Edebîyata Kurdî ava dikin. Endamên vê komê yên din ev in: Ferhad Çeber, Welî Aksoy, Hêja Netirk, Fûad Kaya, Azîz Tekin, Hesen Ildîz, Esra Boğa, Mewlud Oğuz, Gulistan Zeren, Leyla Aksoy, Kubra Sağır. Wan bi piranî şewirêne xwe li Seyrî Meselê, Enstituya Kurdî ya Stenbolê û Weqfa Îsmail Beşikçiyê kirine. Wan ligel kesên wekî Ferhad Pîrbal (Wêje û Şano), Abdullah Keskîn (Editorî), Helîm Yûsiv (Nivîskarî) bername çêkirine (Zêdo, 01.10.2020).

**Koma Xwendinê ya Diyarbekirê:** Damezirîner: M. Emin Aksu, Ahmed Kanî, Dawid Yeşilmen, Bawer Berşev, Tahir Taninha. Şewirêne xwe piranî li DSMYê (Diyarbakır Sanat Merkezi: Navenda Hunerê ya Diyarbekirê) û Weqfa Îsmail Beşikçiyê kirine (Kanî, 05.10.2020).

**Koma Xwendinê ya Qoserê:** Damezirîner: Umran Aran, Burhan Tek. (Endam): Bajar Mîrzeman, Kerem Qoserî, Edîp Bozan, Xelîl Semed, Vecdi Demîr, Mûrad Seroxan. Şewirêne xwe piranî li Aziz Usta Pastanesi û Babil Kitap kirine (Tek, 20.10.2020).

**Koma Xwendinê ya Celadet Alî Bedirxan:** Damezirîner: Selamî Esen, Hêja Rana, Omer Toprak, Nurcan Sartik, Yilmaz Aksu, Mesut Fîdan. (Endam): Xelîlê Zer, Mahîr, Sewda, Beşîr, Ayşe. Şewirêne xwe piranî li Pirtûkxaneya Şaredariya Sîrtê, Kevirê Qul, Parqa Orhan Dogan, Cafeyên Girê Qîzan, Avahiya Eğitim-Senê kirine. Wan ligel kesên wekî Remezan Alan, Zeynelabidîn Zinar, Mesud Fîdan, Abdullah Gürgen gotûbêj û panel jî amade kirine (Toprak, 28.09.2020).

**Koma Xwendinê ya Vejînê:** Kom cara pêşiyê ji alîyê Înan Eroglu, Mehmet Emîn Çirik, Erol Şaybak ve hatiye damezirandin. Ji ber ku ew xwendekarêne zanîngeha Artukluyê bûne, pişti zanîngehê xelas dikin çalakîyên komê disejkine. Cara duyemîn jî ji alîyê Şîrko Janzêm, Îklîm Oral û Hebîb Gîyan ve dîsa tê damezirandin. (Endam): Zana, Berfin, Abdullah, Rojvan, Fatê, Selamî, Nîyazî, Aşkin, Cîhan, Melek, Şîrvan, Mûkader, Fatma. Şewirêne xwe piranî li Komaleya Nûbiharê û Atolyeya FFÊ kirine. Rêze semînerên Kurdolojîyê û çalakîyên filman li dar xistine, li ser wan şewir kirine (Janzêm, 07.10.2020).

**Koma Xwendinê ya Çewlîgê:** Kom ji alîyê lêkolîner û xwendekarêن zanîngeha Bingolê ve hatîye damezirandin. Damezirîner: Omer Delikaya, Mem Artemêt, Tufan Yamaç, Rabia Ay, Demet Arga, Halal Yıldız, Sabri Küller, Şükrû Demir. (Endam): ?. Şêwirêن xwe carinan li zanîngehê carinan jî cihêن wekî Engelsiz Cafe, Mavî Cafe, Cema Cafe kirine. Wan rojêن şanenavan û şano, pîrozbahîyêن rojêن taybet (Roja Zimanê Kurdi) amade kirine (Yıldız, 27.10.2020).

**Koma Xwendinê ya Batmanê (I):** Damezirîner: Weysel Tirpan. (Endam): Şêwirêن xwe piranî li Komeleya Nivîskarêن Kurd kirine (Tirpan, 22.10.2020)<sup>1</sup>.

**Koma Xwendinê ya Wanê:** Damezirîner: Serhed Serhedî, Ferat Şivan. (Endam): Bihar, Fatê, Fatoş, Esma, Sema Evdila, Heval, Hikmet, Emer, Ferdî, Dawid, Mûsa, Rojhat, Mistefa, Azad. Wan şêwirêن xwe li malên endamêن komê û cihêن wekî Lîlav Cafe, Bajar Cafe, Textê Reş Cafe, Eskîcî Cafe, Seyyah Cafe kirine (Serhedî, 02.11.2020).

**Koma Xwendinê ya Amedê:** Damezirîner: Hesîb, Sevgul, Remziye, Ebdullah, Leyla, Selehat, Seyhan. (Endam): Ehmed, Xecê, Mirad, Mem, Huseyn, Bayram, Eyşe. Ligel Koma Helbestê ya Amedê çûne Cizîrê û ligel endamêن Koma Xwendinê ya Cizîra Botan li cihêن dîrokî gerîyane. Ligel komên xwendinê yên Qoser, Farqîn û Vejînê li Mêrdînê li ser pirtûka Îrfan Amîda ya bi navê Şevek Şîzofren şêwirek li dar xistine (Şaşmaz, 01.10.2020).

**Koma Xwendinê ya Mele Mehîmûdê Bazidî (Agırı):** Damezirîner: Hasan Akboğa, Avşîn Evdil-barî, Nihat Öner, Betül Yaşar, Ahmet Yazıcı, Yaşar Eroğlu, Hasan Yıldırım, Binevş. (Endam): Cüneyt, Osman, Hasan, Sebiha Kaya, Çetin Yıldırım, Ömer Sontur, Savaş Sontur, Mehmet Sait Yaman, Qazî Mihemed, Tuncay Sürücü, Mahir Alioğlu, Mustafa Şimşek. Wan şêwirêن xwe piranî li Navenda Çandê ya Semayê û Kurdi-Derê kirine (Akboğa, 16.10.2020).

**Koma Sormeyê ya Xwendinê (Qamişlo):** Damezirîner: Evdo Şêxo, Ebas Mûsa, Leyla Hibo. (Endam): ?. Wan piranî şêwirêن xwe li bajarêن Qamişlo û Amûdê cihêن wekî Navenda Kovara Sormeyê, Dêra Fabronyayê kirine. Endam û damezirînerên komê ji bo ku Kurdi li pêş çavê zarokan şîrîn bikin çîrok ji wan ra xwendine û şahî li dar xistine (Şêxo, 02.10.2020).

**Koma Xwendinê ya Eğitim-Senê (Amed):** Damezirîner: Fatma, Hawa, Xoşewîst, Serwer, Ke-mal. (Endam): Stran Şev, Rîhan, Qedriye, Hemê, Fesîh, Dîlan. Wan şêwirêن xwe piranî li avahîya Sendîkayê kirine. Endamên komê bihevre çûne temasîkirina lîstîkêن şanoyê (Şev, 02.10.2020).

**Koma Helbestê ya Amedê:** Damezirîner: Hasîb Yanlıç. (Endam): Sultan Yaray, M. Saît Arzû, Roza Metîna, Zozan Gulan, Nûrcan Delîl, Mordem Zel, Încî Egîd, Şeref Akgul, Arîfe Avcı, Hasib Yan-liç, Hasbey Koksal. Ew tev li civîna yekemîn ya Klûba Wêje û Xwendinê ya Dîlokê bûne. Ligel Koma Xwendinê ya Amedê di çarçoveya Roja Çîrokan ya Cîhanê da bihevre bernameyek li dar xistine, li ser çîrokan gotûbêj kirine û pişte Sêva Mêxekräj çêkirine (Metîna-Endez, 15.10.2020).

**Koma Xwendinê ya Ferzad Kemanger (Stenbol):** Damezirîner: Barişê Porxelek, Mem Arîn, Rojaria Henifi Ronak, Dîlan Daş, Bîlalê Xerzî, Maviş Daş, Bêrîvana Mizîzexî, Elîcan Ceyrancîko,

1 <sup>1</sup> Endamên din nexwestin navêن wan bêñ parvekirin.

Elî Hoşeng, Xebat, Ferît Yavûz, Haco, Azad. (Endam): Evdirrehman, Îlyês, Kulîlk, Bahadîn, Bawer. Wan şêwirêñ xwe piranî cihêñ wekî Şevîn Cafe û Morî Cafe kirine. Her wiha wan ligel 20 nivîskaran gotûbêj kirine, yek ya xwendinê yek ya nivîsandinê du pêşbirk çêkirine. Ji bilî van xebatan atolyayekî online amade kirine. Ev wekî xebateka zaningeheka online bûye. 30 xwendekaran li ser besêñ cuda yên edebîyata Kurdî ji kesêñ wekî Abdurrahman Adak, Dilawer Zeraq, Kovan Baqî û Îsabella Bêrîvan 60 saet ders girtine (Xerzî, 09.11.2020).

**Koma Xwendinê ya Cizîra Botan:** Damezirîner: Egîd, Gulê. Wan şêwirêñ xwe bi piranî li malêñ endamên komê û Damla Pastanesiyê kirine. Ligel Komeleya Çand û Ziman a Birca Belek çalakîyêñ çandî kirine (Arjen, 11.11.2020)<sup>2</sup>.

**Koma Xwendinê ya Berken Bereh (Êlih):** Damezirîner: Ahmet Seyarî, Ramazan Yaman. (Endam): Berken Bereh, Merdan, Alî, Hayat, Bawer, Ronî, Dilazad, Ercan, Hejar, Murat, Osman, Rasim, Xêredîn. Şêwirêñ xwe bi piranî li komeleya Ehmedê Xanî kirine. Ji bilî xwendin û nirxandina pirtûkan semînerêñ di warê çand, ziman û edebîyata Kurdî da li dar xistine. Semînerêñ ku hatine kirin ev in: 1. Teorîyêñ neteweperwerîyê û destpêka neteweperwerîya Kurdî; 2. Teorî û bingeha realîzma sosyalîst û destpêka wê di edebîyata Kurdîda; 3. Kolonyalîzm û dijkolonyalîzm; 4. Teorîya femînîzmê û rengvedana wê di edebîyatê da (Seyarî, 03.10.2020).

**Koma Xwendinê ya Mersînê:** Damezirîner: Mihemed, Baqî, Emîn, Serdar, Azîz Aksu, Ferhad. (Endam): Silehîn, Remezan, Hudayî, Seîd, Sozdar, Şilan, Bazîd, Heman. Şêwirêñ xwe bi piranî cihêñ wekî Artuk Bey, Stran Cafe, Atolyeya Derya Spî kirine (Aksu, 07.10.2020).

**Koma Xwendinê ya Zankoya Müşê:** Damezirîner: Ayetullah Çelik, Sidar Gök, Mahmut Ceylan. (Endam): ?. Ev kom ji alîyê xwendekarêñ zanîngeha Muş Alparslanê hatîye damezirandin. Wan şêwirêñ xwe bi piranî li zanîngehê kirine. Ji bilî şêwiran carekê şanoyeka Kurdî jî amade kirine (Ceylan, 28.09.2020).

**Koma Helbestê ya Stockholmê:** Damezirîner: Kamran Simo Hedilî, Kadir Çelik, Mekbula Çolak, Aynur Aras, Ednan Dogan, Kawa Xosrewî, Turec Esperî, Îman Botanî (Hedilî, 02.10.2020).

**Koma Nirxandina Wêjeyê (Stockholm):** Damezirîner: Kamran Simo Hedilî, Şoreş Reşî, Mîrhem Yîgit, Zagiroz Endezarî, Lokman Polat, Osman Eyter, Ednan Dogan, Emîr Mukranî (Hedilî, 02.10.2020).

Koma Helbestê ya Stockholmê û Koma Nirxandina Wêjeyê di bin sîwanê Enstûtîya Kurdî ya Stockholmê da xebatêñ xwe berdewam dikin lê niha şêwirêñ xwe bi awayekî online dikin. Wan bi piranî şêwirêñ xwe li eywana enstûtîyê yan jî eywanêñ cuda yên bajarêñ cuda yên Swêdê kirine. Her wiha wan konferas, semîner û rojêñ danasîna berhemên wêjeyî jî li dar xistine (Hedilî, 02.10.2020).

**Koma Xwendinê ya Weqfa Îsmaîl Beşîkçiyê (Stenbol):** Kom ji alîyê Suat Baran û serokatiya Weqfa Îsmaîl Beşîkçiyê hatîye damezirandin. Endamên wê ev in: Xecê Daşxîn, Gernas Nenas, Mehmet Erbaş, Ümrان Dogan, Recep Güneş, Evîn Aydin, Dîlan Salik, Melahat Goktaş, Melek Yavuz,

2 Endamên komê nexwestin navêñ wan bêñ parvekirin.

Dilek Azad, Ozden Demir, Ensar Kûl, Dîlan Taycur, Kate Ferguson, Şûkran Akti, Şûkran Yaguz, Sibel Çokşen, Hêvî Nûjîyan, Yusuf Ak, Serkan Menekşe. Wan şêwirêne xwe li avahîya weqfê kirine (Baran, 12.10.2020).

**Koma Xwendinê ya Mestûre Erdelanî (Enqere):** Damezirîner: Izzet Arslan, Fesih Olmez, Havîn Kiye, Bahattîn Akhan, Şehmuz Ceylan, Amine Bayram. (Endam): Şehmuz Arslan, Gönül Gün, Ziya şeker Buket, Nuri. Wan bi piranî şêwirêne xwe li Destar Cafe kirine (Kiye, 08.10.2020).

**Koma Xwendinê ya Batmanê (II):** Wan şêwirêne xwe li Komeleya Mereto ya Ziman û Çandê kîrine. Hinek endamên komê ji bili şêwirêne xwendinê perwerdehîya Kurdî dîtine (Rûbar, 03.10.2020)<sup>3</sup>.

**Klûba Wêje û Xwendinê ya Dîlokê:** Damezirîner: Fewzî Şahîn, Ercan Berwarî. (Endam): ?. Wan şêwirêne xwe li Karanfil Cafeyê kirine (Şahîn, 11.10.2020).

Herçend ku piştî vîrûsa Covid-19ê xebatê komên xwendinê rawestîyane dîsa jî çend sedemên din jî hene bê ka çîma gelek ji van koman êdî xebatê xwe berdewam nakin. Yek jî hêzeka sereke ya van koman xwendekarêne zanîngehan in. Wexta damezirîneren wan zanîngehê xelas dikin yên li dû wan têbî heman awayî xebatê xwe berdewam nakin û êdî kom belav dibin. Ev jî nîşan dide ku barê giran yê van xebatan li ser pişta çend kesen sereke ye. Ji ber ku ev kes şêwiran, mekanên civînê organîze dikin. Ligel vê yekê şert û mercen nebaş yên civaka Kurd pêrgî tê, rewşa siyasî ya Tirkîyeyê jî bi awayekî bandorê li ser xebatê komên xwendinê kirîye. Di hevpeyînê me da çend xalê dî yên sereke derketin li pêş. Wekî mînak piştî şerê xendeqan û bi hatina qeyûman xebatê çand û hunerî yên Kurdî sekinîne, bi KHK'yan komale û saziyên Kurdî hatine girtin vê yekê jî bandor li ser komên xwendinê kirîye. Gelek endamên komên xwendinê yên karmendê dewletê ji ber van sedemên navborî û ji tîrsa ku ji kar bêñ dûrxistin nexwestine êdî bêñ şêwirêne xwendinê. Karê xwendinê bi dilsozî pêk tê. Wexta endamên komê êdî bi awayekî micid pirtûkan naxwînin, hêz û motîvasyona wan ya xwendinê namîne ev jî bûye sedem ku kom belav bibin (Zêdo, 01.10.2020; Kanî, 05.10.2020; Akboğa, 16.10.2020; Toprak, 28.09.2020; Kiye, 08.10.2020).

## 1.2. Taybetîyê Komên Xwendinê yên Kurdi

Lucien Goldman wexta behsa civaknasîya romanê dike dibêje ku kirdeyê rasteqîn ya afirînerîya çandî ne takekesenî izolekirî lê komên civakî ne. Bi dîtina wî pirsa sereke ya ku civaknasîya romanê bersiva wê digere wekî cureyekî edebî roman û têkiliya wê ligel civaka takekes ya modern e. Lewma ew di navbera struktura romanê, mirovên ku di civakê da ji bo bazarê hilberînê dikin û metayê têkilî-yekekî girê dide (2005:25). Xebatê civaknasîya edebîyatê di navbera berhemên edebî yên herî pêşketî û hismendîya kolektif ya koman têkiliyekî girê didin. Ew jî bi me dide zanîn ku divê em têkiliya di navbera berhem û takekesê (nivîskarê) ku ew nivîsandîye zêdetir li ser têkiliya wê ya ligel komên civakî bisekinin (2005:74). Komên xwendinê yên Kurdî jî wekî kirdeyeka afirînerîya çandî di şêwirêne xwe da wekî cureyeka edebî herî zêde roman xwendine. Ev yek ji ber xwesteka taybet ya endamên koman pêk hatîye. Roman li gor cureyên dî dirêjtir e, xwedîyê gelek karakteran e lewma xwîneran şîyane zêdetir li ser biaxivin, şîrove û nîqaşan bikin. Her wiha ev rîbaz ji bo wan hêasantir bûye.

<sup>3</sup> Yek ji damezirîner û endamê komê Firat Rûbar diyar kir ku damezirîner û endamê komê yên din nexwestine navên wan bêñ parvekirin.

Endamên komên xwendinê roman ji bo nirxandinê wekî cureya herî lêhatî dîtine. Nemaze kesen ku besên edebîyatê xelas kirine hewil dane rîbaza dahûrînê ya edebî ji alîyê endamên dî yên komê ve jî bê zanîn. Ji bo vê jî wan pêşî dane xwendina romanen (Janzêm, 07.10.2020; Toprak, 28.09.2020; Kanî, 05.10.2020; Şêxo, 02.10.2020). Ev xal, wekî me li jor ji L. Goldman ragihand, nîşan dide ku komên xwendinê yên Kurdî ji bo nirxandina hişmendîya kolektîf û têkilîya wê ligel cureya ku herî zêde hatîye xwendin (roman) nimûneyan diwehîne.

Terry Eagleton dîyar dike ku heke besdarîya xwînerî ya çalak û bêrawestan nebûya berhemeka ede-bî dernediket holê. Lewma xwendin tevgereka yeknesak û çıxêzî (Ing. Linear) nîne (2004:103-104). Wexta em vê tevgera neyeksan bi komên xwendinê ra rave bikin divê em ji bîr nekin ku xwendin di heman demê da hilberîneca civakî ye. Bi xwendinê ra xwîner dîsa li çanda xwe vedigere û jê îstîfade dike (Ji H. Uçan vgz. Alver, 2012: 38), her wiha berhemên ku jê derketine rexne jî dike. Komên xwendinê yên Kurdî jî bi qasî ku şiyane ne bi xwendineka yeknesak li ser berheman hûr bûne. Lewma di nirxandina pirtûkan da tê dîtin ku ew ji bo bicihkirina rîbaza rexneya edebî di nav hewildanan da bûne, wan her bal kişandîye li ser rola girîng ya rexneyê, ne bi tenê rexneyê erêni her wiha rexneyêneyîn jî kirine. Wekî mînak endamên Koma xwendinê ya Berken Bereh berî ku dest bi xwendina pirtûkan bikin, xwendinê li ser teorîyêne rexneyê kirine, 15 rojan carekê li ser mijarekê semîner li dar xistine. Lê dîsa jî çend endamên komê ji vê yekê dûr sekinîne û bi “refleksên Kurdevarf” pirtûk nirxandine (Seyarî, 03.10.2020). Di Koma Xwendinê ya Qoserê da jî pişî xwendina pirtûkê her car yek ji endamên komê li gor qaïdeyên rîbaza rexneya edebî li ser pirtûkê nivîsek amade kirîye (Tek, 20.10.2020). Çawa ku T. Eagleton jî dîyar dike (2004: 113) “ji bo têgihiştina her tişte nedîyarkirî û nedestnîşankirî yên di deqê da” komên xwendinê yên Kurdî di nav hewildanan da bûne. Wekî encama van hewildana em dibînin ku ji nav komên xwendinê kovarên wekî Wêje û Rexne, Zarema, Kund, Vejîn, Laser jî ji alîyê endamên komên xwendinê ve hatine derxistin. Ev kovar ji bo bicihkirina rexneya edebîyata Kurdî xwedî roleka girîng bûne. Ew, carinan bi mijarîn taybet hatine weşandin lewma mirov dikare bibêje ku ev yek ligel lêkolînen akademîk yên din ji bo rexneya edebîyata Kurdî bûye bingehek.

71

Yek ji kîmasîyên sereke yên komên xwendinê yên Kurdî ew e ku ew encama şêwiran û nirxandinê li ser pirtûkan tomar nakin û naweşînin. Ligel vê yekê ew ji bo çareserkirina vê muşkîleyê daxwaza xwe vedibêjin. Hinek ji wan, encama şêwirêne xwe li ser hesabêne xwe yên medyaya civakî (Facebook, Twitter, Instagram, blog hwd.) parve kirine (Şêxo, 02.10.2020). Koma Xwendinê ya Berken Bereh li ser her endamekî/a komê ferz kirîye ku di mijareka taybet da li ser pirtûkekê gotarekê binivîse û wê di kovarekê da biweşîne. Ji bo hakemîya van gotaran wan lijneyek ava kirîye. Di encamê da 8 gotar hatine nivîsandin lê ji wan bi tenê 2 lib hatine çapkîrin (Seyarî, 03.10.2020). Endamên hinek koman ji teorîya rexneyê hayedar nebûne lewma di vê mijarê da ne di asteka xurt da bûne, wan nekarîye yan jî nexwestine encamên şêwirêne xwe li cihekî biweşînin (Akboğa, 16.10.2020). Hinek koman jî bi zane-bûn ev yek nekirine. Ji ber ku wan ev kar wekî berpirsyarîye ka micid dîtine armanca wan ya sereke ew bûye ku xwendina Kurdî bidin hezkîrin û wan nexwestîye şêwir ji atmosfera sihbetê derkeve (Rûbar, 03.10.2020; Baran, 12.10.2020). Yek ji xetereyên girîng li tomarkirina encamên van şêwiran ew e ku dema nivîsîn şêwiran bi tenê li ser hesabêne medyaya civakî têne parvekirin ji ber êrişen hackkirinê ew bi tevalî ji dest diçin.

Terry Eagleton dibêje ku berê di nav sêgoșeya nivîskar, berhem û xwînerî da yê ku herî kêm cîyawaz û hatîye ihmalkirin xwîner bû. Heta çîna nivîskaran ya “pozbilind” wekî xizmetkarekî û kesekî ku karê nav dest û pêyan dike nêzîkî xwînerî bûye. Lê bi demê ra xwînerî xwe wekî afîrînerê hevpar yê berhemê nîşan daye (Eagleton, 2012:188). Bêguman ev guhertin bi alîkarîya teorîya postmodern pêk hatîye. Ji ber ku pişti nivîsên Roland Barthes û Michel Foucault li ser têkilîya xwîner û nivîskarî nîqaşek dest pê dike. Di vê nîqaşê da nivîskar bi paş da tê hiştin, deq (berhem) û xwîner bi pêş tê xistin, edebîyateka navend-deqî tê bicikirin. Bi vê yekê ra xwîner tê azadkirin (Ji P.M. Rosenau vgz. Alver, 2012:34). Xwînerên komên xwendinê yên Kurdi jî wekî rewşa xwînerê berê berovajî bike ligel nivîskaran têkilîyên xurt ava kirine, nivîskar vexwendine şêwirên xwe. Lewma di vê çalakîya xwendinê da aktorên sereke nivîskar nîn in lê komên xwendinê ne. Dîsa jî di mijara tevlîbûna nivîskaran ya li şêwiran da komên xwendinê xwedî fikrên cuda ne. Yênu ku vê yekê erênenî dibînin dibêjin ku wexta nivîskar jî tevlî dibe nîqaşen li ser pirtûkê bibandortir dibe, tiştên ku xwîner tênegihiştiye rastûrast ji nivîskarî dipirse û mijar zelal dibe, nivîskar û xwîner hevdû nas dikin. Ev yek eleqeya li ser pirtûkê zêdetir dike û xwîner baştır bala xwe didin şêwirê. Xwîner hemû agahîyen di derbarê pirtûkê da ji kesê yekem hîn dibin, nivîskar hay ji kîmasî û xeletîyên xwe dibe û dibîne ku pirtûka wî/wê bi gelek nêrînên cuda ve tê nirxandin (Şêxo, 02.10.2020; Tirpan, 22.10.2020; Rûbar, 03.10.2020; Yildiz, 27.10.2020; Kanî, 05.10.2020; Şev, 02.10.2020). Yênu ku tevlîbûna nivîskarî neyêni dibînin dibêjin ku carinan hinek nivîskar rexneyan napejîrinin lewma endamên komê xwe rihet hîs nakin, şerm dikin yan jî dilê wan nagire rexneyan bikin û ev yek otosansûrekî bi xwe ra tîne. Ew nikarin rexneyen neyêni bikin. Bi dîtina hinekan jî dibe ku nivîskar bêhemdî xwîneran bitepisînin lewma ew naxwazin nivîskar tevlî şêwirê bibin (Tek, 20.10.2020; Akboğa, 16.10.2020; Kiye, 08.10.2020; Baran, 12.10.2020).

Li ser têkilîya komên xwendinê ligel weşanxaneyên Kurdî komên xwendinê dîyar dikin ku bi gellemperî têkilîyeka baş di navbera wan da heye. Wan carinan ji weşanxaneyan bi komî pirtûk kirîne. Komên ku ji derveyî Stenbol û Amedê jî bi rêya pirtûkfiroşen online pirtûk peyda kirine. Hinek kom ji weşanxaneyan hêvî dikin ku ew pirtûkan erzantir bidin wan. Bi dîtina wan gelek endamên wan bêkar in û ji alîyê aborî ve zihmet e ku di mehekê da 2 yan jî sê pirtûkan bikirin. Ew dixwazin ku weşanxane pirtûkan di wextê xwe da peyda bikin, pirtûkên ku çapên wan xelas bûne dîsa çap bikin (Tirpan, 22.10.2020; Şev, 02.10.2020; Baran, 12.10.2020; Endez). Bi dîtina hinekan divê weşanxaneyên Kurdî bi tenê ne bi helwesteka bazirganîyê tevbigerin, ji komên xwendinê ra sponsorîyê bikin. Ligel wan û nivîskaran rojîn şanenavan, konferans, semîner, panelan li dar bixin (Seyarî, 03.10.2020; Akboğa, 16.10.2020). Di sektora weşangerîyê da yekdestîyê nekin (Yildiz, 27.10.2020), ligel editorên baş bixebeitin da ku pirtûkên baş û biqalîte bêن çapkîrin (Rûbar, 03.10.2020; Kanî, 05.10.2020; Şaşmaz, 01.10.2020), wekî pdf jî pirtûkan bifiroşin (Hedîlî, 02.10.2020). Bi dîtina hinek koman jî nehewce ye ku ew ji weşanxaneyan bikevin bendewarîya hêvîyekê. Ji ber ku weşanger karê bazirganîyê dikin (Tek, 20.10.2020).

Fikrên komên xwendinê yên li ser siberoja komên xwendinê yên Kurdî û komên ku dê nû bêñ da mezirandin çend xalêng girîng derxistin holê. Bi dîtina hinek koman ji ber ku rewşa zimanê Kurdî ber bi gesbûnê ve diçe dê hejmara komên xwendinê jî zêdetir bibin (Şêxo, 02.10.2020; Şev, 02.10.2020; Şaşmaz, 01.10.2020). Li alîyê din hinek kom ji ji ber rewşa siyasî ya Tirkîyeyê di mijara rewşa niha û siberoja komên xwendinê da bedbîn in (Seyarî, 03.10.2020; Akboğa, 16.10.2020; Baran, 12.10.2020).

Di mijara girîngîya komên xwendinê bo çand, ziman û edebîyata Kurdî da lihevkirineka giştî heye. Em pêşnîyazên komên xwendinê yên ji bo komên ku dê nû bêñ damezirandin jî hîn dibin. Bi dîtina hînek koman divê komên nû endamên xwe sînordar nekin, vekirî û guherbar bibin, li ser pirtûkên ne wêjeyî jî şêwiran bikin (Şexo, 02.10.2020). Divê haya endamên komê bi teorîya edebîyatê hebe û ew pirtûkên sereke bixwînin. Ew bi avakirina komên online dikarin xwe bigihînin gelek endaman. Hêj di destpêkê da plan û bernameya xwe dîyar bikin û li gor vê yekê bi sekineka micid, bi rêkûpêk û disiplîn şêwiran xwe bikin. Heke pirtûkan nexwînin divê ew neyên şêwiran lewma divê li dîroka şêwirê miqate bibin, bi komên din ra bişewirin (Tek, 20.10.2020; Rûbar, 03.10.2020; Akboğa, 16.10.2020; Janzêm, 07.10.2020). Ji bo ku bar li ser pişta çend kesan nemîne divê berpirsyarîyê bidin kesen ji bilî damez-rînerên komê (Kiye, 08.10.2020), divê ew nirxandinê xwe birêkûpêk tomar bikin û biweşinîn (Kanî, 05.10.2020). Divê sazîyên Kurdan piştgirîya komên xwendinê bikin (Seyarî, 03.10.2020), komên ji ber pandemîyê êdî şêwiran nakin pişti ku vîrûs xelas bibe dîsa xebatêن xwe berdewam bikin (Janzêm, 07.10.2020).

## 2. Bi Dîtina Nivîskarêن Kurd Komên Xwendinê yên Kurdî

Dî lêkolîna xwe da me li ser komên xwendinê yên Kurdî ligel nivîskar û helbestkarêن Kurd; Berken Bereh, Cîhan Roj, Dilawer Zeraq, Erol Şaybak, Îrfan Amîda, Omer Dilsoz û Şener Özmen hevpeyvîn kirin. Me li gor qaîdeyêن wekî hilberînerên cureyêن edebî (romannûs, çîroknûs, helbestkar), li gor umrê nivîskaran (kesen ciwan û temenmezin) û li gor zayendê (jin û mîr) xwest xwe bigihînin wan. Lê mixabin çend nivîskar û helbestkarêن jin û mîr bersiva me nedan. Ev nivîskarêن navborî jî gelek caran ji alîyê komên xwendinê yên Kurdî ve hatine vexwendin, gelek berhemênen wan di şêwiran da hatine xwendin. Wexta ji alîyê komekê ve hatine vexwendin wan hemûyan jî bersivêن erênen dane, heke di nav muşkîleyeka girîng da nebûne tevlî şêwiran bûne.

73

Hemû nivîskar jî ji ber tevlîbûna şêwiran keyfxweşî û bextewarîya xwe dîyar dîkin. Ew vê yekê bo kesayetîya xwe û berhema xwe wekî qedirdayîn û rêzgirtin, danasîn her wiha wekî hewildan û xwedî-derketina ziman û berhemênen Kurdî dibînin. Bi dîtina wan ji ber ku ew ne komên homojen in bi gelek peyv, dîtin û ramanêñ cuda ve nêzikî bûyeran û berheman dibin. Lewma şêwirên xwendinê jî bi awa-yekî zindî berdewam dîkin. Di derbarê bandora komên xwendinê li ser edebîyata Kurdî da nivîskarêن Kurd dîyar dîkin ku weşanxane û nivîskar divê bala xwe bidin komên xwendinê yên Kurdî ka gelo bala xwendevanan bêhtir li ser çi ye (Bereh). Komên xwendinê rê li ber nivîskarêن Kurd vedikin ku ew li kîmasî û xeletîyêن xwe mikur werin (Roj, 01.10.2020). Ew li hember asîmîlasyonê berxwedanek in, ji bo baldarî û geşmayîna xwendin û nivîsandina bi Kurdî pir baş û erênen ne. Ew bêyî ku nûbûn, kevinbûna berhemê yan jî dîroka çapkirina wê binêrin wekî pirtûkeka herdemî pirtûkan dixwînin. Ev yek ji alîyê berhemdarîyê, herdemîbûna berhemênen edebî û hunerî ve bandor û encameka erênen ye (Zeraq, 01.10.2020). Komên xwendinê yên Kurdî li hember bisaftinê, helwêstek e. Wexta ew dixwînin û nêrînêñ xwe parve dîkin nivîskar jî kil û kîmasîyêñ xwe dibînin. Lê divê em ji serî da bipejirînin ku ew rexnegir nînin û ew wekî hewildanekê ne ku ji pêwistîyê derketîye. Ji ber vê yekê divê nivîskar û weşanxane piştgirîya wan bikin (Özmen, 01.10.2020). Ji bo normalîzekirina xwendin û nivîsandina Kurdî, zêdebûna komên xwendinê şert e. Bi rîya van koman xwîner hem bi wêrekî rexneyêñ xwe dîkin, hem berhem û nivîskarêن nû nas dîkin. Wan mîsyona xwe ya belavkirina xwendewarîya Kurdî/

kurmancî kêm zêde bi cih anîne (Şaybak, 24.10.2020).

Heke em di sêgoşeya berhem, nivîskar û xwînerî da li pêvajoya xwendinê binêrin di warê xwendinê da komên xwendinê cihekî girîng digirin û ew stûneke gelek xurt yê vê sêgoşeyê ne. Her endamek bi qasî xwendineka takekesî di nav komê da dibe xwedîyê xwendineka kolektif jî. Hebûna komên xwendinê bandoreka erênî li ser edebiyata Kurdî dike, heri wiha cidîyetekê dide nivîskar jî. Xebatêwan li cihekî dibe wekî kevneşopîyekê (Amîda, 14.10.2020). Herçend ku ew hinekî bi awayekî amatorî xebatên xwe dikin jî dîsa di navbera nivîskar û xwîneran da danûstandinê baş û bikêlk jî çêdibin. Lewma mirov dikare hebûna komên xwendinê yên Kurdî wekî kawdaneka xweş şîrove bike (Dilsoz, 01.10.2020).

Nivîskar li ser kemasî û xetereyê komên xwendinê yên Kurdî balê dikişinin ser çend mijaran. Yek ji gazinneyê nivîskaran li ser neweşandina encamên şewiran e. Li ser gelek berhemên wan şewir hatibin kirin jî ji ber ku ew nayêne weşandin nivîskar di derbarê pirtûka xwe yan jî nivîskarıya xwe da tiştekî hîn nabin. Lewma ew bala komên xwendinê dibin ser vê mijarê û dibêjin piştî şewiran divêt teqez fîkrêñ xwe wekî gotarekê binivîsin, tomor bikin û biweşînin. Heta komên xwendinê dikarin di bin sîwanekê da bêni nik hev, bi hevkârî kovarekî jî derxin. Gelek caran asta xwendina komên xwendinê dûrî analîza rexneyî ya akademîk û û di asta nirxandinê da ye. Lewma divê ev nirxandin ji qalibêndanasînê xelas bibin û ew bikarin bandorê li nivîskaran, weşanxaneyen bikin (Zeraq, 01.10.2020; Bereh, 16.10.2020). Endamên komên xwendinê zû diwestin û karê xwe ne bi dîsîplîn dikin. Ji ber ku gelek ji wan bêkar in ev yek motîvasyona wan kêm dike. Her ku diçe hejmarêñ pirtükêñ ew dixwînin zêde dibin û hêza wan ya kirîna pirtûkan kêm dibe lewma divêt ew bandorê li ser weşanxaneyen bikin da ku bişen muşkîleyen aborî çareser bikin (Bereh, 16.10.2020). Heke endamên komên xwendinê ji derveyî pîvanêñ rexneyazanîstî û bi têkilîyêñ şexsî berhemekê binirxînin, berhemê esas negirin ev dê encameka neyîm bi xwe ra bîne. Komên xwendinê divê bi wêrek bin, gotina xwe texsîr nekin. Heke pirtûk ji alîyê nivîskarekî/a Kurd ya/yê popûler ve hatibe nivîsandin jî divê dîsa ew bikarin rexneyen xwe bikin. Wexta ew pirtûkekê bo xwendinê dîyar dikin divê bi tenê pirtûkê esas bigirin ne nivîskarî. Wexta ev wiha nakin gelek caran berhemên serkeftî nayêne dîtin û xwendin (Roj, 01.10.2020; Dilsoz, 01.10.2020). Ew xebatên xwe bi awayekî biistîkrar nakin û biberdewam nîn in, hemû berpirsyarî bi taybet di ser pişa çend kesen sereke da ye. Herçend ku ew di navbera nivîskar û xwendevanan da navgîneka muhîm in dîsa jî piraniya wan di bin sîwaneka sazî û dezgehekê da cih nagirin. Bi însiyatîfa çend dilsozêñ zimanê Kurdî ev kom xebatên xwe berdewam dikin. Yek ji muşkîleya herî mezin ew e ku berhem ji aliyê gelek xwîneran ve nayê xwendin, dîsa jî di civînê da gelek kes cih digirin (Şaybak, 24.10.2020). Dema ku xwendin di edebiyatekê da rûnenê berî her tişti pirsgirêka wê edebiyatê çareser nabe. Nirxandinê wan bi tenê wekî nivîse tê qeyidkirin lê ew qeyidkirin jî li devereke pêsiya wê dixitime. Ji bo ku pêsiya edebiyatê vebe, edebiyat cirokekî ji xwe ra bibîne û tê da biherike hewceyî bi xwendineka xurt û teorîk heye. Heke di navbera komên xwendinê da têkilîyek bê avakirin dibe ku encameka erênî û balkêş derkeve holê (Amîda, 14.10.2020).

Nivîskar rexneyen komên xwendinê yên ku li berhema wan hatine kirin bi gelempêri bi erênî dibînin. Ew van rexneyan ji bo xwe wekî siûdekê dinirxînin. Ew dibêjin ku bi alîkarîya van rexneyan hay ji kemasîyê xwe bûne (Bereh, 16.10.2020). Van rexneyan rê li ber nivîskaran vekirîye ku ew di aso

û pencereyeka berfirehtir da li berhemên xwe û li nivîskarîya xwe binêrin û tê de kûrtir biçin (Zeraq, 01.10.2020). Bi alîkarîya van rexneyan kitekiten ku li pêş çavê nivîskaran winda bûne tê zelalkirin, piştre nivîskar dîsa li berhema xwe vedigere. Ev jî li ser nivîskarîya wan bandoreka ‘esasî û guherîner pêk tîne. Dema ew dest bi nivîsandina berhemeka nû dikin ev rexne bandorê li ser hûnandina berhemê û karakteran jî dike (Şaybak, 24.10.2020). Carinan rexneyen gelek çêker û palder li berheman tê kin. Lewma nivîskar jî guhê xwe dide rexneyan. Ji ber vê yekê nivîskar van rexneyan baldar û girîng dibîne (Dilsoz, 01.10.2020). Li hemberî van fikran, çawa ku nivîskarî cîhaneka takekesî ye, nivîskar bi serê xwe ye. Ew ne bi kartêkerîya der û doran yan jî pêşnîyazan lê ew bixwe rîyên nû vedike. Ev rastî jî dike ku em gumanê ji hizra “civateka baş ya wêjeyî di nav Kurdan da çêbûye” bikin (Özmen, 01.10.2020).

### 3. Bi Dîtina Weşanxaneyên Kurdî Komên Xwendinê yên Kurdî

Xwendin wekî xwînerî dîyardeya pirtûkê yan jî weşanê jî di nav xwe da dihewîne. Ji ber ku edebiyat wekî hunerekê tê xwendin yan jî nivîsandin bi giştî bi alîkarîya pirtûkan xwe digihîne cîhana xwînerî (Escarpit, 1992:20). Wekî her cure hilberînê di hilberîna edebî da jî mezaxtin bixwe parçeyeka pêvajoya hilberînê ye (Eagleton, 2004:111). Lé ev nayê wê wateyê ku em pirtûkê bi tenê wekî birese-reka bazirganîyê binirxînin (Escarpit, 1992:110). Ji ber ku tişa ku pênameya pirtûkê dike xwendin e. Wexta hewildanê xwîner û nivîskarî digihe hev ev biresera xeyalî û her wiha şenber derdikeve holê. (Ji Sartre vgz. Escarpit, 20). Lewma pirtûk wexta tê xwendin digihe wateya xwe ya esil. Ji ber vê yekê di navbera xwendinê yan ji li gor mijara xwe em bibêjin komên xwendinê û pirtûkan, her wiha weşanxaneyan jî têkilîyek heye. Di xebatê komên xwendinê da yek ji alîyên girîng weşanxane ne. Komên xwendinê yên Kurdî di bidestxistina pirtûkan da carinan rastûrast bi weşanxaneyan ra dikevin têkilîyê. Her wiha ev bazara danûstandina pirtûkan ya di navbera wan da tesîrî li ser weşanxaneyan dike. Ji ber vê yekê me bi 9 weşanxaneyen Kurdî ra derbarê têkilîya wan ligel komên xwendinê da hevpeyvîn kirin. Di bijartina weşanxaneyan da me pîvanê xwe li gor weşandina cureyên pirtûkan (edebiyata modern, folklor), weşanxaneyen ku ji zaraveyên cuda (kurmancî, zazakî) pirtûkan çap dikin, dîyar kir. Çend weşanxaneyan bersiva pirsên me nedan. Weşanxaneyen me ligel hevpeyvîn kirin ev in: Lîs, Dara/PirtukaKurdî, Na, Peywend/Lorya, Roşna, Wardoz, Sîtav.

75

Hemû weşanxane jî dîyar dikin ku komên xwendinê yên Kurdî li ser firotina pirtûkan bandoreka erênî dikin. Wexta ew pirtûka ku dê bê xwendin dîyar dikin li gor hejmara endamên komê di carekê da gelek pirtûkan dikirin. Ji ber ku komên xwendinê di derbarê şêwirê xwe da bi rîya medyaya civakî agahdarîyê dikin, wexta nivîskar jî tevlî şêwirê dibe ew jî alîkarîya wan dike, nûçe û danasîna şêwirê dike. Pişî şêwirê jî carinan komên xwendinê vídyoyên şêwiran parve dikin. Bi vê yekê ew pirtûk têbihîstîn û zanîn, kesên ku nexwendinê wê meraq dikin, dikirin û dixwînin. Weşanxaneyen Sîtav û Roşna dibêjin ku di firotina pirtûkên wan da gelek bandoreka berbiçav ya komên xwendinê çenebûye. Bi tenê carekê komên xwendinê ji wan pirtûk kirîne. Lé hemû weşanxane dîyar dikin ku ew pirtûkan erzantir difiroşin komên xwendinê û ji alîyê aborî ve alîkarîya wan dikin.

Têkilîya weşanxaneyen Lîs, Na, Peywend/Lorya, Dara/PirtukaKurdî ligel komên xwendinê baş e. Weşanxaneya Lîsê dîyar dike ku ji bo şêwiran komên xwendinê dikarin di mekanê bi navê *Wêjegeh Amed* da şêwirê xwe bikin û ew diwazin di vê yekê da alîkarîya wan bikin. Peywend/Lorya jî her

wiha dîyar dike ku komên xwendinê carinan li avahîya wan şêwirêن xwe dikan. Bi dîtina weşanxaneya Na heke komên xwendinê projeyêن xwe ligel wan parve bikin ew jî dixwazin piştgirîya wan bikin. Weşanxaneyêن Roşna, Wardoz û Sîtav dîyar dikan ku têkilîya wan ligel koman tune ye, ji bo têkilîdanînê wan bixwe hewil nedaye. Bi dîtina *Wardozê* ji ber ku pêşîya komên xwendinê bêhtir li edebîyata modern e têkilîyeka xurt di navbera wan da tune ye.

Li welatêن rojava gelek weşanxane ji bo komên xwendinê lîsteya pirtûkêن xwendinê amade dikan. Di vê mijarê da bi tenê Pirtukakurdi/Dara diyar dike ku ew xebateka wiha dikan. Lê ev xebat ji komên xwendinê zêdetir ji bo kesêن dûrî edebîyata Kurdî ne û nû dest bi xwendina Kurdî kirine, tê kirin. Ew wekî lîsteya 100 pirtûkêن herî zêde tê firotin amade dikan. Weşanxaneyêن Roşna û Na vê yekê wekî fikreka baş binirxînin jî ew balê dikişinin li ser bêistîkrarbûna komên xwendinê yên Kurdî, rêtjeya firotina pirtûkêن Kurdî û têkilîya vê yekê ligel komên xwendinê. Wardoz jî meyla komên xwendinê ya li ser edebîyata modern bi bîr tîne û vê meydarîyê wekî astengekê li pêşîya komên xwendinê, lîsteya pirtûkêن xwendinê dinirxîne.

Weşanxaneyêن Kurdî li ser alîyêن erêni û neyêni yên komên xwendinê, xetereyêن li pêşîya wan jî fikir, hişyarî û pêşnîyazên xwe vedibêjin. Bi dîtina *Lîsê* divê komên xwendinê xebatêن xwe berdewam bikin, bi tenê li ser xeletîyên madî yên pirtûkan nesekinin, li ser nirxandina berhemêن edebî hûr bibin. Weşanxaneyâ Na diyar dike ku divê komên xwendinê yên Kurdî di navbera weşanxane û nivîskaran da cudahîyê nekin, ji bilî yên popûler bi weşanxaneyê din ra jî têkilîyê deynin. Di nirxandina pirtûkan da dev ji klîşeyan berdin. Divê ew xwedî sazûmanekê bibin û bernameyeka wan hebe, pê ra bala raya giştî bikêşin li ser xwe. Wardoz jî bi heman awayî balê dikişîne ku divê komên xwendinê bişen xwe bigihînin hemû weşanxaneyan û pirtûkên curbicur, ew nekevin di bin bandora hin kes û kesikan da. Sîtav jî heman hişyarîyê dike, dibêje ku divê ew kom nebin komên hin weşanxane û nivîskaran. Pîvana wan ne li gor kes û weşanxaneyan lê divê li gor nirxandina berhemeka zanîstî bibe. Divê ew nirxandinê xwe bi tenê bi qadekê yan jî cureyeka edebî bi sînor nekin, bişen ji bilî roman û helbestan cureyêن din jî bixwînin. Di babetêن din da jî berheman binirxînin. Bi dîtina *Roşnayê* divê komên xwendinê wekî dînamîkê edebîyatê û aktuelkirina zimanî li xwe binêrin. Dara/Pirtukakurdi jî rexneyê li komên xwendinê dike ku ew xebatêن xwe bi awayekî profesyonel nakin, medyaya civakî baş bi kar nayînin. Divê ew xwe ji mantalîteya formalîbûnê dûr bixin, xwe bigihînin gelek kesan, hewil bidin kovarekê derxin, carinan lîsteyêن xwendinê biweşînin.

76

#### 4. Encam

Komên xwendinê yên Kurdî wekî çalakîyeka xwendinê di nav dîroka edebîyata Kurdî da êdî cihê xwe girtine. Mirov dikare bibêje gelek nivîskaren nifşê nû yên wekî Hasan İldiz, Burhan Tek, Tahir Taninha, Erol Şaybak, Înan Eroglu hwd. pêşiyê endamên komên xwendinê bûne. Li layê dî kovarêن wekî Wêje û Rexne, Zarema, Kund, Vejin, Laser jî ji alîyê endamên komên xwendinê ve hatine derxitin. Berdewamkirin yan jî xelasbûyîna xebatêن van koman girêdayî çend kartêkeran e. Me dît ku rewşa siyasî ya Kurdan wekî gelek regezên din bandor li ser komên xwendinê jî kirîye. Dema qedexeyêن li ser Kurdî rabûne ji nişkê ve gelek komên xwendinê hatine avakirin. Lê gava qedexe zêde bûne wan neşîyane xebatêن xwe berdewam bikin. Ligel vê yekê awayê rêxistinbûyîna komên xwendinê, daxwaz û motîvasyona xwendinê jî bandor li ser vê yekê kirîye

Yek ji hêza sereke ya van koman xwendekarêن zanîngehan e, gava ew mezûn dibin kesên têن cihê wan tijî nakin. Lewma heke ew bikarin li zanîngehan xwe di bin sîwanê komên xwendekaran da birêxistin bikin û bi awayekî fermî, bi alîkarîya ku zanîngeh li komên xwendekaran dike îstifade bikin ev yek dê li ser xebatêن wan bandoreka erêñî bike. Her wiha bi vî awayî xebatêن komên xwendinê yên li zanîngehan biîstîkrar berdewam bikin û bi pêş bikevin. Bêguman ev jî bi destûrdayîna rêveberîya zanîngehan pêkan e. Herçend meyildarîya komên xwendinê li ser romanê ye disa jî ji bo ku bikarin bi asoyeka berfirehtir rexne û nirxandinan bikin bi dîtina me divê ew ji cureyên dî yên edebî jî bixwînin, xwe bi sînordar nekin. Ew ne bi tenê bal bikêşin ser girîngîya rexneya edebî û zanîstî, hewil bidin sepandina wê li ser pirtûkan jî bikin. Lewma ji bo dagirtina valahîya qada rexneya edebî komên xwendinê wekî hêzeka sereke dikarin rola xwe bi cih bînin. Ji bo vê yekê jî teqez divê encamên şêwirê wan bêñ tomarkirin û parvekirin. Piştre nivîskarêن Kurd jî dikarin hîn bibin ka gelo komên xwendinê cawa li ser berhemêن wan sekinîne. Her wiha weşanxaneyêن Kurdî jî dikare bi vê yekê meyla xwînerêن Kurdî hîn bibin. Di bijartina weşana pirtûkan da xalêñ ku komên xwendinê dîyar kirine bizanin û li gor vê yekê pirtûkêñ xwe çap bikin.

Edebîyat bi lihevhatina sê hêmanêñ sereke; nivîskar, xwîner û berhemê têseyekî digire û bi pêş dikeve. Di edebîyata Kurdî da li salêñ dawîyê komên xwendinê hêdî hêdî wekî hêzeka sereke ya vê sêgoşeyê cihê xwe digirin. Kurdî bi awayekî fermî zimanê perwerdehîyê nîne, Kurd bi hewldanêñ xwe yên takekesî xwendin û nivîsandina Kurdî hîn dibin, pê ra berhemêñ edebî dinivîsinin. Lê dema ew berhem têñ xwendin ev pêvajo tewaw dibe. Lewma komên xwendinê yên Kurdî, li hember qedexeyêñ li ser Kurdî wekî çalakîyeka alternatif û dijberî otorîteyê xwedî roleka girîng in. Ji ber ku ew gazinda ku “Kurd bixwe berhemêñ xwe naxwînin” berafî dikin.

### Çavkanî

Álvarez, Carmen. Á. (2016). Book clubs: An Ethnographic Study of an Innovative Reading Practice in Spain.*Studies in Continuing Education*. Volume 38, Issue 2, 228-242.

Alver, K. (2012). “Edebîyata Giriş”, *Edebîyat Sosyolojisi İncelemeleri* Îçinde, Editör: Köksal Alver, 2. Baskı. Hece Yayınlari: Ankara, ss: 11-46.

Avcı, S.& Yüksel, A.& Akıncı, T.. (2010). Okuma Alışkanlığı Kazandırmada Etkili Bir Yöntem: Okuma Çemberi.Marmara Üniversitesi Atatürk Eğitim Fakültesi Eğitim Bilimleri Dergisi. Sayı: 32, 5-24.

Burnett, Gary. (2015). Online Book Clubs: An Overview and Proposal for Implementation. (Têketin: 22.09.2020).[https://www.academia.edu/28850165/Online\\_Book\\_Clubs\\_An\\_Overview\\_and\\_Proposal\\_for\\_Implementation](https://www.academia.edu/28850165/Online_Book_Clubs_An_Overview_and_Proposal_for_Implementation)

Clarke, R.& Nolan, M. (2014). Book Clubs and Reconciliation: A Pilot Study on Book Clubs Reading the Fictions of Reconciliation.*Australian Humanities Review*, (56), 121-40.

Daniels, H. (2002). *Literature Circles Voice and Choice in Book Clubs and Reading Groups* Second Edition, Stenhouse Publishers Portland: Maine.

Eagleton T. (2004). *Edebîyat Kuramı*, Cev. Tuncay Birkan, 2. Baskı. Ayrıntı Yayınlari: İstanbul.

\_\_\_\_\_ , (2012). *Edebîyat Olayı*, Cev. Başak Yüce, Sel Yayıncılık: İstanbul.

- Escarpit, R. (1992). *Edebiyat Sosyolojisi*, Çev. Hüseyin Portakal, İletişim Yayıncıları: İstanbul.
- Goldmann, L. (2005). *Roman Sosyolojisi*, Çev. Ayberk Erkay, Birleşik Yayınevi: Ankara.
- Peplow, D. (2016). *Talk About Books A Study of Reading Groups*. London & New York: Bloomsbury Academic.
- Procter, J. & Benwell, B. (2015). *New Directions in Book History. (Reading Across Worlds-Transnational Book Groups and the Reception of Difference)*. United Kingdom: Palgrave Macmillan.
- Swann, J. & Allington, D. (2009). Reading Groups and The Language of Literary Texts: A Case Study in Social Reading. *Language and Literature*, 18: 247-265.
- Hhevpeyvînê Ligel Komên Xwendinê Hatine Kirin
- Akboğa, H. Koma Xwendinê ya Mela Mehmûdê Bazîdî, Dîroka Hhevpeyvînê: 16.10.2020
- Aksu, A. Koma Xwendinê ya Mersînê, Dîroka Hhevpeyvînê: 07.10.2020
- Arjen, S. Koma Xwendinê ya Cizîra Botan, Dîroka Hhevpeyvînê: 11.11.2020
- Baran, S. Koma Xwendinê ya Weqfa Îsmaîl Beşîkçiyê, Dîroka Hhevpeyvînê: 12.10.2020
- Ceylan, M. Koma Xwendinê ya Zankoya Mûşê, Dîroka Hhevpeyvînê: 28.09.2020
- Hedilî, K. Simo. Koma Helbestê ya Stockholmê û Koma Nirxandina Wêjeyê, Dîroka Hhevpeyvînê: 02.10.2020
- Kanî, A. Koma Xwendinê ya Diyarbekirê, Dîroka Hhevpeyvînê: 05.10.2020
- Kiye, H. Koma xwendinê ya Mestûre Erdelanî, Dîroka Hhevpeyvînê: 08.10.2020
- Janzêm, Ş. Koma Xwendinê ya Vejînê, Dîroka Hhevpeyvînê: 07.10.2020
- Metîna, R. & Endez, B. Koma Helbestê ya Amedê, Dîroka Hhevpeyvînê: 15.10.2020
- Rûbar, F. Koma Xwendinê Ya Batmanê (II), Dîroka Hhevpeyvînê: 03.10.2020
- Serhedî, S. Koma Xwendinê Ya Wanê, Dîroka Hhevpeyvînê: 02.11.2020
- Seyarî, A. Koma Xwendinê ya Berken Bereh, Dîroka Hhevpeyvînê: 03.10.2020
- Şahîn, F. Klûba Wêje û Xwendinê ya Dîlokê, Dîroka Hhevpeyvînê: 11.10.2020
- Şâşmaz, S. Koma Xwendinê ya Amedê, Dîroka Hhevpeyvînê: 01.10.2020
- Şev, S. Koma Xwendinê ya Eğitim-Senê, Dîroka Hhevpeyvînê: 02.10.2020
- Şêxo, E. Koma Sormeyê ya Xwendinê, Dîroka Hhevpeyvînê: 02.10.2020
- Tek, B. Koma Xwendinê a Qoserê, Dîroka Hhevpeyvînê: 20.10.2020
- Tirpan, W. Koma Xwendinê ya Batmanê (I), Dîroka Hhevpeyvînê: 22.10.2020
- Toprak, O. Koma Xwendinê ya Celadet Alî Bedirxan, Dîroka Hhevpeyvînê: 28.09.2020
- Xerzî, B. Koma Xwendinê ya Ferzad Kemanger, Dîroka Hhevpeyvînê: 09.11.2020
- Yildiz, D. Aydin. Koma Xwendinê ya Çewlîgê, Dîroka Hhevpeyvînê: 27.10.2020
- Zêdo, Ç. Şêwira Xwendina Edebiyata Kurdî (Şêwira Xwendinê), Dîroka Hhevpeyvînê: 01.10.2020
- Hhevpeyvînê Ligel Nivîskaran Hatine Kirin
- Amîda, Î. Dîroka Hhevpeyvînê: 14.10.2020

- Bereh, B. Dîroka Hevpeyvînê: 16.10.2020  
Dilsoz, O. Dîroka Hevpeyvînê: 01.10.2020  
Özmen, Ş. Dîroka Hevpeyvînê: 01.10.2020  
Roj, C. Dîroka Hevpeyvînê: 01.10.2020  
Şaybak, E. Dîroka Hevpeyvînê: 24.10.2020  
Zeraq, D. Dîroka Hevpeyvînê: 01.10.2020  
Hevpeyvînê Ligel Weşanxaneyan Hatine Kirin  
Barî, B. Weşanxaneya Na, Dîroka Hevpeyvînê: 01.10.2020  
Bateyî, Q. Weşanxaneya Sítav, Dîroka Hevpeyvînê: 29.10.2020  
Berşev, B. Weşanxaneya Dara/PirtukaKurdî, Dîroka Hevpeyvînê: 13.10.2020  
Biliz, M. Weşanxaneya Wardoz, Dîroka Hevpeyvînê: 21.10.2020  
Lezgîn, R. Weşanxaneya Roşna, Dîroka Hevpeyvînê: 01.10.2020  
Mîrza, Î. Weşanxaneya Peywend/Lorya, Dîroka Hevpeyvînê: 12.10.2020  
Semed, X. Weşanxaneya Lîs, Dîroka Hevpeyvînê: 01.11.2020



Yıldız, A. (2021). Ehmedê Xasî, Berhemên Wî û Kesayetiya Wî ya Edebî, The Journal of Mesopotamian Studies, 6 (1), 81-96 DOI: 10.35859/jms.2021.826060

#### MAKALE BİLGİSİ/ARTICLE INFO

Article Type/Makale Türü: Research Article /  
Araştırma Makalesi  
Received / Makale Geliş Tarihi: 14.11.2020  
Accepted / Makale Kabul Tarihi: 21.03.2021  
Doi: 10.35859/jms.2021.826060

# EHMEDÊ XASÎ, BERHEMÊN WÎ Û KESAYETÎYA WÎ YA EDEBÎ

Ayhan YILDIZ

Mardin Artuklu Üniversitesi, Kürt Dili ve Kültürü ABD, ayhanmeretowar21@gmail.com,  
<https://orcid.org/0000-0002-8763-4182>

#### KURTE

Alimê serdema Dewleta Osmanî Xasî, wekî ronakbîrekî Dîyarbekirê, bi edebîyat û îlmê Îslâmî re meşxûl bûye. Digel tehsîla îlmên klasîk ên medreseyêن serdema xwe, ew bi îlmê tesewwuf, fiqh, û kelamê re jî eleqedar bûye. Wî di biwarê kelam û edebîyatê de hem berhem dane hem jî li pêşberî rûdanêن civakî-siyasî reftar û helwesta xwe nîşan daye. Xasî wekî helwesteke bertekî, li hember rûdanên dewrê, dev ji wezîfeya xwe ya fermî berdaye û kesayetîyeke azad tercîh kirîye. Ji ber vê, rayedarêن wê serdemê, tehde lê kirine, ew sirgûn û zindanî kirîye. Ew bi vê xweragirtinê gîhaşîye asta muderristî, muftîtiyê, nivîskarîya îlmê kelamê û di qada tesewwufê de derketîye payeya xelifetîyê. Wekî edîbekî kurmanc û dimbilîyan, wî mesnewîyeke *Mewlidê*, bi kirmancî/zazayî, mulemme‘eke pênczimanî û çend helbestê din bi kurmancî, erebî, tirkî û farisî hûnane. Digel van, wî çend berhemên îlmî-kelamî bi zimanê erebî hûnaye. Li hember bîr û boçûnêñ dijberî Ehlê Sunnetê, wekî alimekî Eş’erî, wî bi berhemên xwe bi awayê çalak eqîdeya Îslamî parastîye. Şexsîyetekê wiha binavûdeng ku li herêma kurmanc û

dimbilîyan bûye xwedan pile û payeyeke bala û kesayetîyeke wiha mezin û girîng, bi qenaeta me hîna jî bi awayê ku heq bike nehatîye naskirin. Me nîyet bi vê lêkolînê, hîn baştir danasîna wî ye. Heta nuha hin xebat û lêkolîn li ser Xasî hatine kirin; bes me xwest em çend alîyên wî yênc cîyawaztir derxînin pêş û li ser binemal, jîyan, berhem, kesayetiya wî ya edebî û helwesta wî ya alimane lêkolîn bikin.

**Peyvîn Sereke:** Xasî, fiqh, kelam, edebîyat, rewşenbîr, zazakî

#### **Ahmedê Xasî, Eserleri ve Edebi Kişiliği**

#### **ÖZ**

Osmanlı dönemi alimi Xasî, bir Diyarbakır aydını olarak edebiyat ve İslami ilimlerle uğraşmıştır. Dönemindeki klasik medrese ilminin yanı sıra tasavvuf ilmi, İslam hukuku ve kelam ilmiyle de ilgilenmiştir. O bu alanda eser verdiği gibi, döneminin toplumsal ve siyasi olaylarına karşı da alimane bir tavır ve duruş sergilemiştir. Xasî, dönemin gelişmelerine karşı bir tavır olarak resmi görevinden istifa etmiş, özgür bir şahsiyet olarak kalmıştır. Bu yüzden o dönemdeki yöneticiler ona eziyet etmiş, onu sürmüş ve zindana atmıştır. O bu duruşyla müderrislik, müftülük, kelam ilmi yazarı derecesine ulaşmış, tasavvuf alanında da halifelik seviyesine yükselmiştir. Bir Kurmanc ve Dimbilî edibi olarak bir Zazaca *Mevlit* mesnevisinin yanı sıra, beş dilli bir mulemma, birkaç Kurmancca, Arapça, Türkçe ve Farsça şiir yazmıştır. Ayrıca o, kelamî-ilmi birkaç eser de Arapça yazmıştır. O, Ehl-i Sunnête karşı sergilenen karşı görüş ve düşüncelere, bir Eş'ari alimi olarak eserleriyle İslami Akideyi aktif şekilde savunmuştur. Kurmanc ve Dimbilîlerin bölgesinde yüksek makam ve mertebelere yükselen böylesi ünlü, büyük ve önemli bir şahsiyet, kanaatimize hala hakkettiği ölçüde tanıtılmamıştır. Bu araştırmayla niyetimiz onu daha da iyi tanıtmaktır. Şimdiye kadar Xasî üzerine bazı çalışma ve araştırmalar yapılmıştır; ancak biz onun daha farklı birkaç yönünü öne çıkaralım, onun aile geçmişi, yaşamı, eserleri, edebî kişiliği ve alimane tavır ve duruşunun araştırmak istedik.

82

**Anahtar Sözcükler:** Xasî, Fiqih, Kelam, Edebiyat, Aydın, Zazakî

#### **Ahmed Xasî , His Works and Literary Identity**

#### **ABSTRACT**

The Ottoman-period scholar Xasî, as an intellectual of Diyarbakir, was engaged in Islamic literature and science. In addition to studying the classical sciences of the madrasas of his time, he was also interested in the sciences of tasawwuf, fiqh, and theology. He has produced works in the field of theology and literature, and showed his attitude and position towards socio-political events. Xasî has resigned from his official position as a reactionary attitude towards the events of the period and has preferred a free personality. Therefore, the authorities of the time mentioned, put pressure on him, exiled and imprisoned him. With this self-sacrifice, he reached the level of muderis (educator), mufti, and theologian and became a caliph in the field of Sufism. As a Kurmanji and Dimbilian author, he wrote a Mewlid, in Kirmanji/Zazaki, a five-language mulemma, and several other poems in Kurmanji, Arabic, Turkish, and Persian. In addition, he has produced several scientific-theological works in Arabic. Against the views and opinions of the Sunnis, as an Ash'ari scholar, he has actively defended the Islamic faith with his works. Such a well-known personality, who has had such a high and important level of attention

and personality in the Kurmanji and Dimbili region, is still not recognized in our opinion as a way to deserve it. Our intention with this study is to better introduce him. So far some work and research has been done on Xasî; we just wanted to highlight some of his different aspects and study his background, life, works, his literary personality and his scholarly attitude.

**Keywords:** Xasî, Fiqh, Theology, Literature, Intellectual, Zazaki

#### Extended Summary

Xasî (1864-1951) is originally a nobleman of the Dimbili dynasty. In his time, he had a good education of the madrasas of Diyarbakir. During his youth (1900) the Kurmanji and Dimbil nobles started patriotic movements, formed associations and he assisted and joined them. There have indeed been many great social and political events in his time. The Kurds' appearances are linked to the Ottoman Islamic caliphate. In 1900, a group called the Kurdistan Azm-i Kavi Cemiyeti (foundation) was founded, and Xasî was one of its founders at the age of 36. During his lifetime (when he was 44 years old) the authorities of the Ottoman state in 1908 announced Constitution II. and the election process begins. Xasî would then, as a great scholar and scholar of the region and the Ottomans, verbally and behaviourally criticize certain movements and behaviours of the Unionists. Following the election of the Union and Progress Party cadres and the beginning of politics in the Meb'usan (parliaments) Assembly, their officials, Xasî, along with some prominent opposition figures and leaders of the region, were exiled to Rhodes Island in 1909. Xasî sends a letter to the Ottoman sultan two years later and the sultan visits him. After a great deal of experience in the presence of Shaykh al-Islam in the state he succeeds and the sultan leaves him and his free friends with gifts. Xasî returns to Diyarbakir. Xasî started to be a manager in the centre of Diyarbakir during these years. In 1918, Xasî became the mufti of Lice. In the World War I, the Ottoman Empire collapses, Western Anatolia is occupied, and the Turkish National Liberation War begins. Kuvay-i Milliye starts the War of National Liberation against the Western occupiers and Xasî, along with the muftis of his time, supports this movement with the fatwa of Ankara (1920). After the Anatolian National War, politicians established a new republic (1923) and a year later (1924) removed the Caliphate from politics. Xasî resigned from the official mufti in the same year in opposition to the removal of the Caliphate.

83

Xasî writes literary and scientific works in the form of text and poems. The language of his works is generally Arabic, his Mewlid is in Zazaki language, his works related to belief and theology and his criticism (hicwiye) poetry are in Arabic, his poetry is in Turkish, his murabbiyyah, his hymn and his hijwiyyah are in Kurmanji. His poetry is in five languages: Arabic, Persian, Turkish, Kurmanji and Zaza. Most of his works remained as manuscripts and were distributed only among the sheikhs and madrasa scholars. Mewlid is not among his other unpublished works and some of them have not yet been found as well.

In this work, the family, biography, works and literary, scientific and Sufi personality of Mela Ahmad Xasî have been studied. His relationship with the patriotic Kurmanji and Dimbili nobles of the region, the appearances of the allied allies of the region, the Ottoman authorities of the region and the sultans of Istanbul have been studied.

## Destpêk

Di edebiyata zazakî de nivîskar û şairê yekem ku berhemên wî bi zimanê erebî, tirkî, kurmancî û kirmancî hatine belavkirin, Mela Ehmedê Xasî (1864-1951) ye ku wekî ronakbîr û alimekî muxalif ê serdema osmanî û komara nû jîyaye. Çawa ku wî di biwarê zanista İslâmî ya kelamê de reddîyye û berhemên menzûm hûnaye, di biwarê edebiyata klasik de jî berhem nivîsîne. Xasî di serdema osmanî de muderristîya medreseyâ Diyarbekirê kirîye û digel ku wezîfeya muftîtyê di serdema ewil a Komara Tırkiyeyê de ifa kirîye jî, wî ji bo xatîre nêrîn, raman û bawerîyên xwe yên dijber û qedir û qîmeteke payeberz a nava gelê xwe, li ser hemd û hişê xwe, dest ji muftîtyâ fermî vekêşaye û wekî alimekî herêmê, bi hişmendîyeke azad berdewamî daye kar û barêna xwe yên ilmî û entelektuelî. Wî bîrûboçûnên xwe hem bi awayê nivîskî hem jî bi awayê devkî li pêşberî rûdan û dîyardeyê serdema xwe derbirîne. Bi vî awayî wî hem bala kesayetên heremê hem jî yên navendî kêşaye. Ev reftar û helwesta wî ya wê hingê zû bi zû, ne di nav alim û edîbên herêmê de, ne jî di nav zanyarê osmanî yên serdemê de dihê dîtin.

Herçiqas li ser Xasî çend lêkolînên zanistî hatine kirin jî<sup>1</sup> alîyê alîmî, hîna jî li gor asta pêwist baş nehaflîye dayîn. Çawa ku Xasî karîye di pileya edebiyata klasik de berhemekê menzûm a mîna *Mewlidî* bi zimanê xwe yê maderî kirmancî/zazayî bihûne, wî herwisa karîye bi rehetî di warê ilmî de bi zimanê erebî, farisî, kurmancî û osmanî/tirkî jî berhemên edebî û zanistî jî binivîse. Honrawa wî ya *mulemmayî*<sup>2</sup>, delîl wê behremendîya wî ye ku karîye digel kirmancî û kurmancî, bi erebî, farisî û tirkî jî bîrûrayênen xwe bi teşeyê nezmî bihûne. Menzûme, reddîye û qesîdeyê wî yên bi erebî, delîl hostetîya wî ya zimanê fexrî yê erebî ye ku wê hingê erebî, di nav alîmîn medreseyan de zimanê ilmî. Helbesta wî ya bi zimanê tirkî, digel şarezatîya wî ya ilmî İslâmî, nîşaneyâ ilmî wî yê edebî ye jî ku wî ew bi kîşa kîteyî û bi zimanekî zelal hûnaye. Xasî çawa ku pisporîya xwe di ilmî kelamê de bi van menzûmeyen xwe nîşan daye, wî şarezatîya xwe ya di warê edebîyatê de jî bi menzûmeyâ xwe ya kurmancî ku di teşe û dirûvî destanê de hûnaye û bi helbesta xwe ya dîdaktîk a bi zimanê tirkî nîşan daye. Bi vî awayî qenaet çê dibe ku cîyê Xasî di edebiyata erebî, farisî, tirkî, kurmancî û kirmancî de divê bihe tesbîtkirin û heqqê wî yê edebî-hunerî, di xebatê antolojîyan de bihe dayîn.

Menzûmeyâ wî ya bi erebî ya bi navê *Buşrê'l-İbad fî 'Îlmi'l-İtîqad* [Mizgîniya Ebdan di Zanista Bawerîyê de], ya bi navê *Esmaullahi'l-Husna*, her du *Reddiyeyen* wî yên kelamî/eqîdeyî yên ku teşeyen wan ên edebî pexşanî û nezmî ne, *Xezela Tirkî*, *Xezela Mulemme'i*, *Murebbe'a Kurmancî*, *Mehdhîye û Destana Kurmancî* ku heta niha zêde kesî behsa wan nekirîye, bi vê xebatê dê cara ewil bibin mijara lêkolînan. Ev hêlên vê xebatê, bi van alîyên xwe yên nû, dibe ku di biwarê edîbî, rewşenbîrî û alîmîya Xasî de derîyen nû li ber cîhana ilim û edebiyata kirmancî, kurmancî û İslâmî veke. Bi taybetî di biwarê dîroka İlîmê Kelama İslâmî û Usûla Dîn de dibe ku cirayekte din jî vêkeve û alîmîn vê qadê, ji nêrîn û şiroveyen Xasî yên di vê biwarê de mifa werbigirin. Ji ber van hêl û alîyên xwe yên edebî, ramanî û ilmî, li gor qenaeta me ev mijar girîng e û hêjayî lêkolînê ye.

- 1 Ahmet Erkol ku li ser berhemâ Xasî ya bi navê *Kitabu'l-Tsđid bi Şerhi Muhteseri'l-Tewhîd*, teblîxek bi navê "Seyda Ahmed el-Hassi ve Kitabu't-Tsđid bi Şerhi Muhtaseri't-Tevhid İslîmlî Eseri" di sempozyuma bi navê Dünden Bugüne Lice 05-06 Eylül 2008), İbrahim Dağılma ya bi navê "Ahmedê Xasî'nin Hayati ve Mevlid Adlı Eserinde Tema" ku kovara *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi* sala 2015.
- 2 Bêjeya mulemmî'ê, li gor ferhengê tiştê rewneqdar/ronîdar e. Navê wê helbestê ye ku di edebiyata berê ya fars û tîrkan da bi zimanên cîya cîya hatîye gotin. Di farisî da bêjeya mulemmî' li gor ferhengê tê wateya roşenkirî, rengarengî û parçedarîya rengo rengo (İskender, Pala, Kurtuluş, "Mûlementa" DîA, XXXI, Diyanet İşleri Vakfı, Ankara, 2006, r. 539).

Heta niha destxeta *Kitaba Busrê'l-Îbad fi 'Îlmi'l-Itîqad, Esmaullahi'l-Husna, Reddiye Xezela Tirkî, Xezela Mulemme* iû Mewlid ku Zeynelabidîn Amedî di sala 1406ê hicrî (Miladi 1986) îstînsax kirîye û Muhemmed Mehfûz Ozdemîr xwedîyê el-Mektebetu'l-İslamiyye, li Diyarbekirê ew bi awayê destxet wekî mecmû'eyekê çap kirîye û *Murebbe'a* wî ya ku Mela Ehmed Hilmî Qoxî ed-Diyarbekirî di sala 1991ê de ew di mecmû'eya ya bi navê *Dîwana Cami'* de bi cih kirîye bi destê me ket. Ji ber ku li ser menzûmeye *Mewlidê* bi gelek awayan xebat hatine kîrin, me ew li derî vê xebatê hişt. Berhema bi navê *Mewlidê Nebî* ya ku Mihânî ji tîpên erebî ew transkrîpeyî tîpên latînî kirîye û sala 1994an çap kirîye jî wekî çavkanîyekê li ber destê me bû. Teblîxa Ahmet Erkol ku wî li ser berhema Xasî *Kitâbu'l-Tesdîd bi Şerhi Muxteseri'l-Tewhîd* di sempozyuma bi navê *Dünden Bugüne Lice* de pêşkêş kîribû û gotara İ. Dağılma "Ahmedê Xasî'nin Hayati ve Mevlid Adlı Eserinde Tema" weşandibû bi kêrî vê xebatê hatîye. Ji bilî van referans û çavkanîyên nivîskî, me xebata qadê jî pêk anî û ji çavkanîyekê zindî Mela Mihemedê Hezanî hin agadarîyên têkildarî Xasî wergirtin. Gotar li ser bîyografi, berhem û kesayefîya îlmî-edebî ya Xasî ye. Pişti ku hin dane li ser mijarê raxistin, li ser wan analîz hatîye kîrin û encamên wê hatine dîyarkirin.

## 1. JÎNEGARÎYA XASÎ

Ehmedê Xasî di 29ê Nîsana sala 1864ê mîladî de, li nehîyeya Hezana (Kayacık) Licê ya Diyarbekirê hatîye dinê. Navê wî Ehmedê el-Xasî; nasnavê wî Xasî ye. Wî di Medreseya Mesûdiyyeyê de pişti tehsîla 12 iliman di heman medreseyê de muderrisî kirîye. Xasî, di 1ê Rebîulewwela 1320î (mîladî 1902) de îcazeya xwe ji destê muftîyê Diyarbekirê el-Hec Îbrahîm Efendî wergirtîye.<sup>3</sup> Wî di sala 1316an (mîladî 1898) serî li Mearif Nezaret-i Celile [Wezîriyya Karûbarê Perwerdeyê] daye û xwestîye ku Mewlîda Şerîf tefsîr û tercemeyle zimanê zazakî bike. Vê dezgîhê izina wî daye û wî ev berhem bi awayê nezmî amade kirîye û di Diyarbakir Matbaasi de çap kirîye. Heta sala 1330 (mîladî 1912) yî memûrtî kirîye û di Hezîrana heman salê de dewlet wî tayînî ecemîtîya muderristîya navenda Diyarbekirê kirîye. Salek peyre (1331/1913) di meha Temmûzî de dewlet tayîna wî derdixe qeryeya Hezana Licê (Korkusuz, 1996: 21). Pişti ku ew çendakî vê wezîfeya xwe dike, ica wî wekî muftîyê Licê tayîn dikin. Pişti ku rêvebirê komara nû saziya xelîfetîye radikin, Xasî ji wezîfeya xwe ya muftîtîye istîfa dike. Mela Ehmed Xasî, di 18ê Sîbata sala 1951ê de li Hezanê wefat kirîye. (Erkol, 2008: 346). Zemanê ku Xasî muftîyê Licê ye, muftîyê Ankarayê û Reîsê Ankara Müdafaa-i Hukuk Cemiyeti Mehmet Rifat Efendi (Börekçi), serokatîya heyeteke aliman dike û di 14ê Nîsana 1920î de fetwayeke bi navê *Ankara Fetvası* ilan dike û piştevanîya Kuvayî Millîye ya Anadoluyê dike. Digel 152 muftîyan Xasî jî bi navê "Lice Müftüsü Ahmed" imzeya xwe avêtîye bin vê fitwayê (Sarıköyuncu, 2020: 208). Rojnameyên piştevan ên Millî Mücadeleyê *Îrade-i Millîye*,<sup>4</sup> Öğüt û Açıksözé de ev fitwa di 19-22yê Nîsana 1920î de weşandîye.

### 1.1. Binemala Xasî

Xasî bi eslê xwe ji eşîra Ziktê, ji gundê Şîncê ye. Kalikê wî Mela Usman hatîye Hezanê, melatî

3 Ji bo fotokopîya îcazeta wî bnr. Şefik Korkusuz, *Arşiv Belgelerinde Son Devir Diyarbekir Uleması*, Melisa Matbaası, İstanbul, 1996, r. 24.

4 Ji bo agadarîyên têkildarî vê rojnameyê bnr. Fatih M. Dervişoğlu, "Millî Mücadele Döneminde Basın ve Îrade-i Millîye Gazetesi", *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi The Journal of International Social Research*, volum 2/6, winter 2009.

kirîye û êdî li wir maye. Ji ber ku xelkê zemanê berê, qebileya wan wekî ebdên xas ên Xwedê hesibandîye, Mela Ehmed jî bi navê Xasî hatîye bileyekirin (Lezgîn, 2013: 4). Heta şes bavan silsileya bav û kalên Xasî dîyar e. Ehmed kurê Hesen kurê Usman ew jî dîsa kurê Usman kurê Umer kurê Ehmed Xan ew jî kurê Îsa Xan e (Amedî, 1406: 1). Gava em li gor vê agahîyê bidin ser şopa malbata Xasî, em dibînin ku ew ji malbateke “xan”edan û malmezin a dimbilîyan<sup>5</sup> tê: “Ehmed Xan” û “Îsa Xan”. Di bavê pêncan de navê kalê wî Ehmed Xan e û navê kalê wî di rêza şesan de Îsa Xan e. Meriv nava her bavekî 30 sal muddet bide, bi ihtîmaleke mezin ev xanedanî, diçe digihîje salên 1740i. Îca wê hingê jî ihtîmal heye ku Xasî ji binemala mezin a Mîrên Dumbilî be.<sup>6</sup>

Nesebê mîrên dunbuliyan li gor rîwayetekê ji erebêن Şamê digihîje şexsekî bi navê Îsa; li gor rîwayetekê din digihîje Cezîreya Umerî. Îsa Begê, di wextê padışahêن berê de li Azerbeycanê nehîyeya Sekmenabadê bi rîya ocaxê ji xwe re kirîye war û wargeh. Her roja ku dihat, xelk li dora wî hîn zêde civîyane. Mîrên eşîra dunbulî, zemanê berê li ser eqîdeya Êzîditîyê bûne. Peyre wan bi Îsa Begê nav û deng vedaye û hinekan ji wan daye ser rîya Ehlê Sunnet û Cemaetê. Li gor rîwayeta herî sehîh eşireta dunbulî, ji Botan hatîye û kurdan di nav xwe de ji wan re gotîye Dunbulê Botî. Ji zarokêن Îsa Begê Ahmed Beg, di zemanê akkoyunîyan de derketîye pile, paye û meqâmên bala. Wî, Keleha Yay û wilayeta Hekarîyê girtîye bin destê xwe. Zemanekî dûredirêj wî hakimîya Keleha Yayê kirîye. Zemanê ku diçe rehmetê, bi navê Şêx İbrahimî û Şêx Behlûl, du kurên wî hebûne. Şêx Behlûl piştî wefata bavê xwe li cîyê wî rûdine. Şêx Behlûl jî bi navê Cemşîd, Mehmûd, Xalîqwerdî, Hecî, Ahmed, Îsmaîl û Ce‘fer heft law li pey xwe hiştine. Hecî Beg ketîye bin asitaneya Şah Tahmasb, Şah jî Sekmenabad, welatê Xoyê xistîye bin zimmeta wî û bi leqebeh Hecî Sultan hatîye naskirin. Wî jî Wan û Serhed zebit kirine ew xistine bin sîyaneta xwe. Kurdêñ sehranişîn/çolnişîn ku dêwayînî bûn, hatin ketin bajarê Xoyê (Han, 2016: 209-211). Ji van agehîyêñ dîrokî yên Şerefnameyê wisa xuya dibe, ihtîmal heye ku neseba Mela Ehmedê Xasî bigihîje mîrên dunbuliyan.

Li gor Îbn Bezzaz, bav û kalên kurdêñ Şêx Safîyu’ñ-Dîn, Fîrûz Şah Zerrîn-Kulah, di sedsala 10an de digel klanekî mezin ê kurd, koçî herêma Sincar a Sûrîyeya iro kiribû. Ev klan ku bi ihtîmaleke mezin dimilî ye, li herêma çiyayîn a nêzî Erdebîlê ku li hêla başûr-rojavayê Behra Xezerê dimîne bi cih bûbû. Ev koça ha, dibe ku koça dawîn a klanêñ kurd be ku di Çaxa Navîn de malmezinêñ klan û xanedanêñ kurd ber bi vê herêmê ve çûne. Safîyu’ñ-Dîn, mîna piranîya kurdan ku iro jî wisan dijîn, li Erdebîlê li ser şop û rîya muslimîya Şaffîitîya Sunnî meşîya û wekî merivekî qenc û pîroz ê muslim jîya. Çend helbestêñ ku wî hûnane gîhaştine roja me. Zimanê helbestêñ wî, ji kurdîya kurmancî ya ku li herêma Sincarê serdest e zêdetir, dirûvdarê dimilî ye. Iro jî komeke hindik a klaneke dumbilî li

<sup>5</sup> Bêjeya “dimilî” bi awayê “dimbili”, “dunbul”, “dumbul” û “dinbulî” hatîye qeydkirin. Bi ihtîmaleke mezin divê eslê wê “dunbulî” be. Çunki bêjeya “dunbulî” dibe ku rastî rûdanekî nedengdêran hatîbe û veguzibe bêjeya “dimbill”. Çawa ku gramera tirkî de jî pisporê dengnasiyê Sür Eker (2015) amaje pê dike, gava nedengdara “n” di heman bêjeyê de li kîleka nedengdêra “b”yê cih digire, rastî dirûvdarbûnê tê. Çunki di dengnasiyê de heye ku dengen nedengdêr [n] û [b] di nav bêjeyekê de gava li rû hev cih bigirin û dengê [b]yê, piştî dengê [n]yê bihe, nedengdêra [n]yê vediguheze nedengdêra lêvî [m]yê. Çunki hem dengê [b]yê, hem jî yê [m]yê lêvî ne. Meriv dikare navê “pevguherîna nedengdêran” li vê rûdana dengan dêne. Çend mînakîn din vê rûdanê hene: penbu > pembe, penbe > simbil > simbil. (Ji bo agadarıyêñ zêdetir ën têkildarî mijarê bnr.: Sür Eker, “Ses Bilgisi” *Türk Dili I*, (Edt. Muhsin Macit & Üveysi Serap Cawkaytar), Anadolu Üniversitesi Yayımları, Eskisehir, 2015, r. 84.)

<sup>6</sup> Navê mîrekftîya Dunbuliyan di çavkanîyêñ dîroka kurd û Kurdistanê de bi berfirehî cih digire. Dr. Frech jî di kitêba xwe ya têkildarî kurdan de behsa vê mîrekftîyê dike. Di kitêba bi navê *Asaru Şî’etu l-E-mmâtiyye* de bi berfirehî hatîye qedykirin ku mîrê ewil ê Xanedana Denabile, Mîr Tahirê kurê Îsa ye. Li gor agahîyêñ kitêba bi navê *Ensabu l-Ekrad* eslê vê xanedanê, diçe digihîje Mermekan. (M. E. Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, Avesta, İstanbul, 2012, r. 524-525.).

herêma Sincar a çiyayêne Sûrîyeyê dijî. Elewîtîya Xanedanîya Sefewî, hîna berî derkeve mertebeya qiraltîyê, ji Sunnitîya kurmancan zêdetir, nêzî Elewîtîya dimbilîyan e (Izady, 2007: 113-114).

### 1.2. Tehsîla Wî

Ehmedê Xasî, li cem bavê xwe Mela Hesen dest bi xwendina îlmî dike, peyre li Hezanê li cem Mustefa Xetîb berdewamî dike. Pişti ku li gelek deverên welêt ên xwendinê ji bo tehsîlê digere, li Diyarbekirê, li cem Hecî İbrahim Efendi ku müftîyê Diyarbekirê û muderrisê Medreseya Mesûdiye ya Camîya Mezin a Diyarbekirê bû, pişti tehsîla 12 îlman ïcازeya xwe di sala 1320 (8 Hezîran 1902) de digire (Mihanî, 1994: 5). Serê sedsala bîstî ye û hîna pergala Dewleta Osmanî berdewam dike. Di vê serdemê de li navenda Diyarbekirê, ji destê alîmekî mîna el-Hec İbrahim Efendi ïcازetgirtina Xasî, nîşana wê yekê ye ku di îlmîn Îslâmî yên mîna kelam, fiqh, hedîs, tefsîr û gramera erebî de gihaştîye asteke hemdemên xwe (Adak, 2013: 319). Seydayê Xasî, li cem Mela Mustefayê Xetîb jî xwendîye. Mela Mustefayê Xetîb, birayê Şêx Es‘ed e.<sup>7</sup> Mela Ehmed, tevî tehsîla îlmîn dînî, perwerdeya tesewwufî jî li cem şêxê Neqşebendî Şêx Ebdulqadirê Hezanî temam kirîye û jê xelfetî wergirîye; lê ji ber ku Xasî tim bi karûbarêne îlmî têkildar e, murîd terbiye nekirine (Dağılma, 2015: 127).

Çawa ku ji her du *Reddiyyeyen* wî û ji her du *Menzûmeyen* wî yên kelamê yên bi erebî dîyar dibe, wî di warê tesewwuf, îlmê kelam û eqîdeyê de jî pisporî û behremendîyeke bala hebûye. Ji beyt û cureyên nezmî yên berhemên Xasî dîyar dibe ku wî di biwarê hunerên edebî de jî paşxaneyeke dêrin hebûye. Ji helbesta wî ya tirkî ku li ser *wezna kîteyî* (12 kîteyî) dîyar dibe çawa ku haya wî ji şâîr û edebîyata klasîk a Dîwanê heye, hay ji şâîrên edebîyata devkî ya tirk û şâîrê navdar Yunus Emre jî hebûye ku karîye bi hostetîyeke bi vê terzê helbest bihûne.

### 2. Peywendîya Xasî Digel Xuyanîyêne Diyarbekirê û Sirgûna Wî

Zemanê ku giregir û esilzadeyên kurd di sala 1900î de “Kürdistan’ın Azm-i Kavi Cemiyeti” saz dikin, Xasî jî di nav wan de cih girtîye. (Malmîsanij, 2010: 15-21). Xasî li Diyarbekirê, di weqtê xwe de li hember alîgirên Îttîhad û Tereqqî, muxalîf e û li hember Îttîhadîyê xweçihî Ziya Gökalp dijberîyeke tundane dike. Rojeke ìnê, berî xutbeyê, di Mizgefta Mezin (Ulu Camî) de ew li hember şirove û tewîlîn ayeta “we‘tesîmû bi heblillah”<sup>8</sup> a waizê fermî derdikeve, tefsîra rast a ayetê li wir dîyar dike û ji waizî re dibêje: “Tu iftîra davêjî Xwedê, tefsîra wê ayetê ne wisan e!” Îttîhadparêzên wê hingê, êrîş dibin serê. Şaredarê berê Hecî Niyazi Efendi û hin begên wê derê destê xwe davêjin çekêne xwe û Nîyazî Efendî diberize ser wan: “Kî destê xwe dirêjî Seyda bike dê cesedê wî a niha li vir bikeve erdê!” Bi vî awayî giregir û xuyanîyêne kurmanc û kirmanc, Xasî diparêzin. Li ser vê rûdanê Jon Türk zemanê ku pişî Rûdanê 31ê Adara sala 1909an dibin iqtidar, Xasî wekî tawanbarekî irticayê sirgunî Girava Rodosê dikin û zêdetirî 2 salan li wê derê dîl dimêne (Malmîsanij, 1995: 44). Rojekê beyteke farisî ji Sultan Ebdulhemîd re dinivîse û dişene. Li ser vê nameyê Sultan wî diêne cem xwe û azad dike<sup>9</sup>

7 Hevditîna taybet digel M. Muhemmed Hezanî: (19 Agustos/Tebax 2020, Diyarbekir).

8 “Hün gişt xwe bi benê Xwedê (Qur'anî) ve ragirin û jî hev parce mebin. Qencîya Xwedê ya li ser we bi bîr bînin; dema hûn ji hev re dijmin bûn, hogîrî xiste navbera dilê we, îcar hûn bi qencîya Wî ji hev re bûn bira. Hûn li ser keviya dojehê bûn, Xwedê hûn jê xelas kirin. Her wiha Xwedê ayetên xwe ji we re diyar dike da ku hûn hîdayet bibin..” Alu Imran, ayet, 103.

9 Xasî, gelek caran digel Ziya Gökalp dikeve niqaşan. Ji lew re alîgirên Îttîhad û Tereqqîyê, gîliyê wî li Stenbolê dikin. Li ser vê yekê rojekê têne ber derê mala wî, jê re dibêjin ku “Li wîlayetê ehle ilim di meseleyekê de çik bûye xitimîye, ji bo ku vê çareser bikî, wali beg gazî te dike” û bi vî awayî wî sirgûnî Stenbolê dikin. Ji ber ku li sirgûnê gelek destteng dibe, helbesteke ku xîtabî

(Mihanî, 1994: 5). Ev helwesta alimane ya Xasî, nîşaneyâ hassasîyeta wî ya li pêşber îlmên İslâmî ye.

### 3. Berhemên Xasî

Li gor daneyên ber destê me yên mîna destxetê Zeynelabidîn Amedi, *Dîwana Camî'* a Qoxî, lêkolnîn Ş. Korkusuz û *Mecmuela* Ş. Cuneydî Zoqeydî berhemên ku Xasî ew nivîsîne, bi zimanê erebî, farisî, tirkî, kurmancî û zazakî ne. Ji bilî van, hin meqaleyên wî yên cewabî hene ku li dijberî Ziya Gokalp nivîsîne û di rojnameyên Dîyarbekirê de hatine belavkirin (Korkusuz, 1996: 21). Di pey vê agehîyê de li rojnameyên ku giregir û xuyanîyên xanedanên kurdan ku di serdema Xasî de di salên 1909an de li Dîyarbekirê ew çap kirine gerîyam. Ji ber ku hemû hejma ne li ber dest in, tiştek bi destê min neket; bes Ekrem Cemîl Paşa gava behsa rojnameya *Gazi* (1918) dike, navê nivîskarekî muxabîr ê bi navê *Liceyî* qeyd dike (Paşa, 1992: 31). Dibe ku ew Xasî be. Ji bilî van behsa "Dîwan" a wî jî (Seydaoglu, 2010: 75) dihe kirin. Xasî digel *Mewlidî*, bi navê *Kitabu Buşre'l-İbadi fi İlmi'l-İtîqadi* [*Kitîba Mizgîna İbadan di Zanista Bawerîyê de/*] berhemeke kelamî, *Menzûmetu Esmaillahi'l-Husna* [*Menzûmeya Navêن Xweş ên Xwedê]*, *Reddîyyeyeke* mensûr û *Reddîyyeyeke* menzûm; *xezelek, mu-lemmayek* hûnaye.

#### 3.1. *Mewlidî'n-Nebewî (Mesnewî)*

Zeynelabidîn Amidî metnê destxetî yê vê berhemê îstînsax kirîye. *Mewlida Nebî*, sala 25ê meha adara 1315/1899an de bi awayê çapa lîtografî bi qasî çar sed hebî li Dîyarbekirê hatîye çapkiran (Mihanî, 1994: 5). Ev berhem ku bi terzê meSnewîyê hatîye nivîsîn, 16 beş e û bi giştî ji 756 beytan pêk tê. Beytên wê li ser wezna 'erûzê ne û wekî mewlûdê din, ji behra remelê, bi qalibê fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun hatîye nivîsîn. Gava mirov dêhna xwe dide beytên dawîya destxeta Zeynelabidîn Amidî ya sala 1406ê hicrî ku bi zimanê erebî hatine nivîsîn, dîyar dibe ku tarîxa tenzîmkirina *Mewlidî* li gor salnameya hicrî/koçî, 1316 ye. Di dawîya van beytan de (rûpelê 28-29) es-Se'irdî el-'Umerî Fethullah Hesbî, *Teqrîzeke* menzûm ku ji pênc beytan pêk tê li ser Xasî û vê berhema wî nivîsîye. Li ser *Mewlûdî* gelek xebat hatine kirin.<sup>10</sup>

#### 3.2. *Kitabu Buşre'l-İbadi fi İlmi'l-İtîqadi*

Zimanê berhem erebî ye, teşeyê wê nezmî ye. Mijara wê, îlmî îtîqad û Usûla Dîn e. Li ser terzê qesîdeyê ye û hejmara beytên wê 145 e. Li gor ku di dawîya wê ya destxeta Z. Amidî de bi awayê nesrî/pexşanî hatîye dîyarkiran, tarîxa tertîba wê, li ser salnameya hicrî/koçî, 1424 e. Amidî di dawîya berhemê de dîyar dike ku ev nezma celîl, li ser şaxê zanista Usûla Dînî ye, îca gava meriv li temamê berhemê dînihêre, hêla wê ya kelamî-eqîdeyî li pêştir e.

padışahî dike bi zimanê farisî dihûne û tê de diyar dike ku "gava nêçîrvanek nêçîra xwe biqefêle, ya wê serjê dike, ya xwedî dike, yaxud berdide. Îca heger ew wê tim bîhewiqîne û biçîşîne, ev li şan û şurûtê balatîyê nahe." Padışahî wê hingê Sultan Ebûdulhêmîd, çawa vê helbestê dixwêne, yekser tê digihîje ku ev şairekî jîr, zana û şarezâ ye, lewre wî diêne huzûra xwe. Li cem padışahî Şeyxulislam û rayedar hene û padışah jê dipirse: "Ma tu mela yi?" Xasî bersiva xwe bi awayê "Wisan dibêjin" dike. Li ser emrî padışahî, Şeyxulislam û yên wê derê, pîrsan jê dipirsin, ew jî bi awayekî tam û tekûz bersiva wan dide. Padışah digel ên li wir li ber wî hejmetkar dimenîn. Sultan gava dipirse: "Te çi divê?", Seyda bi destê xwe işaretî Şeyxulislam dike û dibêje "Ez saqoyê vî divê." Heman daxwaza wî bi cih diênen, mesrefa wî ya rîwîşîya Dîyarbekirê didinê û digel izzet û ikramê wî virê dikin (Erkol, 2008: 347-348).

10 Roşan Lezgîn, digel dengê wê û destxeteke ciyawaz ew çap kirîye. Adnan Oktay xebatek akademîk bi navê *Klasik Edebiyat Teknikleri ile Bir Değerlendirme* li ser *Mewlîda* Xasî bi zimanê tirkî kirîye û Mehmet Yergin jî tezê masterê li serê kirîye.

### 3.3. Menzûmetu *Esmaillahi'l-Husna*

Zimanê vê menzûmeyê erebî xw li ser terzê *qesîdeyê* ye. Xasî not û neh (99) navê Îlahî bi awayê helbestîk rêsaye. Hejmara beytên wê 33 ye û ev jî delîl e ku cureyê wê yê nezmî qesîdeyeke “munacat”î ye. Gava meriv li tarîxa geşedana vî cureyî dinihêre, dibîne ku ji Xezalî vir ve gelek alimên îlmê Kelamê di vê biwarê de berhem hûnane. Xezalî (w.1111), bi navê *Meqasidu'l-Esma fî Şerhi Esmaillahi'l-Husna* berhemek, Beyzawî (w. 1286), bi navê *Muntehe'l-Muna fî Esmaillahi'l-Husna* kitêbek û Fexredîn Razî (w. 1209), bi navê *Lewaiu'l-Beyyinat Şerhu Esmaillahi'l-Teala we's-Sifet* berhemek nivisiye. Ev kitêbên jor, bi erebî ne. Çend berhemên din ku bi farisî jî hatine nivîsin ev in: Ebdurrehman Camî (w. 1492) bi navê *Risale-i Muemma-yi Nefise* berhemek û Mîr Huseyn eş-Şirazî (w. 1499) bi navê *Şerhu'l-Esmâi'l-Husna* kitêbek nivisiye ku Lamiî Çelebî, ew wergerandiye tirkî. Çend muellifên ku bi tirkî ev cûre berhem nivîsîne jî ev in: Şeyhoğlu Mustafa (w. 1401), İsa Saruhanî (w. 1559), Ahmed Şakir Paşa (w. 1818), İbrahîm Cûdî (w. 1926) û Bîçakçızade İsmail Hakkî (w. 1933) berhemên menzûm ên Esmaê Husna nivîsîne (Yıldız, 2013: 161).

### 3.4. Reddiyyeya Mensûr

Mijara vê *Reddiyyeyê*, li ser tesewwuf û muteswwufan e û bi erebî ye. Sedemê ku Xasî ev berhem bi erebî nivisiye, dibe ku ji ber kevneşopîya wê hingê be ku zimanê erebî, zimanê îlimê bûye. Sedemê duyem dibe ku ji ber wê yekê be ku İsmâîlê Sîirdî, meqaleyên xwe bi zimanê erebî nivîsîne, Xasî jî bi heman zimanî bersiva wî daye û hewil daye ku alimtîya xwe ya di vê qadê de nîşan bide. Piştî rexneyê, wî bi awayê nezmî, li ser teherê qesîdeyê ku dişibe hicwîyeyan, bi zimanekî tund, êrîş birîye ser gotarêñ heman kesî. Hejmara beytên wê, 15 ye.

### 3.5. Reddiyyeya Menzûm

Ev menzûme jî li dijberî meqaleyên İsmâîl b. İbrahîm es-Sîirdî ye û bi erebî ye. Di sernavê wê de hatîye dîyarkirin ku ev cewaba duyem a ji bo hin meqaleyên İsmâîlê Sîirdî ye. Hêla ruxsarî û teşeyî ya vê menzûmeyê, dişibe cureyê qesîdeyên hicwîyeyî. Hejmara beytên wê 53 ye.<sup>11</sup>

*Bir kavm kitapsız olsa / Dilsiz davara benzer  
Dinsiz hayat-ı fani / Yazsız bahara benzer  
Cehaletin libası / Kirli hîmara benzer  
Libas-ı dini soyan / Uyuz humara benzer  
Adil olan mubarek / Ebrûy-i yara benzer  
Zalim olan kimse / Çehre-i mara benzer*

...

*Xasî makal-i sadık / Şems-i nehara benzer* (Amedî 1406, 7-8).

89

### 3.6. Helbesta Tirkî

Xasî ev helbesta xwe, li ser wezna kîteyî hûnaye û her rêzeke helbestê, ji 7 kîteyan pêk tê. Her çiqas di rêza duyem a wekî rêzeke neqeretî xuya bike jî, di eslê xwe de tenê bêjeya “benzer” bûye neqeret. Ev bêje bi tenê nabe neqeret; tenê dibe redif. Yekeya nezmî yê vê helbestê, digel ku Z. Amîdî bi awayê beytan nivisiye jî, dibe ku ne beyt; bes çarîn be. Lewra berî bêjeya redîfî, qafîyeyeke zexim heye. Gava em vê helbestê bi awayê çarîn dabeşî koman bikin, hejmara çarînên wê dike 9; lê ku em wekî

<sup>11</sup> Nusxeyeke wê di Mecueya Şêx Cuneydê Zoqeydî de heye û navê Xasî weha ye: Qediyyetu el-Mela Ehmed el-Hezanî el-Xasî. Di dawîya reddiyyeyê de dîyarkirî ye ku Cuneyd ev nivisiye. Mamoste Abdurrahman Adak ew ji pirtûkxaneya xwe nîşanî me da û tê de diyar dibe ku İsmâîlê Sîirdî, wê hingê müftîyê Çermûnî ye.

beytan bihesibînin, dike 38 beyt. Heke yekeyên wê yên nezmî çar-rêzî bin, pergala wê ya qafiyeyê li cureyê nezmî yê “manî”yê tê. Ev cure manî, ne mîna manîyên din ên tirkî ne û pergala wan a qafiyeyê, bi awayê xbx b ye, hejmara kîteyên rîzikan 7 e û ev cure manî di edebiyata tirkî de, zêde ne berbelav in (Kudert, 1980: 237). Çawa ku qalibê wezna rîzikan vê helbestê 7 e û pergala wê ya qafiyeyê xbx b ye, dibe ku ew jî *manîyek* be.

Ku em bi awayê beytan wê dabeşî koman bikin, ji mijar, teknîk û temaya helbestê derdikeve ku cureyê wê yê nezmî, *xezel* e. Çunkî qafiyeya rîzân ewil ên beytan azad e; lêbelê hemû rîzân duyem ên beytan, digel rîza duyem a beyta ewil hevqafiyeyî hatine rîzkin. Ji ber ku şâirî, di vê helbestê de ji serî heta binî gotinêñ bihîkmet rîsaye, ji alîyê mijar û temayê ve jî li cureyê qesîdeyê tê. Wî, di beyta dawî ya vê helbestê de wekî mexles, navê “Xasî” bi kar anîye. Li gor pirtûkêñ teorîya edebîyatê, besen xezalan, li ser bingeha “beyt”an têñ hûnîn. Hejmara beytên xezalan, herî hindik 5; herî zêde 15 ye. Xezel, dibe ku bi her qalibê wezna erûzê bihêñ hûnîn. Di nav helbestêñ Dîwanê de berbelavtirin cure xezel e ku berê bala şairan li serê ye. Hêza hunerî ya şairan, bi gişî di xezelan wan de dîyar dibe. Xezel, li ser temayêñ mîna evîn (rindî û bedewîyêñ yarê, pesnê wê, cefayêñ ku ji ber evîna wê têñ kişandin, hesret, bêri, daxwaza gihaştina/wuslet û hwd.), şerab (meyhane, bezm, camê cemî, saqî), fîkrîn mîna gazina ji demê, fîkrîn felsefi û didaktîk têñ nivîsin (Kudert, 1980: 343).

### 3.7. Mulemma

Xasî (1866-1951), rîzikeke kirmancî/dimilkî li rîzika erebî, farisî, tirkî û kurmancî ya bendê zêde kiriye. Ev mulemmaya Xasî, ji heşt qiteyan pêk hatiye, Zeynelabidîn Amedî ew bi destxeta xwe nivîsiye û li Diyarbekirê daye çapkiran.

### 3.8. Hicwîyeya li Ser Sa‘îyê Karazî

Xasî, ev helbesta xwe ya kurmancî, li ser hin helbestêñ Sa‘î (1847-1897)<sup>12</sup> yên dijberî zazayan<sup>13</sup> hûnaye. Ev menzûmeyeña Xasî ku bi kurmancî ye, ji qadê/sehayê hatîye berhevkirin (Mihanî, 1994, s. 44-45) û çapkiran. Li gor ku mirov ji alîyê wê yê ruxsarî, teşeyî û naverokî fehm dike, helbesteke destanî ye. Li gor edebiyata tirkî, ew jî dişibin cûreyê edebî yê “qeside”yan ev cûre kilamêñ epîk, di bin banê cûreyêñ nezmî yên edebiyata Aşiqan de têñ hesibandin. (Yıldız, 2017: 189). Destan ku ji bendêñ çarrêzî pêk têñ, teşeyekî nezmî ye û carina hejmara çarînêñ wan ji 100î dibihure. Bi piranî li ser wezna kîteyî, bi qalibê 11 kîteyî têñ nivîsin û pergala wan qafiyeyê, *aaab*, *cccb*, *dddb* ye. Şâir, di çarîna dawî de mexlesa xwe dîyar dike. Metnêñ destanan, li gor mijarêñ xwe, dabeşî komêñ mîna

<sup>12</sup> Sa‘î mexlesa Şêx Muhyedînê Hêni ye. Ew lawê Şêx Ehmedê Karazî ye ku bi eslê xwe ji Silîbîna Midyadê ye. Şêx Ehmed kurê Mela Umer e. Mela Umer di zemanê xwe de mala xwe birîye Şêxçoban, ji wir birîye Girêşîra. Malbata wan seyid e. Şêx Ehmed pişî ku içazeya xwe li Başûrê Kurdistânê ji Şêx Ebdullahê kurê Şêx Yehyayê Mizûrî wergirtîye, vegerîyaye Girêşîra, li wir zewicîye û peyre koçî Karazê kiriye. Karaz, di wê wextê de gundekî Licê bûye. Şêx Ehmed li wir cara duyem dizewice û Xwedê Muhyedîn dike wan, pişre koçî Hêni dike û li wir di 63 saliya imrî xwe de di sala 1884an de wefat dike. Ji bo agadarîyê zêdetir bnr. (Abdurrahman Adak, “Şêx Muhyedînê Hêni: Di Edebiyata Kurdi de Nûnerekî Girîng ê Temaya Xwarîne” *Nûbihar Akademî*, c. 1, j. 3., 2015).

<sup>13</sup> Sa‘î digel Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî di medreseyen Mêrdinê de xwendîye. Pişî ku içazeya xwe wergirtîye, wî li gundêñ Licê, Balicin û Zobrînê melatî û muderristî kiriye. Sa‘î zemanê ku li gundêñ dimbilîyan melatî kiriye, wî û gundiyan hev aciz kirine. Lewre hin helbestêñ wî dijberî wan in Menzûmeyeke wî ya bi navê *Fi Beyani l-Et ‘ime we Mezaqîha [Beyana Xarinan û Tehmîn Wan]* û çar Xezelêñ wî gihaştine roja me. Sa‘î di vê menzûmeyê de bi hin beytan zaza tehl kiriye. Dibe ku Xasî ji ber vê ew hicîw kiriye. (Şêx Muhyedînê Hêni, *Beyana Xwarînan û Zewqîn Wan*, Amadekar: Mela Birhanê Tarînî, Peywend, İstanbul, 2015).

destanên herban, şewatan, erdhejan, nexweşînên şofî, bîyografiya navdaran û mijarêñ mîzahî dibin (Aksoy, 2013: 70). Ev helbesta wî, ji alîyê ruxsarî, mijarî û temayî ve rasterast cureyekî destanê ye. Destan ku di nav teşeyêñ nezmî de dikeve binbeşîya edebiyata gel a aşiqan, dikeve nav teşeyêñ mîna koşma (güzelleme, koçaklama, taşlama, zêmar), semai û varsayıyan. Destan, mîna ilahî, nefes, deme û şathîyeyan, bi awayê çarînî tê nivîsîn. Wekî têgeheke edebî destan, ew cure helbesta gel e ku li ser rûdanêñ mîna serhildan, şêlandin, eşqiyatî, xelayî, erdhej, şewat, nexweşînên şofî/têger ku beşeke mezin a civakê dixin bin bandora xwe tê nivîsîn. *Ji xeyri van destan, çawa ku li ser mijarêñ mîna rexneya civakî, yaxud zemma civakî têñ nivîsîn, wisa jî hin destan ji bo şireta li civakê jî têñ nivîsîn.* Hin destan li ser xuyêñ neçê yên mîna çıkışûsi/timati, melaqî û newêrekîyê jî hatine nivîsîn. Hin rûdanêñ neyînî yên mîna zuxurtî, mîratxwurî û doxînsistîyê ku di nav jîyanê de dilan dax dikin, bûne mijara destanan. Bi ser van de hin destanê ku li ser rewşen mîzahî yên mîna kêçgirtin, gayê boz û merivêñ gurrî jî hatine hûnandin hene. Helbesta destanî, ji hêla teşeyê nezmî ve mîna ye koşmayê û rêzên wê, li ser çarînan dabeşî koman dibin. Qalibê wê yê wezna kîteyî, 11, yan jî 8 kîteyî ye. Hejmara çarînen wê, li gor dirêjahîya rûdanê ye. Destan jî mîna cureyêñ din ên edebiyata gel a aşiqan, bi newayêñ xasî xwe têñ gotin (Kudert, 1980: 282).

Xasî bi awayekî mîzahî avêtîye Se'îyê Karazî. *Jixwe li gor ku em ji çavkanîyê hîn dibin* (Mihani, 1994: 48), ev berhema Xasî, ne bi awayê nivîskî; bes bi awayê devkî li ser zar û zimanê ehlê medreseyê maye û haftîye berhevkirin. Helbestêñ destanî, ji ber ku cureyekî vegotinê ne, ango hîkayeyî ne, bi giştî cih nadin hêmanêñ romantîk û hestîyar. Di vegotina wan de serî ew e ku rûdanan derbibirin. Gava em li ser vê bingehê li vê Menzûmeye Xasî dinêrin, em dibînin ku hejmara kîteyêñ rêzan, pergala qafiyeya çarînan û naveroka wê bi çureyê destanê re li hev e. Hejmara çarînen wê 11 ye, hejmara kîteyêñ rêzan jî 11 ye û çarînen wê bi pergala *aaab, cccb, dddb ...* yî haftîye qafiyekirin. Ev hicwîye herçiqas bi awayê nivîskî li cem seydayan hebûye jî, bi awayê devkî gihaştîye roja me.<sup>14</sup>

### 3.9. Murebbe'a Wî

Xasî, ev helbesta xwe bi kurdiya kurmancî hûnaye. Temamê helbestê sê çarîn e. Her bendeke wê ji çar rêzikan pêk dihê. Di serê her çarînekê de bi navêñ “Ehmeda” û “Xasiya” xîtabî xwe bi xwe dike. Şemaya wê ya qafîyeyê xxxa ye.<sup>15</sup>

14 Mela Muhamedî Hezanî diyar dike ku ev hicwîye Xasî li ser rûpelekî nivîsandî bû û li cem min hebû û dirêj bû. Ev helbetsa *Sa'îyê Karazî bi qasî ku di bîra wî de mabû, wî ev rêz kirin:*  
*Li nik Îmamê Dêrûnê hûr e /Nikare yek nefes pif ke bilûrê*  
*Dixwe sond bi Tewrat û Zebûrê / Ez im iro Herîriyê Meqamat*  
*Çıqas kérگü û kîsöy li pal e / Sa'î mamûrê exnama ısal e*  
 Navê wî mi kire Fat e / Dibêñ qaçax in bermedin Sa'î hat (Hevdîtina taybet 19 Tebax 2020; Diyarbekir)

15 Ev helbesta wî, ji alîyê ruxsarî, mijarî û temayî ve rasterast cureyekî destanê ye. Cevdet Kudret ev mijar girtîye dest û amaje bi hin taybetmendîyen destanê kirîye. Li gor ku em jê fehm dikin destan ku di nav teşeyêñ nezmî de dikeve binbeşîya edebiyata gel a aşiqan, dikeve nav teşeyêñ mîna koşma (güzelleme, koçaklama, taşlama, zêmar), semai û varsayıyan. Destan, mîna ilahî, nefes, deme û şathîyeyan, bi awayê çarînî tê nivîsîn. Wekî têgeheke edebî destan, ew cure helbesta gel e ku li ser rûdanêñ mîna serhildan, şêlandin, eşqiyatî, xelayî, erdhej, şewat, nexweşînên şofî/têger ku beşeke mezin a civakê dixin bin bandora xwe tê nivîsîn. Ji xeyri van destan, çawa ku li ser mijarêñ mîna rexneya civakî, yaxud zemma civakî têñ nivîsîn, wisa jî hin destan ji bo şireta li civakê jî têñ nivîsîn. Digel van, hin destan hene ku li ser xuyêñ neçê yên mîna çıkışûsi/timati, melaqî û newêrekîyê jî hatine nivîsîn. Hin rûdanêñ neyînî yên mîna zuxurtî, mîratxwurî û doxînsistîyê ku di nav jîyanê de dilan dax dikin, bûne mijara destanan. Bi ser van de hin destanê ku li ser rewşen mîzahî yên mîna kêçgirtin, gayê boz û merivêñ uyuz/girî jî hatine hûnandin hene. Helbesta destanî, ji hêla teşeyê nezmî ve mîna ye koşmayê û rêzên wê, li ser çarînan dabeşî koman dibin. Qalibê wê yê wezna kîteyî, 11, yan jî 8 kîteyî ye. Hejmara çarînen wê, li gor dirêjahîya rûdanê/qewimînê ye. Destan jî mîna cureyêñ din ên edebiyata Gel a aşiqan, bi newayêñ xasî xwe têñ gotin (Cevdet Kudret, Örneklerle Edebiyat Bilgileri 1, İnkılap ve Aka Kitabevleri, İstanbul, 1980, r. 282).

### 3.10. *Kitabu't-Tesdîd bi Şerhi Muxteseri't-Tewhîd*

Xasî ev berhema xwe di sala 1324ê koçî de wekî şerha *Buşre'l-İbadî fî İlmi'l-İ'tîqâdi* ya menzûm, bi awayê pexşan nivîsiye û ji 59 rûpelan pêk tê. Ahmet Erkol li ser vê berhemê, di Sempozyuma Licê de teblîxek pêşkêş kirîye û bi berfirehî li ser xalêñ wê kûr bûye.

### 3.11. *Cengnama Kurd û Ermen*

Li gor ku meriv ji helbesta Cegerxwîn tê digihîje Xasî berhemeke bi vî navî hûnaye. Tiştê ku heye heta niha metnê vê berhemê bi destê me neketîye. Qenaet ew e ku wî ev cengname bi kirdkî/dimbili hûnaye (Malmisanij, 1995: 44). Benda helbesta Cegerxwînî:

*Melayê Xasî mewlûda Zazî / Bi zarê zazî çê kirîye ne tazî  
Cengnama kurd û ermen nivîsî / Wek agir berdî me diîsî* (Cegerxwin, 2014: 152).

### 3.12. *Medhiyeya li Ser Mihemed Emînê Qeynterî*

Gundekî bi navê Qeynter li ser Hezroya Diyarbekirê heye. Herçiqas bi vî navî gundek li ser Bis-milê ji heye, bes dibe ku ev gundê navbihurî, ê li ser Hezroyê be. Li vî gundi camerekî bi navê *Mihemed Emîn* hebûye. Zemanê ku nangiranî bûye, libek genim du pere bûye jî, vî camêrî taşteyeke mezin bi camêrî daye Seydayê Xasî û wî jî ev medhîye li serê hûnaye. Hindek vê helbestê ku tê bîra M. M. Hezanî:<sup>16</sup>

*Nanê germ û hingiv û rûnê teze qeymax û dew / Da me qawaltî di Qeynter ne bi xew  
Dirhema hinte di par e firotin bê derew / Navê wî Mihemed Emîn  
Zadehullahu şerafen misle qewmin qed wedew<sup>17</sup>*

### 3.13. *Helbesta Erebî*

Li gor agadarîyên nava gel Xasî damezirînerê komara nû bi helbesteke erebî rexne kirîye ku ew jî ev beyta jêrîn e (Malmisanij, 1985: 76):

*Qidwetu'l-etraki turren el-musemma bi'l-Kemal/Kane me'nuhuz zewalen fî'z-zewalin fî'z-zewal*

Ömer Özcan (2013), di nivîsa xwe ya “Vahyeddîn Küfrevî” de behsa hin bîrewerîyen wî dike û ji devê wî radîgîhîne ku ew digel hevalên xwe diçe zîyareta Bedfuzzeman Emîrdağê. Pişti ku ji mala wî derdi Kevin polîs wan desteser dike û dibe qereqolê, li wir li ser kincen wan areme dikin. Di deftera cêva wî de hin helbestêñ erebî, bi taybetî helbesteke muhîm a Şêx Ehmedê Xasî yê Diyarbekirî heye û di aremeyê de ji destê wan xelas dibe. Xasî di vê helbestê de bi temamî wesfê wî şexsê axirzeman ê ku rutbeya wî mezin e; lêbelê ji hêla manewî ve biçûk e daye.<sup>18</sup>

16 Hevdîtina taybet digel Mela Muhemedê Hezanî (19 Agustos/Tebax 2020)

17 Ellahu teala şerfa wî jî mîna wan qewmîn zemanî berê zêde bike.

18 Ji bo temamîya nivîsê bnî. Ömer Özcan, Vahyeddîn Küfrevî, sorularlarisale.com/taniyanlarin-dilinden/vayhedin-kufrevi; cevaplar.org/index.php?content\_view=55248&ctgr\_id=91 (tarîxa pêgihaştinê: 21.02.2021)

#### 4. Cîyê Xasî di Biwarê Edebîyatê de

Ehmedê Xasî li gor daneyên ber destê me, ewiltirîn şair e ku *Mesnewîya Mewlûdê* bi kirmancî/dimbilî nivîsiye û ewiltirîn şairê alim e ku di kevneşopîya cureyê *mulemmayê* de rêzikeke kirmancî, bi ser rîzika erebî, farisî, tirkî û kurmancî ve zêde kirîye. Heger em menzûmeyen wî yên erebî, farisî û tirkî, digel destana wî ya mîzahî ya bi kurmancî bidin hev, em dikarin wan gişt bi hev re wekî *Dîwançeyekê* bihesibînin. Nexwe şairê ewil ê edebîyata kirmancî ku xwedî *Dîwançeyekê* ye, dîsa dibe Xasî. Ji ber ku Xasî hem bi erebî hem bi tirkî, hem bi kurmancî û hem jî bi kirmancî/zazayî nivîsiye, divê ku meriv cîyê wî yên di nav van edebîyatan da dîyar bike.

##### 4.1. Cîyê Wî di Edebîyata Erebi de

Li gor derfetên îro, berhemên ku Xasî ew bi zimanê erebî hûnane, çar menzûme, pexşan û mullemmayek e. *Kitabu Buşre'l-İbadi fi Îlmi'l-İ'tiqadi*, *Menzûmetu Esmaillahi'l-Husna*, *Reddiyyeya Mensûr-Menzûm* û *Reddiyyeya Menzûm*. Ji ber ku berhemên wî yên bi erebî, gişt li ser îlmê Kelamê ne, dibe ku meriv wî wekî edibekî alim ê vî îlmî bihesibîne û wî di nav ekola nû ya vî îlmî de bihesibîne. Ji ber ku Xasî berhema xwe ya *Kitabu Buşre'l-İbadi fi Îlmi'l-İ'tiqadi* û *Menzûmetu Esmaillahi'l-Husna* bi awayê qesîdeyî hûnaye, cîyê wî di nav qesîdenûsiye erebî ya sedsala 19an de heye. Menzûmeya wî ya *Menzûmetu Esmaillahi'l-Husna* ku qesîdeyeke munacatî ye, dike ku navê wî di nav munacathûnên edebîyata dînî ya erebî de cih bigire. Di edebîyata erebî ya İslâmî de cîyê reddîyeyan gelek mezin e. Xasî bi berhema xwe ya *Reddiyyeya Mensûr-Menzûm* û *Reddiyyeya Menzûm* cîyê xwe di nav vê edebîyatê de jî girtîye. Dibe ku meriv van reddîyeyan wekî meqaleyên îlmî bihesibîne û ev berhem, hem di warê edebîyata tesewwufê de hem jî di warê lîteratura kelamê de xwedî qedrekî mezin in. Wî bi van berhemên xwe li hember fikrên Îbn Teymîye, piştevanîya fikrên Mewlana Xalid û Îmamê Rebbanî kirîye.

93

##### 4.2. Cîyê Wî di Edebîyata Kurmancî de

Wisa dîyar e Xasî ew şair e ku cara ewil di terz û teknîka cureyê “destan”ê de “menzûmeyeke mîzahî” bi kurmancî hûnaye. Ji xeyrî Xasî kîjan şairê kurmanc destaneke mîzahî wuha hûnaye, cîyê meraqê ye. Digel vê wî *medhiyeyek* jî bi kurmancî hûnaye. Ji *Mulemmaya* wî jî dîyar dibe ku cara ewil wî rêzikeke kirmancî li mulemmayeke ku rêzikeke kurmancî tê de heye zêde kirîye. Bi qasî ku a niha em pê agadar in tu şairekî kurmanc, mîna Xasî mulemmê’eke ku ji zimanê erebî, farisî, tirkî, kurmancî û kirmancî/dimbilî pêk hatibe nehûnaye. *Murebbe’â* wî ya kurmancî jî têra xwe bi bîr û boçûnên kelamî/îtîqadî balkêş e. Dibe ku şairên kurmanc bi kurmancî helbesteke wisa hûnabin; bes ev *murebbe’â* Xasî ya bi kurmancî, xwedan cîyekî taybet e.

##### 4.3. Cîyê Wî di Edebîyata Zazayî de

Ehmedê Xasî (1866-1951), pêşengê edebîyata kirdkî ye (Malmîsanij, 1995: 44). Usman Efendîyê Babij (1852-1929) ku 14 salan berî Xasî hatîye dinyayê û 22 salan berî Xasî rehmet kirîye, sala 1901ê *Mesnewîyeke Mewlûdî* nivîsiye (Suregê, 2007: 8); lêbelê vê *Mewlûda* Usman Efendî, bi qasî ya Xasî nav û deng nedaye. Cîyê baldarîyê ye ku Mela Ebdulezîz Bekî jî *Dîwanek* daye û wî jî di weqtê xwe de muftîî kirîye. Mesnewîyê mewlûdan ku di pey Xasî de bi kirmancî/zazakî hatine nivîsîn, kêm zêde dişibin a Xasî. Heta niha şairekî dimbilî ku mîna Xasî mulemmê’ek nivîsibe, hîna em pê ne ‘elam/haydar in.

### 5. Kesayetîya Xasî ya Edebî û Hunerî

Xasî ku mesnewîyeke kirmancî, du reddîyeyê menzûm-mensûr û menzûmeyeke erebî, helbesteke destanî ya kurmancî, helbesteke tirkî û mulemmayek nivîsîye, digel pisporîya xwe ya di warê îlimên İslâmî de, wî şarezatîya xwe ya di biwarê edebîyat û hunera van zimanê navborî de jî nîşan daye. Kêş, wezin, qafîye û redîfên helbestêne wî, nîşaneyê hostetîya wî ya hunerê ne. Çi di zimanê erebî û tirkî de be, çi jî di kurmancî û kirmancî de be, hûnandina wan rêtê helbestê di nav qalibên wezn û hevdengîya redîf û qafîyeyan de, ne karê her edîb û şairî ye. Ji vê hostetîya wî ya van zimanan diyar e ku wî çawa hay ji ziman û edebîyata van zimanan hebûye, pê re behremendîyeke hunerî ya astbilind jî hebûye.

Heger haya dîroknasê edebîyata erebî ya İslâmî ji van berhemên Xasî hebûye, helbet wan dê navê wî û berhemên wî jî di nav lîteratura xwe de bi cih bikira. Bi tevî edebîyata erebî, divîya ku navê wî, bi wê helbesta xwe ya tirkî û mulemmaya xwe, di nav antolojîya helbesta tirkî de jî cîyê xwe bigirta. Jixwe ji zû ve ye ku Xasî di nav antolojîya edebîyata kurdî de cîyê xwe yê bijarte wergirtîye. Xasî ku cara ewil mesnewîyeke dînî di edebîyata kirmancî de hûnaye, bûye sembola mewlûdhûnê ewil ê vê edebîyatê.

Li gor ku M. Muhemedê Hezanî<sup>19</sup> radîgîhîne Xasî bi xwe gotîye ku alimekî wekî Şêx Es‘ed li vî welatê me tuneye. Xasî, gelek caran çûye ji xwe re di dîwana vî Şêxî ya zemanê berê de rûnişfiye û hilma manewî ya Şêxî hildaye û gotîye ku min piranîya nivîs û helbestêne xwe ji ber keşûhewaya berhemên wî girtine.

94

### 6. Kesayetîya Xasî ya Îlmî û Tesewwufî

Mela Ehmed, digel fîrkarîya dînî, perwerdeya tesewwufî jî girtîye û gihaştîye payeya xelîfetîyê. Xasî, perwerdeya xwe ya tesewwufî li cem şêxê Neqşebendî Şêx Ebdulqadirê Hezanî temam kirîye û jê xelîfî wergirtîye Xasî, bûye xelîfeyê Şêx Evdilqadir (Tarînî, 2016: 10). Ji ber kar û baren îlmî, wî mirîd li dora xwe necivandine. Xasî, di serdema xwe de li hember alîgirîn partîyeke sîyasî ku waizekî wan hewla tefsîra Qur'anî li gor berjewendîyen xwe kirîye, dijberî kirîye û tefsîra rasteqîn a ayetê dîyar kirîye. Ev helwesta wî ya alimane, çawa ku delîlê rewşenbîrîya wî ye, alîmtîya wî ya di îlmî Tefsîrê de jî nîşan dide. Tiştê ku di biwarê alîmtîya wî de balê dikêşe, hişyarî û hessasîyeta wî ya li pêşberî ilmê Kelamê ye jî. Wî berhemên xwe yên edebî jî girtîye bin xizmeta vî îlmî. Giranîya berhem û xebatê Xasî li ser îlmê Kelamê ye.

#### Encam

Ehnedê Xasî çawa ku edîbekî ziman û edebîyata kirmancî/dimbîlî ye, herwisa jî wî di warê ziman û edebîyata erebî, farisî, tirkî û kurmancî de jî berhemên edebî-zanistî nivîsîne. Di qada mulleme‘ê de ku cara ewil digel rîzikîn zimanê erebî, farisî, tirkî û kurmancî, rîzikeke dimbilî jî hûnaye, Xasî ye. Di berhemên Xasî de giranîya zimanan serê ewil dimbilî, peyre zimanê erebî, peyre kurmancî, peyre zimanê tirkî û di pey van de zimanê farisî ye. Xasî *Mewlid* bi dimbilî; berhemên xwe yên din ên kelama İslâmî gişt bi zimanê erebî, du helbest bi kurmancî, helbestek bi tirkî û digel ku bi destê me neket jî, yek bi farisî hûnaye. Reddiyeya wî ne tê de, hemû berhemên wî yên bi van zimanan bi awayê

19 Hevdîtina taybet digel M. M. Hezanî, 19ê Tebaxâ 2020î, li Diyarbekirê.

nezmî ne. Ji ber van egeran heqqê Xasî heye ku digel edebiyata erebî, di nav antolojîya edebiyata tirkî û kurmancî de jî cîyê wî bihe çêkirin.

Xasî çawa ku di îlmên klasik ên medreseyê serdema xwe de gihaştiye asta bala û bilind a muderistî û muftîtiyê, di biwarê îlmê tesewwufê de, li ser şopa Teriqeta Neqşebendîtiyê gihaştiye pile û pa-yeya xelîfetiyê. Herçiqas Xasî di serdema xwe de bi şarezatîya xwe ya fiqihnasîyê de nav û deng dabe jî, wî herî zêde giranî û girîngî daye îlmê kelamê û herî zêde di vê biwarê de berhem nivîsîne. Di îlmê kelamê de Xasî li ser şopa mezhebê itîqadî yê Şaffîyan Eş'erîtiyê meşîyaye, di vê rîyê de xebitîye û bi hemû hêz û şîyana xwe, ji bo parastina fikir û nêrînê alimên kelam ên vê şopê, bi berhemên xwe berevanî kirîye. Ji ber van egeran heqqê Xasî heye ku di rabirdûya dîrokî ya îlmê kelama Eş'erîtiyê de cih jê re bihe vegetandin û di kitêb û tehsîla îlmê kelama İslâmî de fikir û nêrînê wî jî cîyê xwe bibînin.

Xasî di wextê xwe de li hember rûdanêن civakî û sîyasi yên serdema xwe xemsar nemaye û li gor taqeta xwe, fikir û ramanêن xwe bi awayekî asoazad û helwesteke alîmane, li dijberî rayedarên wê hingê derbirîye û di vê rîyê de dev ji karê fermî yê dewletê berdaye. Ji ber vê helwest, reftar, bizav û tevgera xwe, ew tûşî tehde, sirgûn û zindanîbûnîyê bûye. Berhemên wî neçapkirî mane, bi rehetî negihaştine serdema me û hinek jê wenda ne.

### Çavkanî

- Adak, A. (2013). *Destpêka Edebîyata Kurdi ya Klasik*. İstanbul: Nûbihar.
- Aksoy, H. (2013). Türk İslâm Edebiyatında Nazım Şekilleri. H. A. (Edt.) içinde, *Türk İslâm Edebiyatı* Ankara: Anadolu Üniversitesi Yayıni.
- Beg, M. E. (2012). *Dîroka Kurd û Kurdistanê*. İstanbul: Avesta.
- Bîrsinî, V. (2001). 1919 Sürgünleri. *War*, 98-102.
- Dağılma, İ. (2015). Ahmedê Xasî'nin Hayatı ve Mevlid Adlı Eserinde Tema. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 126-127.
- Demir, Y. (2014). Ji Begê Kurdan Begê Dimilî. *Kelhaamed*, 44.
- el-Gazzalî, E. H. (2000). *Tehâfütü'l-Felasife –Filozofların Tutarzsılığı*, (Eleştirmeli Metin Çeviri: Mahmut Kaya-Hüseyin Sarıoğlu). İstanbul: Klasik Yayınları.
- Erdem, H. (2017). *İlkçağ Felsefesi Tarihi*. Konya: Hü-Er Yayınları.
- Erdemci, C. (2014). Ehî-Sünnet Kelamî. C. Karadaş içinde, *Kelama Giriş*. Eskişehir: Anadolu Üniversitesi Açıköğretim Fakültesi Yayıni.
- Erkol, A. (2008). Seyda Ahmed el-Hassi ve Kitabu't-Tesdid bî Şerhi Muhtaseri't-Tevhid İsimli Eseri. *Dünden Bugüne Lice Sempozyumu* (s. 345-356). Lice: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları .
- Gölcük, Ş. (2012). *Kelam Tarihi*. Konya: Esra Yayınları.
- Güneş, K. (2014). İlk Dönem Kelamî Şahsiyetler. C. K. (Edt.) içinde, *Kelama Giriş* (s. 56).
- Eskişehir: Anadolu Üniversitesi Açıköğretim Fakültesi Yayıni.
- Han, Ş. (2016). *Tevarih-Şeref Han (Mutercim: Şem'i); Inceleme: Adnan Oktay*. İstanbul: Nûbihar.
- Tarînî, M. B. (2016). *Şêx Evdilqadîrê Hezanî*. Diyarbekir: Lîs.

Izady, M. R. (2007). *Kürtler: Bir El Kıtabi (İngilizceden Çeviren: Cemal Atila)*. İstanbul: Doz Yayınları.

Korkusuz, Şefik, *Arşiv Belgelerinde Son Devir Diyarbekir Uleması*, İstanbul: Melisa Matbaası.

Kudret, C. (1980). *Örneklerle Edebiyat Bilgileri 2*. İstanbul: İnkılap ve Aka Kitapevleri.

Lezgîn, R. (2013). *Mewlidê Kirdî ya Ehmedê Xasî*. İstanbul: Nûbihar.

Malmîsnij, M. (1995). Şî'reke Ehmedê Xasî. *Çira*, 44-46.

Malmîsnij (2010). *Yirminci Yüzyılın Başında Kürt Ulusçuluğu (1900-1920)*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî

Merdimîn, W. K. (?). *Mela Ehmedê Xasî, Mewlîd*. İstanbul: Hivda İletişim.

Mihanî. (1994). *Mela Ehmedê Xasî, Mewlûdê Nebî*. İstanbul: Weşanên Firat.

Reyyan, Muhammed Eli (1973). *Tarîxu 'l-Fikri 'l-Felsefî fi 'l-Îslam*. Beyrût: Daru'n-Nehdetu'l-Xerbîyye.

Sarıköyuncu, Ali (2020). Milli Mücadelede Din Adamları II, (7. Baskı), Ankara: Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları.

Seydaoglu, Muhammed (2010). *Gönül Sultanları*, İstanbul: Ravza Yayıncılık.

Sureğê, O. E. (2007). *Mewlido Dimili/Zazakî, (Arêkerdox: Mila Selîm Acarlar&Av. Mehmet Güzel-ler)*. Diyarbekir: Weşanên Enstitûya Kurdî ya Amedê.

Şêx Muhyedîn Hêni (2015). *Beyana Xwarinan û Zewqêن Wan*, (Amadekar: M. Birhanê Tarînî), İstanbul: Peywend.

Îbn Xeldûn, Ebdurrehman b. Muhammed (2019). *Muqeddime* (Exna bih: Mustefa Şeyx Mustefa), Beyrut: Muessesetu'r-Risaleti Naşirûn.

Yıldız, A. (2013). Alla Teala ile İlgili Edebi Türler. H. A. (Edt.) içinde, *Türk Islam Edebiyatı* (s. 161). Ankara: Anadolu Üniversitesi Açıköğretim Fakültesi Yayımları. دیوانا جامع. (1991).

Karak, M.Z. (2021). Bandora Fuzûlî ya li ser Pertew Begê Hekkarî: Mînaka 'Her Nebîta ya Rab, The Journal of Mesopotamian Studies, 6 (1), 97-127 DOI: 10.35859/jms.2021.829141.

---

**MAKALE BİLGİSİ/ARTICLE INFO**

---

Article Type/Makale Türü: Research Article /  
Araştırma Makalesi  
Received / Makale Geliş Tarihi: 20.11.2020  
Accepted / Makale Kabul Tarihi: 21.02.2021  
Doi: 10.35859/jms.2021.829141

# ***BANDORA FUZÛLÎ LI SER PERTEW BEGÊ HEKKARÎ: MÎNAKA XEZELA "HER NEBIT YA REB"***

M. Zana KARAK

---

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü ABD Yüksek Lisans Öğrencisi, m.zana47@gmail.com, <https://orcid.org/0000-0003-1681-4917>.

## **KURTE**

Di edebîyata klasîk a Îslâmî de wergerên menzûm jî parçeyek ji kevneşopîya çanda edebîyatê ne. Gava em bala xwe didin edebîyata Kurdi ya klasîk em dibînin ku di vê edebîyatê de jî ev kevneşopî heye. Di vê xebatê de di çarçoveya edebîyata berawirdî de li ser mijarê hatiye rawestan û bi vî awayî analîz û nirxandin hatine kirin. Di vê xebatê de li ser xezela ku paşserwaya wê "Her Nebit Ya Reb" e û di dîwana Pertew Begê Hekkarî de cî girtiye, bi berfirehî hatiye sekinandin. Xezel ji heft malikan pêk tê û bi eslê xwe ne ji alîyê Pertew, lê ji alîyê Fuzûlî û bi Azerîkî hatiye nivîsîn. Ya ku Pertew li vir kiriye ne şerh e ne jî nezîre ye. Ji ber ku ev wergereke wê ya Kurdîya Kurmancî bû, me ew ji întîhalê nehesiband û di çarçoveya kevneşopîye de me ew weke wergereke edebî nirxand. Pertew di wergera vê xezelê de heta ji dest hatiye ji metnê re sadiq maye û nebûye sedema tehrîfata xezelê. Ev xezel mîna ya resen (ya Azerî) wergerandiye Kurdîya Kurmancî û

ji ber ku ji hêla serwa, paşserwa û kêşa erûzê mîna ya resen e, wergerek şareza û hunerane derketiye holê. Di edebiyatên klasik de helbestkaran ji bo hunermendîya xwe nîşan bidin mînakêni bi vî rengî dane. Pertew jî ji bo hunermendîya xwe bide xuyakirin; ev xezel bi awayekî xweş, bi uslûbeke hunerî ew kiriye malê Kurdiya Kurmancî jî. Di vê xebatê de ev xezel ji aliyê rûxsarî û naverokê ve hatiye berawirdkirin û xezel ji hêla intihal, şerh, nazîre û ji hêla werger, huner û uslûbê ve hatiye analîzkirin. Di encamê de jî bandora Fuzûlî ya li ser Pertew li ber çavan hatiye raxistin.

**Peyvîn Sereke:** Fuzûlî, Pertew Beg, Xezel, Edebîyata Klasik, Edebîyata berawirdî, İntihal, Werger, Kevneşopî

### Fuzûlî'nin Pertew Begê Hekkarî Üzerindeki Etkisi: "Olmasun Ya Rab" Redifli Gazeli Örneği

#### ÖZ

Klasik İslami edebiyatta manzum eserlerin çevirisini edebiyat kültürünün bir parçasıdır. Klasik Kürt edebiyatına baktığımız zaman bu kültürün bu edebiyatta da var olduğunu görürüz. Bu çalışmada, Klasik Kürt edebiyatında var olan manzum eserlerin çevirisinin bir örneği inceleneciktir. Çalışmada, Pertew Begê Hekkarî'nın divanında yer alan ve manzum eserlerin çevirisine bir örnek teşkil eden "*Her Nebit Ya Reb*" (*Olmasun Ya Reb*) redifli gazeli üzerinde etrafıca durulmuştur. Söz konusu gazel yedi beyitten meydana gelmektedir. Aslı Pertew tarafından değil de Fuzûlî tarafından Azeri lehçesiyile kaleme alınmıştır. Pertew'in burda yaptığı ne şerh, ne de naziredir. Pertew'in bu eseri Kürtçe'nin Kurmancî lehçesiyle gazelin bir çevirisi olduğu için bu eseri intihalden saymadık ve klasik edebiyat kültürü çerçevesindeki edebî bir çeviri olarak değerlendirdik. Pertew bu gazelin çevirisinde elden geldiğince metne sadık kalmıştır ve gazelin tahribatına sebebiyet vermemiştir. Bu gazeli, orijinali olan Azericesi gibi Kürtçe'nin Kurmancî lehçesine çevirmiştir. Kafiye, redif ve aruz veznini orijinali gibi uygulamış, sanatlı ve başarılı bir çeviri ortaya çıkmıştır. Klasik Kürt Edebiyatı'nda şairler hünerlerini göstermek amacıyla bu tip örnekler vermişlerdir. Pertew de hünerini göstermek için bu gazeli güzel bir şekilde, hünerli bir üslupla Kürtçe'nin Kurmancî lehçesine mal etmiştir. Bu çalışmada her iki gazel içerik ve biçim yönünden kıyaslanmıştır ve gazelin intihal, şerh, nazire, çeviri, sanat ve üslup yönünden de analizi yapılmıştır. Sonuç olarak da Fuzûlî'nin Pertew üzerindeki tesiri gözler önüne serilmiştir.

**Anahtar Kelimler:** Fuzûlî, Pertew Beg, Klasik edebiyat, Karşılaştırmalı edebiyat, İntihal, Çeviri, Gelenek

### The Effect of Fuzûlî on Pertew Begê Hekkarî: "Her Nebit Ya Reb" Redif Ghazal as Sample

#### ABSTRACT

Translation of verse works in classical Islamic literature is a part of literary culture. When we look at the classical Kurdish literature, we see that Kurdish literature has this culture too. In this study, an example of the translation of verse works in Classical Kurdish literature will be analyzed. In the study, the redif ghazel "*Her Nebit Ya Reb*" (*Olmasin Ya Reb*), which is an example of the translation of verse works and is included in the collected poems of Pertew Begê Hekkarî, has been elaborated. The redif ghazal in question consists of seven couplets. The original of this work was written not by Pertew but

by Fuzûlî in the Azeri Turkish dialect. What Pertew does here is neither annotation nor a nazire. Since this work of Pertew is a translation of ghazal in the Kurmanji dialect of Kurdish, we did not count this work as plagiarism and evaluated it as a literary translation within the framework of classical literary culture. In the translation of this ghazal, Pertew remained faithful to the text as best he could and did not cause the destruction of the ghazal. This ghazal has translated into the Kurmanji dialect of Kurdish like its original Azerbaijan Turkish. He applied rhyme, redif and prosody meter as the original, an artistic and successful translation has emerged. Poets in Classical Kurdish Literature gave such examples in order to show their skills. Pertew also appropriated this ghazal to the Kurmanji dialect of Kurdish with a skillful style to show his skill. In this study, both ghazals were compared in terms of content and form, and the ghazal was analyzed in terms of plagiarism, annotation, nazire, translation, art and style. As a result, the influence of Fuzûlî on Pertew was revealed.

**Keywords:** Pertew-Fuzûlî, Classical literature, Comparative literature, Plagiarism, Translation, Tradition.

#### Extended Summary

Nations and societies in the Middle East have been in contact and exchanged with each other since ancient times. Kurds have also had relations with Persians, Arabs, Turks and Armenians throughout history. This dealing has been in the field of culture, literature and language as well as in the field of trade, and this dealing even continues today. Many examples of this relationship can be seen when we take a glance at Kurdish and Turkish literature. Especially in classical literature, these examples are more common in verse texts.

99

Translation of verse works in classical Islamic literature is a part of literary culture. When we look at classical Kurdish literature, we see that this culture is also present in this literature. In this article, an example of the translation of verse works in Classical Kurdish literature will be examined. In the study, the odes (Ghazals) of Fuzûlî's (d. 1556.) "olmasun ya Rab" and Pertew Begê Hekkari's (d. 1834?) "her nebit ya Reb" odes with redif (repeated voice) were discussed in detail. The ode in question consists of seven couplets. Although the Kurdish translation of this ode is included in Pertew's Diwan, the Azerbaijani version of the same ode is also included in Fuzûlî's Turkish Diwan. The original was written not by Pertew but by Fuzûlî in the Azeri dialect.

Since it is a translation of Fuzûlî's ode with the Kurmanji dialect of Kurdish, we considered Pertew's ode as a literary translation within the scope of classical literary culture. In the translation of this ode, Pertew remained faithful to the text as best he could and did not cause the deterioration of the ode. Pertew translated this lyrical and sufi ode with the same rhyme, redif and aruz wezni as the original, resulting in an artistic and successful translation.

In Classical Kurdish Literature, poets gave such examples in order to show their skills. Pertew also produced this in Kurmanji dialect of Kurdish with a beautiful and dexterous style to show his skill.

These odes were compared within the comparative literature discipline, and then the comparison mechanism was applied to them. Literary and cultural exchanges between the two languages are va-

luable as a brilliant for the relationship dimension of societies. When we look at the ghazals of Fuzûlî and Pertew, it will be seen that these odes were written in two different languages, periods and places, or that Pertew translated this ghazal into Kurmanji dialect of Kurdish. One might as well say, this ode is an important example in terms of the relationship between Turkish and Kurdish literature. This, in turn, imposes on us the concentration of this ode and its translation within the discipline of Comp-Lit science. This ode translated by Pertew may be the first translation from Azerbaijani into Kurmanji dialect of Kurdish, and according to the available data, our opinion is in the same direction. In this context, this study shows us a little bit the relations between Turkish and Kurdish literatures in the Ottoman period.

The comparison of the two odes in the article was made in terms of both their authors and their content and form features. In the study, biographies of both poets were presented briefly and the international transcription letters and critical edition of the ode texts were made and given. The comparative method of manuscript copies was used in the preparation of the critical text. In this context, the similarities and differences between the two odes were determined and evaluated. Likewise, within the scope of the classical literature tradition, this ode was evaluated in terms of parallel and plagiarism. As a method, the text of the two odes were adhered to comparison in terms of shape and content. What did Pertew do here, what was his purpose? Was it parallel, translation or plagiarism? In this study, such questions were deepened and their answers were sought.

This ode obviously shows Fuzûlî's influence on Pertew. In any case, if there is a poet's willingness and effort to translate an ode, this is also a sign that the translator is directly affected. If Fuzûlî had not had an influence on Pertew and Pertew had not liked his ode, he would not have translated it into Kurmanji. This translation also informs us of something else, which is that Pertew was also aware of poets and literary texts before him and followed neighbor literatures. Likewise, we understand from the translation that Pertew also knows Turkish. Therefore, this translation reveals an example of the relationship between Turkish and Kurdish literatures and shows that this relationship was also present in the period of Kurdish principalities. Besides, we know that a work placed in Kurdish princes' libraries is Fuzûlî's Turkish Diwan.

Briefly, in this study, both odes were compared in terms of content and form, and the ode was analyzed in terms of plagiarism, annotation, parallel, translation, art and style. As a result, the influence of Fuzûlî on Pertew was revealed.

### Destpêk

Li Rojhilata Navîn ji herêma Îranê bigirin heta bi Efxenistan û Erebistana Siûdî; ji Kurdistanê bigirin heta bi Azerbeycan û mintiqeyên derûdora van herêmanên navborî hemû netew û civak di nava têkilî û danûstandinê de ne. Ev têkilî û danûstandin bi qasî ku di bazirganîyê de heye ew qasî jî di mijarên çand, edebîyat û ziman de jî pêk hatiye û hîn jî ev têkilî dewam dikin. Herweha di dîrokê de têkilîyê gelê Kurd jî bi yên Faris, Ereb, Tirk, Ermenî û yên dinê re çê bûne û di qada edebîyat, çand û ziman de danûstandin kirine. Abdurrahman Adak derbarê edebîyat û têkilîya Kurd û Tirkan de weha dibêje:

"Di binemaya xwe de edebiyata Kurdî ya klasîk, ji edebiyata Tirkî zêdetir bi edebiyatên Farisî û Erebî re têkildar e. Lewra ji alîyekî ve Kurd berî ku rastî Tirkan werin, rastî Faris û Ereban hatine, ji alîyê dî ve jî çavkanîyên hîzrî yên edebiyata klasîk ji hinterlanda Farisî û Erebî derbasî Kurdû û Tirkî bûne. Lêbelê digel vê jî di navbera edebiyatên Kurdî û Tirkî yên klasîk de jî têkilîyeke girîng çêbûye. Pişti ku di serdema tarîxî de Kurd û Tirk rastî hev hatine û piştre jî wekî du cîranan bi hev re dest bi jîyanekî nû kirine, di navbera edebiyatên wan de jî bi awayekî jêneger têkilî û danûstandinek çêbûye. Herçiqas têkilîya edebiyata Kurdî bi edebiyata Tirkî re, ji têkilîya wê ya bi edebiyatên Erebî û Farisî re derengtir dest pê kiriye jî, lêbelê dîsa jî têkilîya di navbera wan de ji texmînê zêdetir dewlemend û balkêş e, loma jî hêjayî lêkolînê ye (Adak, 2015:75-110).

Em gava li edebiyata Kurdî û Tirkî dinihîrin em gelek nimûneyên vê têkilî û danûstandinê dibînin. Bi taybetî di qada edebiyata klasîk de di metnê menzûm de ev nimûne zêdetir xuya dibin.

Dîsa li gorî Adak qonaxa yekem a serdema pêşveçûna danûstandinê edebiyata Kurdî û Tirkî ji dawîya sedsala XVIIem dest pê dike û heta bi dawîlîhatina mîrektîyên Kurdan ku beramberî nîveka sedsala XIXem tê, dewam dike. Kesê ku ev serdem daye destpêkirin di dawîya sedsala XVIIem de Ehmedê Xanî ye. Weke tê zanîn di edebiyata Tirkî de gelek wergerên Mem û Zîna Ehmedê Xanî hene ku ev jî yek ji nîşaneyên danûstandina di navbera edebiyata Tirkî û Kurdî de ye (Adak, 2015:75-110). Em di nav sînorê dewleta Osmanî de rastî wergerên Tirkî yên ji Soranî û Goranî jî têni. Keyfi di sala 1881an de xezeleke Kurdî<sup>1</sup> û manzûmeyeke Kurdiyî Goranî<sup>2</sup> ku di wê demê de dibêje 300 sal berê hatiye nivîsîn tevî wergerên wan ên Tirkî di rojnameya *Tercumanê Heqîqet* (*Tercüman-i Hakikat*) de weşandiye (Veroj, 2017:113-120). Ev nimûneyên wergerên pexşan ku ji Soranî û Goranî (Hewramî) ne, ew jî nîşan didin ku ev danûstendinê di navbera edebiyata Tirkî û Kurdiya Kurmancî de hatine kirin ji bo zaraveyê din jî pêk hatiye. Herweha em dizanin ku di pirtûkxaneyên mîrektîya Bedlîsê de dîwanê Farisî û Tirkî yên helbestkarên meşhûr ên weke Camî, Hafiz, Sa'dî, Baqî û Nefî jî hebûne (Çelebî, 1965:1276). Ev yek jî dîsa derbarê têkilîya edebiyata Kurdî û Tirkî de fikrekê dide me û ihtiîmal e ku di mîrektîya Hekkarî de dîwana Fuzûlî jî di nav de gelek berhemên ji edebiyata cîranan hebin.

Dema Dîwana Pertew li Bakur bi tîpêñ latînî hatiye çapkîrin (Bnr. Doskî, 2011:211) û ev xezela bi redîfa "Her Nebit Ya Reb"<sup>3</sup> ji alîyê me ve hat xwendin û pêve bi me re şik û gumanek çê bû. Lewra ev xezel ji me re xerîb nedihat. Ev ritm, melodî û kêşa xezelê ji guhan re û serwa û paşserwayê wê jî ji çavan re naskirî bûn. Dema em li ser kûr bûn hat bîra me ku di dîwana Fuzûlî (1480-1556) de xezeleke weha heye. Pişti vê gumanê, ihtiîmala ku ev xezel ne ya Pertew be û ev ya Fuzûlî be, derket pêş. Gava

- 1 Li gorî tesbîten me; Kurdî mexlesa Mistefa Begê Kurdiyê Sahibqiran (1809-1850) e. Ji bo helbest û wergera wê ya bi Tirkî bnr. Keyfi, Gazel, *Tercüman-i Hakikat*, no 969, r. 2, 18 Şevval 1298 (13ê ilona 1881ê). Herweha di navbera teksta rojnameya T.H.'ê û nusxeya Diwana Kurdi de jî hem ferqên biçûk hene hem jî teqdim û texîr di navbera malikan de çê bûne, di rojnameya de 8 malik hene lê di Diwana Kurdi de 9 malik hene (bnr. Kurdi, 2010:124).
- 2 Li gorî tesbîten me; Ev helbesteke Mewlewîyê Kurd (Abdurrahîm Mewlewî/1806-1882) e û bi Hewramî ye. Ji bo helbestê û wergera wê ya Tirkî bnr. Keyfi, Cevabnamî Manzûm, *Tercüman-i Hakikat*, no 974, r. 3, 25 Şevval 1298 (19ê ilona 1881ê). Herweha di navbera teksta rojnameya T.H.'ê û nusxeya Diwana Mewlewî de jî hem ferqên biçûk hene hem jî di navbera malikên wê de teqdim û texîr çê bûne, di rojnameya de 23 malik hene lê di Diwana Mewlewî de 26 malik hene (bnr. Mewlewî, 1966:110-116). Keyfi ji bo vê helbestê dibêje teqrîben 300 salî ye, lêbelê jiyana Mewlewî di sedsala 19em de borîye.
- 3 Ji vir û pêve ji bo hêsanter û kurtir e, em ê vê xezelê weke xezela "Ya Reb"ê bi nav bikin.

ku me xezelê Fuzûlî kontrol kirin û pêve ev îdia hat piştrastkirin ku xezel ya Fuzûlî ye. Heta niha li ser helbestên Pertew hin xebat hatine kirin<sup>4</sup>, lêbelê tesbîta vê xezela ew qas meşhûr nehatibû kirin û ev yek jî mirovan matmayî dihêle. Bi heman awayî dîsa xezeleke Fuzûlî ji alîyê helbestkarê Kurd Fehmî Begê Pêçarî (Namî) ve jî ji bo Kurdiya Kurmancî hatiye wergerandin û texmîskirin (Demir, 2019:54).

Di serî de Pertew Begê Hekkarî û Fehmî Begê Pêçarî tê de divê li ser helbestên helbestkarê dinê jî lêkolînê bi vî rengî bêñ kirin û têkilîya edebiyata Kurdi bi edebiyatê cîranan re were tesbîtkirin.

Di vê xebatê de xezela bi paşserwaya “olmasun ya Rab” a Fuzûlî û “her nebit ya Reb” a Pertew Begê Hekkarî dê di nav disiplîna edebiyata berawirdî de bêñ berawirdkirin û mekanîzmaya berawirdkirin dê bê ïcrakirin. Danûstandinê çandî û edebî ku di navbera du zimanê cuda de pêk têñ, gelekî bi nirx in. Dema em li xezela Fuzûlî û Pertew dinihêrin, tê dîtin ku ev xezel hem bi du zimanê cuda hem jî di du serdem û li du cihêñ cuda hatine nivîsin ango Pertew ew wergerandiye Kurmancî. Ev jî dike ku em di nav disiplîna zanista edebiyata berawirdî de li vê xezelê û wergera wê binihêrin û li ser mijarê rawestin. Dibe ku ev xezela ku Pertew wergerandiye, wergera yekem be ku ji Azerî ji bo Kurmancî hatibe kirin û li gorî daneyêñ ber dest qenaeta me jî bi vî alîyî ve ye. Herweha ji bo têkilîya di navbera edebiyata Kurdi û Tirkî de jî ev xezel nimûne û mijareke girîng e. Di vê çarçoveyê de ev gotar têkiliya di navbera edebiyata Kurdi û Tirkî ya di serdema Osmanî de jî hinekî nîşanî me dide.

Ji ber ku berawirdkirina her du xezelan dê li ser metnêñ wan bê kirin, weşandina metnêñ wan jî dê bibe beşike girîng a vê gotarê. Metnêñ xezelan dê bi awayekî transkirîbekirî û rexneyî (edîsyon-krîtîk) bêñ weşandin. Di amadekirina metnêñ rexneyî de, dê rîbaza berawirdkirina nusxeyêñ destxet were bikaranîn û ferqêñ di navbera nusxeyan de jî dê di jêrenotan de bêñ nîşandan. Em dê xezela Fuzûlî ji destxetan li gorî herfîn transkrîpsiyonê ya navnetewî ku di elîfbêya Tirkî ya latînî de têñ bikaranîn tercîh bikin. Lewra ev xezel bi Tirkiya Azerî ye û me ji bo latînîzekirinê ev rîbaz tercîh kir da ku hev-sengîyek bi ziman re hebe û baş were têgihiştin. Ji bo transkirîbekirina metna xezela Pertew jî ku em wê weke wergera xezela Fuzûlî dinirxînin em dê dîsa bi herfîn transkrîpsiyonê yên navneteweyî ku di metnêñ Kurdi de têñ bikaranîn nîşan bidin. Yanî em ê formêñ wan ên ku di elîfbêya Kurdi ya latînî de têñ bikaranîn tercîh bikin. Herfîn bi Erebî û yên muqabilê wan ku di transkrîpsiyonê de me bi kar anîne ev in:

Elîfbêya Transkrîpsiyonê ya Navneteweyî					
Tîpêñ Erebî	Tirkîya Osmanî	Kurdî	Tîpêñ Erebî	Tirkîya Osmanî	Kurdî
ا (ا)	a, ā	a	ض	d/ž	d/ž
ا (ا)	a, e, ı, u, ü	e	ط	t	t
ب	b, p	b	ظ	z	z
پ	p	p	ع	'	'
ت	t	t	خ	ğ	ğ/x
ث	s	s	ف	f	f
چ	c, ç	c	ڦ		v
ئ	ç	ç	ڦ	k	q

4 Bnr. Kurdo, 1992; Doskî, 2006; Amêdî, 1978 (Herweha latînîzekirina van her du berheman; Sadînî & Guzereşî, 2011; Zinar, 1991).

ح	h	ه	گ	k, g, (ñ)	k
خ	હ	x	گ/خ	ñ	g/k
د	d	d	ل	l	l
ذ	ز, ڏ	ز	ڙ	m	m
ر	r	r	ڻ	n	n
ز	z	z	و	v, u, ڻ, ü, o, ö	w, ڻ, o
ڙ	j	j	ه	h, a, e	h, e
س	s	s	ال	la, lâ	la
ش	ش	ش	ى	y, i, ى, ى, ى	y, ى, ê
ص	ش	ش	ء	,	,
		,	Apostrof (Dabir)	,	,

Di amadekirina metnê herdu xezelan de jî tenê nusxeyên destxet ku di pêvekan de cî digirin esas hatine girtin. Me ji bo xezela Fuzûlî tenê çar nusxeyên destxet ên cuda di amadekirina metna rexneyî de bi kar anîn. Di nav van nusxeyan de me nusxeya ku di 1672yan de li Bexdayê ji alîyê Qudbeddin el Kirmanî ve hatiye îstînsaxkirin weke bingeh qebûl kir û dîsa me nusxeyên din jî pê re muqayese kir û cudahiyê wan di aparatan (jêrenot) de nîşan dan. Me ji bo wergera xezelê ya Kurdî jî dîsa tenê nusxeya destxeta Dîwana Pertew a ku ji alîyê Kemal Badillî ve hatiye îstînsaxkirin esas wergirt. Kêmasiyê vê nusxeyê jî dîsa me di nav kevaneka çargoşe û jêrenotan de nîşan da û bi vî awayî me metneke rexneyî derxist holê.

Di vê xebatê de me li ser metnên resen berawirdkirina xwe kiriye. Ji ber ku Pertew xezela Fuzûlî rasterast wergerandiye Kurdî me hewce nedît careke dinê vê xezelê wergerînin Kurdî. Di gotarê de berawirdkirina herdu metnên xezelan dê ji alîyê helbestkarêwan û taybetiyê ruxsarî û naverokî yêxezelan ve bê kirin. Di çarçoveya van qadan de wekhevî û cudahiyê wan, tiştênu ku wergir (Pertew) ji şander (Fuzûlî) kopî kirine û alîyê wî yê orjînal ku hebin dê bênen tesbîtkirin û nirxandin. Em dê di vê çarçoveyê de li ser mijara întîhal û nezîreyê jî rawestin, lewra ev mijar divê di çarçoveya kevneşopîyê de were nirxandin. Herweha berîya em derbasî van mijarê navborî bibin em ê kurteagahiyeke derbarê jîyana herdu helbestaran jî pêşkêş bikin.

Weke rê û rîbaz di berawirdkirina ruxsarî û naverokî de, em dê bi metnên herdu xezelan ve girêdayî bimînin. Em dê bi awayekî muqayese li ser alîyê ruxsarî û naverokî yêxezelan bisekinin. Gelo Pertew Begê Hekkarî li vir çi kiriye, mebesta wî çi ye? Gelo ev tiştêku li vir kiriye nezîre ye, werger e an întîhal e? Di vê çarçoveyê de em ê li bersivêvan pirsan jî bigerin. Lîbelê berîya vê yekê em dê pêşî danasîna van terman bi kurtasî bikin û paşê jî dê li ser wan analiz û nirxandin bikin û encamekê jê derxînin. Di encamê de jî hevbeşî û cudahiyê xezelan, ast û rîjeya danûstandinê û bandora Fuzûlî ya li ser Pertew Begê Hekkarî û asta orjînalîteya wergera Pertew dê bênen nirxandin û di vê çarçoveyê de dê hin tesbîtan bêne kirin.

## 1. DERBARÊ JÎYANA FUZÛLÎ Û PERTEW BEG DE KURTEAGAHÎYEK

Derbarê herdu helbestkaran de ji ber ku bi hêsanî agahîyên zêdetir dikarin bêñ bidestxistin, me pêwîstî bi parvekirina agahîyên zêdetir nedît.

### 1.1. Fuzûlî (1480?-1556)

Di çavkanîyên derbarê Fuzûlî de tê ragihandin ku navê wî yê esil Mehmed e û yê bavê wî jî Sulayman e (Karahan, 1989; Mengi, 2016; Tarlan, 2013; İpekten, 2013). Li gorî texmînan, Fuzûlî di sala 1480yî de li herêma Iraqê hatiye dinê û di sala 1556an de ji ber şewbekê li derdora Bexdayê wefat kiriye (Kanar, 2015:1).

Li gorî agahîyên ku Haluk İpekten radigihîne; Fuzûlî di berhemên xwe de, di pêşgotina *Hedîgetu's-Sû'edâyê û Dîwana Farisî* de gotiye zimanê min yê zikmakî Tirkî ye. Lîbelê derbarê Fuzûlî de agahîyên ku têñ zanîn pir kêm in û cih û dîroka jidayikbûna wî jî bi awayekî zelal ne diyar e (İpekten, 2013:24). Lê tiştê ku bi piranî tê zanîn ev e ku Fuzûlî li Iraqê hatiye dinê, li wê derê jîyana xwe borandiye, di warê edebîyatê de pir serkeftî ye, gelek zimanân dizane û zêde berhemdar e. Abdülkadir Karahan jî di berhema xwe de dest nîşan dike ku hin kes ji Fuzûlî re dibêjin Kurd û hin jî dibêjin Faris e. Lîbelê Karahan li dijî van îdiayan derdikeve û dibêje wesîqeyeke ku van îdiayan piştrast bike di destêñ me de tune ye û Karahan, Fuzûlî weke Tirk qebûl dike (Karahan, 1989:114-115).

Ahmet Emin Saraç di teza xwe de Fuzûlî Kurd qebûl nake û derbarê qewmîyeta Fuzûlî de dibêje: “Yek ji pisporêñ herî mezîn ê edebîyata Îranê, Sa‘îd Nefîsî di tezkîreya şairan de ku zêdetir ev weke tarîxa edebîyatê ye, gotiye Fuzûlî Kurd e. Lîbelê haya Nefîsî ji dîwana Farisî ya Fuzûlî tune ye û berhemên wî jî baş nas nake” (Saraç, 2018:15). Baba Merdoxê Rûhanî jî di *Dîroka Navdarêñ Kurd* de radigîne ku Fuzûlî Mihemedê kurê Silêman e û ji Kurden Azerbeycanê ye (Rûhanî, 2017:178).

Îdiayêñ ku Fuzûlî Kurdi dizane an jî Kurd e ji alîyê hin nivîskar û lêkoleran ve gelek caran hatiye ser ziman. Di nav wan kesan de nivîskar Ahmet Turan Alkan û nivîskar Seîd Veroj jî hene. Alkan di nivîsa xwe ya bi navê “Mimar Sinan’ın Ermeniliğine Dair” de dibêje: “Dostekî min ê entellektuel ku ehlê medreseyê bû xezelêñ Fuzûlî yêñ Kurdî jî jiber dixwendin û ji bo Fuzûlî digot; matmayî nebin, hûn jî dizanin ku rehmetî Kurd bû” (Alkan, 2010).

Veroj jî di pirtûka xwe ya bi navê *Mehmed Mîhrî Hilav û Kovara Kurdistanê* de derbarê ihtîmala Kurdbûna Fuzûlî û Dîwana wî ya Kurdî ku di destêñ me de tuneye, çend gotin nivîsîne. Bi heman awayî Veroj di gotara xwe ya bi navê “Ji Dîwana Fuzûlî Ber Bi Nasnameya Wî Ve” de jî dibêje Mehmed Mîhrî jî di nav de beşêke girîng Fuzûlî wek Kerkûkî qebûl dikin û Bexdadîbûna wî lawaz e (Veroj, 2014:44-49). Veroj ji lêkolerêñ biyanî û xwemalî ve derheqê kurdbûna fuzûlî de van ifadeyan jî neqil dike, lê divê ev îddîa bi awayekî zanistî bê vekolîn û mijar bê zelalkirin.

“Di Ansîklopediya İslâmî de jî li ser cî û war, eşîr û qewmîyeta Fuzûlî weha tê gotin: “Di Tezkîreya Sadiqî de hatiye gotin ku Fuzûlî mensûbê eşîreta Bayatî (Beyatî) ye.” Di pirtûka bi navê Seyahatnâme-i Hudud a Mehmed Hurşîd (Paşa) de jî Bayatî wek navê qebîleyeke Kurd hatiye nîşandan”. Di Ferhengî Kurdistan de li hemberî peyva “Beyat” weha hatiye nivîsin;

"tîreyêkî Kurd ê li dewr û berî şarî Kerkûk e". Îbrahîm Xelîl Baran jî di xebata xwe ya bi navê *Eşîretên Kurd* de, "Bayatî (Beyatî)" wek navê eşîreke Kurd dîyar dike û dibêje ev eşîr "di navbera Duzxûrmatu û Kifrî de cîwarbûyî ye." "Ji ber vê yekê, di serî de oryantalîstê Rûsî yên wekî Krimskiy (1910), Cl. Huart (*Encycl. De l'Islam*, mad. Fuzûlî) û Minorsky (Kurds) Fuzûlî Kurd qebûl kirine." Krimskiy dibêje "ji alîyê qewmî ve, ew ne Tirk e û ne jî Tirkê Azerî ye. Ew ji Kurden Azerî ye, yanî mensubê qebîleyeke Îranî ye." Cl. Huart jî dibêje "ew şâirekî Tirkî yê nijadkurd e." Lékolîner Mehmet Bayrak jî dibêje, "Sê şâîrê gewre yên edebîyata Dîwanê: Fûzûlî, Nabî û Nefî nijadkurd in." (Veroj, 2014:44-49).

Selîm Temo jî hin malikêñ Kurdîya Kurmancî yên ku ji bo Fuzûlî têñ nisbetkirin pêşkêşî me kirin (Temo, 2016) û ev idia parîyekî dinê zelal bû ku bi ihtiîmaleke mezin Fuzûlî Kurd e an jî têkilîyeke wî ya xurt bi Kurdan û Kurdî re heye.

### 1.1.1. Berhemêñ Fuzûlî

**Yêñ bi Tirkî:** Yêñ menzûm ev in: *Dîwan* (Dîwana Tirkî), *Leyla û Mecnûn*, *Beng û Bade* (Efony/Haşhaş û Şerab), *Tercemeê Hadîs-i Erba 'în* (Wergera Çel Hedîsan), *Sohbetu'l-Esmar* (Sohbeta Mêweyan)<sup>5</sup>. Yêñ Mensûr ev in: *Hedîqatu's Su'eda* (Bexçeyê Dilşadîyê), Hin Nameyêñ Wî.

**Yêñ bi Farîsî:** Yêñ menzûm: *Dîwan* (Dîwana Farisi), *Saqîname/Heft Cam* (Heft Pîyale), *Husn û Eşq/Sihat û Merez*, *Enîsu'l Qelb* (Dostê Dil). Yêñ mensûr: *Rind û Zahid*, *Rîsaleya Mu'emma*.

**Yêñ bi Erebî:** Yêñ menzûm: *Dîwan* (Dîwana Erebî). Yêñ mensûr: *Matlau'l-Îtiqad*.

105

Haluk İpekten di berhema xwe ya derbarê Fuzûlî de radigihîne ku ji bilî van berheman hin berhêmêñ Fuzûlî yên dinê jî hene ku ew berhem hîn bi dest neketine û guman li ser hinan jî hene ku ew ên Fuzûlî ne (İpekten, 2013:36). Ew berhem ev in: *Şah û Geda*, *Lûxata Menzûm ya Çaxatayî-Farîsî*, *Husrev û Şîrîn*, *Cumcumename*.

**Yêñ bi Kurdî:** Qismek ji *Leyla û Mecnûnê* (Kurdîya Kurmancî)<sup>6</sup>, ev jî menzûm e.

### 1.2. Pertew Begê Hekkarî (1756-1834?)

Li gorî çavkaniyêñ heta niha jiyana Pertew zêde nehatiye zelalkirin. Di çarçoveya belgeyan de Pertew Begê Hekkarî (1777-1841 an jî 1756-1834?) Kurdekî Mîrê Mîrekîtiya Hekkarîye ye û lawê Ebdulah Xanê Hekkarî ye (Kurdo, 1992:128-129; Sağniç, 2002:423-427; Doskî, 2011:21-26; Yûsif, 2012:107-110). Pertew li Hakkarîye hatiye dinyayê û xwendina xwe di qesra Hekkarîye ango di Medreseya Hu-mayûn de qedandiye û li Hekkarîye koça dawî kiriye û li wir hatiye veşartin (Sağniç, 2002:423-427).

Pertew Begê Hekkarî xwedî dîwanekê ye û Pertew dîwana xwe di 1221ê müşextî (1806ê zayînî) de

5 Li gorî hin lêkoleran Sohbetu'l-Esmar (Sohbeta Mêweyan) ne berhema Fuzûlî ye. Yek ji van lêkoleran jî Sedit Yüksel e ku di meqâleya xwe de ya bi navê "Sohbetu'l-Esmâr Fuzûlînin Değildir", (Sohbetu'l-Esmâr Ne Ya Fuzûlî Ye) de vê yekê tîne ziman (Yüksel, 1972:115-136). Mehmet Kanar jî gava di berhema xwe ya navborî de berhemêñ Fuzûlî rîz dike navê vê berhemê bi lîv nake.

6 Ev berhema ku tê gotin bi Kurdiye hîn bi awayekî berbiçav neketiye destêñ me. Lébelê ji ber ku Selîm Temo çend mînakêñ hel-bestêñ Kurdîya Kurmancî (ji mesnewîya Leyla û Mecnûnê) yên Fuzûlî bi raya giştî re parve kir, em jî vê parvekirinê weke nîşaneyâ hebûna berhemeye bi vî rengî difikirin û wê li vê derê zêde dikin. Lewra ger ev çend rûpelên di destêñ me de ên wî bin, ev jî hebûna berhemeye wî ya bi vî rengî nîşanî me dide.

nivîsiye. Sadiq Behaedîn Amêdî dîwana Pertew Begê Hekkarî berhev kiriye û di 1978an de li Bexdadê bi tîpêن Erebî çap kiriye (Doskî, 2011: 13-15).

Li gorî ragihandina çavkanîyan Pertew, mexlesa Mistefa Begê mîrê Hekkarî ye û di dîwana xwe de mexlesên weke Pertew, Pertewî û Perto bi kar anîye. Tehsîn Îbrahîm Doskî di sala 1989an de di kovara *Karwanê* de bi ser navê “Pertewê Kurd Mistefa Begê Mîrê Hekkarî ye” gotarek weşandiye, aşîkar bûye ku Pertew, mexlesa Mistefa Begê mîrê Hekkarîye ye. Ev mîrekî mîrektîyeke kevn e û mîrê yekem ê mîrektîya Siraceddîn (hicrî 1280-1296) e. Pertew di navbera dawîya sedsala 18em û destpêka sedsala 19em de jîyaye û xwedî dîwanike tam e. Lê tişa ku teqezi tê zanîn ew e ku wî dîwana xwe di sala 1221/1806an de xilas kiriye. Li gorî van tarîxan dema wî dîwana xwe nivîsandiye yan 29 salî, yan jî 50 salî bûye (Doskî, 2011:21-26; Adak, 2014:317-319).

Pertew Begê Hekkarî di edebîyata Kurdiya Kurmancî de nûnerekî girîng ê edebîyata klasîk e. Di serrema mîrektîyan de yek ji helbestkarên xwedî dîwan e. Bi qasî xuya dibe, piştî Melayê Cizîrî helbestkarê duyem yê ku li gorî rîza herfan dîwan amade kiriye Pertew Beg e. Taybetîyeke wî ya girîng ew e ku Pertew Beg bixwe mîrekî helbestkar e. Pertew Beg dîwana xwe di sala 1221/1806an de xilas kiriye û katibê wî kesekî bi navê Ebdulah e. Di dîwana Pertew Beg de bi tevahî 10 quesîde, 4 texmîs, 39 çarîne, 166 xezel û piştî xezelan jî 10 helbestêñ dî hene (Adak, 2014:317-319).

## 2. METNÊN XEZELÊN HERDU HELBESTKARAN

Berîya em derbasî metnêñ xezelan bibin divê em behsa nusxeyêñ ku me ji wan sûd wergirtine bikin û bi kurtasî wan bidin naskirin.

Di pirtûkxaneyêñ li Tirkîyeyê û li Ewropayê derdora 100 nusxeyêñ Dîwana Fuzûlî ku di tarîxêñ cuda de hatine nivîsîn hene û hejmara nusxeyêñ ku di pirtûkxneyêñ şexsî de ne jî nayê zanîn (Kudret, 1985:33-34). Ji bo Xezela “Ya Reb”ê ya Fuzûlî nusxeyêñ destxet ku di metnêñ rexneyî de hatine bikaranîn ev in:

**Nusxeya Qûtbettîn el-Kirmanî:** Herdu berhemêñ Fuzûlî *Dîwan* û *Beng û Badeya* ku bi Tirkiya Osmanî hatine nivîsîn di nav cildekî de ne. Mustensîxê destxetê Qûtbettîn el-Kirmanî ye, tarîx û cihê ïstînsaxê hicrî 30yê Zilhicceya 1082 (mîladî:28ê Nîsana 1672)yan û Bexdad e. Ebatêñ wê 21.5 x 14 cm. e û 152 wereq û bi tevahî 316 rûpel in. Ev xezela navborî di vê nusxeyê de jî heye û me ev nusxeya Qutbettîn Kirmanî weke (QK) bi nav kir (Bnr. Pêvek-I). Ji ber ku ev nusxeya destxet kevn e û di rêzkirina malikan de jî nêzikî wergera Pertew bû me ev nusxe weke nusxeya bingeh qebûl kir. Di navbera vê nusxeyê û nusxeyê din de teqdîm û texîr çê bûye û malika 5em û 6em cî guhertine. Herweha di navbera hemû nusxeyan de ferqêñ biçûk jî hene (Bnr. Pêvek-I, II, III, IV).

**Nusxeya Dîwana Fuzûlî:** Ev jî bi Tirkiya Osmanî hatîye nivîsîn. Mustensîx û cihê ïstînsaxa vê nusxeya destxet nehatîye diyarkirin. Ebatêñ wê 18.2 x 13.3 cm. e û bi tevahî 202 rûpel in. Xezela navborî di vê nusxeyê de jî heye û me ev nusxeya Dîwanê ku mustensîxê wê nayê zanîn weke (X) bi nav kir (Bnr. Pêvek-II).

**Nusxeya Haluk İpekten:** Me ev nusxe ji pirtûka bi navê Fuzûlî Hayatı Sanatı ve Eserleri ku ji

alîyê Haluk İpekten ve di sala 2013an de hatiye çapkîrin wergirt. Me ev nusxe weke nusxeya Haluk İpekten (HÎ) bi nav kir (Bnr. Pêvek-III).

**Nusxeya Muhsin Macit:** Me ev nusxe ji pirtûka bi navê Klasik Dönem Osmanlı Nazmı ku ji alîyê Muhsin Macit, Ömür Ceylan û Ozan Yılmaz ve di sala 2015an de hatiye çapkîrin wergirt. Me ev nusxe weke nusxeya Muhsin Macît (MM) bi nav kir (Bnr. Pêvek-IV).

**Nusxeya Kemal Badıllı:** Ev xezela “Ya Reb”ê ku ji alîyê Pertew Begê Hekkarî ve hatiye werge-randin di *Dîwana* wî de cî digire. Ev nusxeya destxeta Dîwana Pertew ji alîyê Kemal Badıllı ve di sala 1945an de hatiye îstînsaxkirin. Nusxeya vê xezelê birêz Tehsîn Îbrahîm Doskî ji me re şand û me di transkirîbê de ev nusxe tenê bi kar anîye. Lewra yekane nusxeya destxet ku ketiye destê me vêga ev nusxe ye. Me ev nusxeya Kemal Badıllı weke (KB) bi nav kir (Bnr. Pêvek-V)<sup>7</sup>. Di rêzkirina malikan de di navbera vê nusxeya Kurdî û nusxeyê Tirkî de jî teqdîm û texîr heye û malika 4em û 6em a Kurdî cî guhertine. Li gorî metna rexneyî a Tirkî divê ev her du malikên di xezela Kurdî de cî biguherînin.

## 2.1. Metna Xezela Fuzûlî

*Mefâ 'îlün/Mefâ 'îlün/Mefâ 'îlün/Mefâ 'îlün*

+ - - - / + - - - / + - - - / + - - -

1. Benüm tek hiç kîm zâr û perîşân olmasun yâ Rab  
Esîr-i derd-i 'ışk û dâg-i hicrân olmasun yâ Rab
2. Dem-â-dem cevlerdür çekdüğüm<sup>8</sup> bî-rahm bütlerden  
Bu kâfirler esîri bir müselmân olmasun yâ Rab
3. Görüb endişe-i katlümde ol mâhi budur derdüm  
Ki bu<sup>9</sup> endişeden ol [meh]<sup>10</sup> peşîmân olmasun yâ Rab
4. Çıkarmak itseler<sup>11</sup> tendon çeküb peykânîn<sup>12</sup> ol servüñ  
Çılan olsun dil-i mecrûh peykân olmasun yâ Rab
5. Dimeñ kîm<sup>13</sup> ‘adli yok yâ zulmi çok her hâl ile olsa  
Göñül tahtına andan ġayıri<sup>14</sup> sultân olmasun yâ Rab

<sup>7</sup> Ji bo bidestxitina vê nusxeya destxet (mustensîx: Kemal Badıllı) a xezela “Ya Reb”ê em ji birêz T. Îbrahîm Doskî re spasdar in.

<sup>8</sup> 2a. çekdüğüm: QK] çekdigüm: HÎ.

<sup>9</sup> 3b. bu: QK] ol: HÎ.

<sup>10</sup> 3b. - : QK] meh: X, HÎ, MM.

<sup>11</sup> 4a. itseler: QK] etseler: X, MM.

<sup>12</sup> 4a. peykânîn: QK] peykânîñ: HÎ.

<sup>13</sup> 5a. kîm: X, MM, HÎ] kim: QK.

<sup>14</sup> 5b. ġayıri: QK] özge: HÎ.

6. Cefâ vü cevr ile mu'tâdem onlarsiz<sup>15</sup> n'olur hälüm  
Cefasına<sup>16</sup> had ū cevrine<sup>17</sup> pâyân olmasun yâ Rab
7. **Fužûlî** buldi genc-i 'âfiyet meyhâne künçinde  
Mübârek mülkdür ol mülk vîrân<sup>18</sup> olmasun yâ Rab<sup>19</sup> (Bnr. Pêvek-I )

## 2.2. Metna Xezela Pertew<sup>20</sup>

Mefa'îlun/Mefa'îlun/Mefa'îlun/Mefa'îlun

+ - - - / + - - - / + - - - / + - - -

1. Wekî min qet kesek jar û perîşan her nebit ya Reb  
Esîr û derdidarê dağê hicran her nebit ya Reb
2. Ji destê wan butan her cewr û îza [û] cefakêş im  
Esîrê kafîran mişala Misilman her nebit ya Reb
3. Ji bo qetla min ew dilber mudam endîşê der xaşir  
Ji wê endîşê'ê xaşir peşîman her nebit ya Reb
4. Wekî mu'tadê cewr [û] derdê wan bûm û mi<sup>21</sup> xo<sup>22</sup> pê girt  
Meger cewr û cefaya wan çû payan her nebit ya Reb
5. Eger ci bo me bêçaran ne wan 'edl û ne inşaf e  
Ji ȝeyrê wan li textê dil mi sultan her nebit ya Reb
6. Kivan<sup>23</sup> [û] qewsê ebrûyan ji xemzan tîribaran<sup>24</sup> e  
Qe xalî ev dilê mecrûh ji peykan her nebit ya Reb<sup>25</sup>

15 6a. onlarsız: QK] anlarsuz: X, MM.

16 6b. Cefasına: QK] Cefasine: X, MM.

17 6b. cevrine: QK] cevrine: X, MM.

18 7b. vîrân: QK] virân: MM.

19 Ji ber tercîhkîrinê de bilêvkirin û latînezekirina xezela bi Tirkî ya Fuzûlî de hin ferqên biçûk hene. Herweha di nav van ferqan de cudahîya herî mezin cîguherîna rîza malikên 5. û 6. e. (Bnr. Akyüz, Beken, Yüksel & Cunbur, 1958:154; İpekten, 2013:132-139; Kanar, 2015:38-39; Mengi, 2016:352-353; Macit, Ceylan & Yılmaz, 2015:226-227; Tarlan, 2013:91-94; Parlatır, 2014:197) Herweha di yên destxet de jî cudahî hene (Bnr. Pêvek-I. II. III. IV.).

20 Ji bo vê xezelê, destxeta Kemal Badillî ku T. İbrahîm Doski ji me re şandiye bingeh hatiye girtin (Bnr. Pêvek-V).

21 Ev zamîr di axaftina roja me de di gelek devokan de disa weke "mi" tê bilêvkirin, lêbelê di nivîsa kitêbî de tîpa dawî "n" jê nayê xistin û weke "min" tê nivîsin û bilêvkirin.

22 Ev cînavka "xwe" di devoka Hekarî de bêtir weke "xo" tê bilêvkirin û bikaranîn.

23 Ev bêje di Kurmanciya iro ya rojane de weke "kevan" tê bilêvkirin û bikaranîn. Lêbelê ji be ku nîşaneyâ "cir/kesre"yê di destxeta di destê me de xuya dikir, me jî ew weke "kivan" nivîsi.

24 Ev peyv "firebaran" an jî bi forma Farisi "tîr-i baran" jî dikare bê xwendin û herweha bi vî awayî kêşa wê jî xera nabe. Ev riste weha jî dibe: "Kivanê qewsê ebrûyan ji xemzan firebaran e".

25 Di hin nusxeyê vê xezelê de teqdîm û texîr çê bûye yanî cihê hin beşen metnê hatiye guhertin. Nimarekirina malikên vê xezelê ji aliyê me li gorî rézkirina malikên xezela jor a Tirkî hatiye kirin.

7. Te<sup>26</sup> kuncê meykedê kuncek temam ez ‘afiyet **Pertew**<sup>27</sup>  
 Kû kir tehsîl ew kuncik qe wêran her nebit ya Reb<sup>28</sup> (Bnr. Pêvek-V)

Latînîzekirin û nivîsandina bi tîpên Kurdo-Erebîk ya vê xezelê bi gelek awayên cuda hatine kirin. Her lêkolerî li gorî zanebûn, nusxe û destxetêni di destêni xwe de bi formekê latînîze kiriye û bi tîpên Aramî/Erebî daye çapkîrin û weşandin. Ev tercîha wan hem ji bo herfîn Kurdo-Erebîk ya ku Soran li gorî xwe formeke cuda bi kar tînin û hem jî ji bo latînî derbasdar e û cudahî di navbera wan de hene. Lê divê ji bo xebatêni bi vî rengî formeke standart derkeve holê. Li vê derê jî heta ji dest hatiye hewla formeke standart hatiye dayîn.

### 3. ANALÎZ Û BERAWIRDKIRINA HER DU XEZELAN

#### 3.1. Ji Alîyê Ruxsarî ve Analîz û Berawirdkirina Herdu Xezelan

Em dikarin hin taybetîyên xezelê yên ruxsarî weha rêz bikin:

TAYBETÎ	HELBESTKAR	
	Fuzûlî (1480?-1556)	Pertew (1756-1834?)
Serdem	Sedsala 15.-16.	Sedsala 18.-19.
Herêm	Iraq-Derdora Bexdadê ?	Herêma Hekkarî
Ziman-Zarave	Tirkîya Azerî	Kurdîya Kurmancî û Devoka Hekkarî
Teşeya Nezmî	Xezel	Xezel
Yekeya Nezmî	Xane / Malik	Xane / Malik
Hejmara Malikan	7 Malik	7 Malik
Kêş, Qalib û Behra Erûzê	Mefa’îlun / Mefa’îlun / Mefa’îlun / Mefa’îlun (Behra Hezecê)	Mefa’îlun / Mefa’îlun / Mefa’îlun / Mefa’îlun (Behra Hezecê)
Serwa	“an” Serwaya murdef e	“an” Serwaya murdef e
Şemaya Serwayê	aa / ba / ca / da / ea / fa / ga	aa / ba / ca / da / ea / fa / ga
Paşserwa	olmasun ya Râb	her nebit ya Reb
Mexles û Cihê Wê	Fuzûlî / Malika dawî	Pertew / Malika dawî

109

Dema em bala xwe didin herdu xezelan, em dibînin ku di navbera wan de ji hêla şêweyê ve hin cudahîyên biçûk hene. Lîbelê ev cudahî ji bo wergerekê ne zêde ye û normal e.

Nusxeya vê xezelê ya ku Fûzûlî bi devoka Azerî nivîsiye û nusxeya Pertew Begê Hekkarî ku he-man xezel wergerandiye Kurmancî, gava têni muqayesekirin, xuya dibe ku di rêza malikêni xezelê de guherînek çêbûye û hin malikan bi hev re cî guhertine. Di vê berawirdê de em dibînin ku di wergera

26 Ev di nusxeyen metbû' de weke “Ti” hatiye nîşandan (Bnr. Pêvek-VI, VII). Ger “ti” be jî divê ev daçek weke “di” bê fîmkirin.

27 Ev mexlesa helbestkar weke “Perto” jî dikare bê xwendin û nivîsîn.

28 Ji bo formenî cuda yên vê xezelê (Bnr. Pêvek-VI.VII) û nusxeya destxet ya vê xezelê (Bnr. Pêvek-V).

wê ya Kurdî de teqdim û texîr çêbûye. Yanî cihê hin malikên xezelê hatine guhertin û divê malika di rêza çarem û şeşem de ne cî biguherînin. Em dizanin ku di navbera nusxeyêن xezela Tirkî de jî di rêzkirina malikan de hevgirtinek tuneye. Dibe ku ev tevlihevîya di rêzkirina malikan de derketiye holê ji xeletiyêن nusxe û mustensîxan ve pêk hatibe. Yanî dema ku nusxe ji ber nusxeyê ji alîyê mustensîxan ve hatibe zêdekirin ev guhertin çêbûbin. Ji ber ku nusxeyeke destxet tenê ya xezela Pertew li ber destê me ye em bi teqezi nizanin xeletî ji ku dest pê kiriye. Îhtîmal e ku Pertew jî li gorî nusxeya ber destê xwe wergera xwe pêk anîbe. Çunkî gava em li nusxeyên vê xezela Fuzûlî dînihêrin em dibînin ku di navbera nusxeyan de cudahî hene û hejmara nusxeyên wê jî zêde ye. Mesela di hin bêje û rêzkirina hin malikan de di navbera metna xezela di pirtûka Tarlan û destxeta di pêvek-1 ê de jî hin ferq hene. Lîbelê ferqêن wê li gorî nuxeyê din kêm in (Bnr. Tarlan, 2013:91-94; Pêvek-I).

Di helbestê de kombêjeyêن ku di her malikê de têن dubarekirin “her nebit ya Reb” paşserwa ye û herdu tipêن “an” ku di dawîya bêjeyêن “perîşan, hicran, Musilman, peşîman, payan, sultân, peykan, wêran” de hene jî serwa ye û ji ber ku du tipêن dubarekirî ne û berîya herfa rewîyê ji herfa rîdfê “î” (a) hatiye ev jî dibe serwaya murdef (qafiyeya tam). Ev her heşt bêje di herdu xezelan de jî heman bêje ne û herweha serwaya wan jî yek e.

### 3.2. Ji Alîyê Naverokê ve Analîz û Berawirdkirina Herdu Xezelan

Em dikarin hin taybetiyêن xezelê yên naverokî jî weha nîşan bidin:

110

TAYBETÎ	HELBESTKAR	
	Fuzûlî (1480?-1556)	Pertew (1756-1834?)
Cûreya Nezmê	Xezela aşiqane û tesewifî	Xezela aşiqane û tesewifî
Jî Alîyê Naverokê	Xezela Yek-awaz û Yek-aheng	Xezela Yek-awaz û Yek-aheng
Mijar	Êşa evînê, dilxweşîya kişandina eziyetêن ji evînê.	Êşa evînê, dilxweşîya kişandina eziyetêن ji evînê.
Tema	Evîn û eş e (Tesewifî ye).	Evîn û eş e (Tesewifî ye).

Ji bo ku naveroka wê baştir were fêmkirin me xezel malik bi malik adapteyî Kurmancîya îro kir. Hemû malikên vê xezela ku Pertew wergerandiye Kurdî ji hêla me ve bi zimanê îro bi “Kurdiya standart” hate adaptekirin û di adapteya wê de kêşa erûzê li ber çavan nehatiye girtin.

1. Kesek wekî min qet jar û perîşan nebe ya Reb  
Kesek nebe esîrê derdê eşq û birîndarê hicranê ya Reb
2. Ez her tim ji destêن pûtêن bêrehm pir cefayê dikêşim  
Ti misilmanek qet nebe esîrê van kafiran ya Reb
3. Ew dilber ji bo qetla min her tim bi fikar e  
Bila ji wê fikarê qet pişman nebe ya Reb

4. Zilm û derdê wan ji min re adet bû û min xwe pê girt  
Bila zilm û zordarîya wan qet bi dawî nebe ya Reb
5. Herçiqas ji bo me bêçareyan, bê edalet û insaf in jî  
Bila ji bilî wan li textê dilê min kes nebe sultan ya Reb
6. Ji kevan û qews û birûyan, tîribaran e ji xemzan  
Ev dilê birîndar ji sertîran, qet vala nebe ya Reb
7. Pertew te di quンca meyxaneyê de ji sihetê quncikek dît  
Ew quncik ku te tê de tehsîl kir, qet wêran nebe ya Reb

Ger em van malikên ku bi nezmê hatine nivîsîn têxin forma nesrê (pexşan) û bi Kurmancîya sade lê hûr bibin û me'neya wan şîrove û tehlîl bikin em ê bigihêjin vê encamê: Li vê derê helbestkar di xezela xwe de bangî Xwedê dike. Helbestkar; di van malikan de bi aşkereyî dide xuyakirin ku naxwaze ji van êş û kederên xwe xelas bibe, ew dixwaze bi van êş û kederan re bijî. Ji bo evînê mirinê dide ber çavêن xwe. Ditirse ku yara wî dev ji kuştina wî berde û ji ber vê yekê jî bi endîşe ye. Ew dixwaze ji ber derdê evînê bimire û wenda bibe. Evîna li vir evîneke yekalî ye (platonîk e). Di tesewifê de evîndar di vê bawerîyê de ne ku ger ji ber derdê evînê jîyana xwe ji dest bidin, ew ê bi Xwedê ve bibin perçeyek. Di malikên vê xezelê de hin bêjeyên tesewifi yêne weke meykede û kunc/qunc derbas dibin. "Meykede/Meyxane" di tesewifê de tê maneya "dergeh-tekyâ"yê, ji ber vê jî di tesewifê de ev der cîyekî pîroz e û li vê derê evîna Xwedê dikeve dilê 'evdan. Helbestkar dema ku li dergehê bi tenê dimîne, xwe di nav aramîyê de hîs dike. Helbestkar xwestiye van tiştan bi me bide zanîn. Ev xezeleke tesewifi ye, lê hêmanên xezela aşiqane jî tê de hene, unsûrên tesewifi û aşiqane bi hev re hatine bikaranîn û têkelî hev bûne.

111

Ali Nîhat Tarlan li ser peyvîn "but" û "kafir" ku di vê xezela Fuzûlî de derbas dibin weha dibêje:

Ji bo evîndaran kişandina derdê eşq û veqetîna ji yarê weke mezîyetekê, weke taybetîyeke mezin û payebilind e. Daxwaza wan ya sereke nalîn û perîşanî ye, lewra bi vê yekê amanc ew e ku bigihêjin mertebeyeke bilind. Di edebîyata klasîk de but li dewsa dîlber û xweşikahîyê tê bikaranîn, kesê/a xweşik jî li ser rûyê erdê nîşane û zihûreke ji Xwedê ye û gava but ji bo tiştekî bêcan were bikaranîn ev dibe kufir. Ji ber ku kufir bêcan e û xwe weke Xweda dide qebûlkirin, but û xweşik bi xweşikahîya xwe ya madî ve xweşikahîya Xwedê dinuxumîne û ji ber vê yekê jî ew dibe kafir. Kafir tê maneya kesen dinuxumîne. Ji ber ku ev xweşik jî evîndaran ber bi xwe ve dikişînin, dibin sedema veqetînê. Ev yek jî ezîyet û cefa ye. Evîndarênu ku tama xweşikahîyê nas dikin û pê ve, têñ girêdan û ew evîndar ji bo ku ji mecazê derbasî rastîyê bibin gelekî êş û ezîyetê dikişînin. Cewr û cefaya butan ev e. Bi gotina ku dibêje "bila Misilmanek nebe hêşîrê van kafiran" jî tê vê maneya ku naxwaze Misilmanekî ku namzedê gihaştina heqîqetê ye, bibe hêşîrê vê xweşikahîya mecazî. Mertebeya herî dawî ya êş û ezîyetê hêşîrketina di destêñ kafiran de ye (Tarlan, 2013:91-94).

Peywira xweşikahîya mecazî dûrxistina aşiq ji alema madî ye û têkilîya wî ya manewî ji cîhanê qutkirin e. Yanî bi awayekî manewî kuştina evîndar e (Tarlan, 2013:92). Lewra evîndar jî li vê derê

kuştina xwe dixwaze. Îş û ezîyeta sertîran ji helbestkar re ew qas şérîn hatiye ku êdî qet naxwaze ew sertîrên ku di dilê wî de hatine çikandîn, derkevin. Yanî naxwaze ji derdê vê evînê were xilaskirin û mirina xwe tercîhî vê yekê dike, yanî tercîhî derketina sertîran dike. Li vê derê sertîr êşa eşqa wî ye ku ji alîyê yarê ve hatiye dayîn.

Meyxane xezîneya eşqa îlahî ye û şerab jî eşq û evîna îlahî ye (Tarlan, 2013:94; Kaplan, 207: 245-251). Ev evîna îlahî ji ya mecazî gelekî cuda ye û jê biqîmet û binirxtir e. Helbestkar xwestiye bibêje ew di eslê xwe de ne meyxaneyeke, lê ew milkekî pîroz e û ji Xwedê dixwaze ti zerar negihêje wî milkî. Ew milk ji helbestkar re cihê kêfxweşî û dilşadîyê ye. Herweha kunc/genc jî ji helbestkar re cihê bi qîmet û şanazîyê ye ku li wir digihêje zengîneyekê.

### 3.3. Ji Alîyê Nezîre, Întîhal û Wergerê ve Analîz û Berawirdkirina Herdu Xezelan

#### 3.3.1. Ji Alîyê Nezîreyê ve Analîz û Berawirdkirina Herdu Xezelan

Di van xezelêni li ber destêne me de; du dem, du helbest, du helbestkar, du ziman; lê yek mijar û yek ma'ne heye. Weke tê dîtin ku ev xezela ku li jor bi du zimanan hatiye nîşandan, bi eslê xwe ji alîyê Fuzûlî û bi Tirkiya Azerî hatiye nivîsin. Lê di vir de jî wergera wê ya bi Kurdiya Kurmancî ji hêla Pertew Begê Hekkarî ve bi awayekî serkeftî û hunerane hatiye kirin.

Di edebiyata klasîk de ji bo helbestan bi dehan şerh, nezîre û cûreyên nezîreyê hatine nivîsin. Di helbesta klasîk de ev bikaranîn wek kevneşopîyekê dîhate dîtin û di dema me de jî ev kevneşopî kêm zêde didome (Köksal, 2018:105-111). Gava em li edebiyata klasîk dinihêrin em dibînin ku di sed salêne dawî de jî bi vê kevneşopîyê berhemên bi vî rengî hatine dayîn.

Bi heman serwa, paşserwa û kêşê ve hin riste li helbestekê bênen zêdekîn jê re “nezîre” tê gotin (Köksal, 2018:15-24). Yanî bi heman teşe û kêşê ve helbestek an hin riste li helbesteke dinê bênen zêdekîn an jî di çarçoveya hin prensîban de pê re bê şibandin nezîreyê pêk tîne. Bi piranî serwa, paşserwa, kêş, tema û ifade di nezîreyan de bi helbesta bingehîn re hevpar in.

Di çavkanîyan de bi gelempêrî derbarê nezîreyê de kêm zêde weha tê gotin: Nezîre ji peyva Erebî ya “nezr”ê hatiye çêkirin û bi maneya “şibandin û wehkevî”yê ye. Nezîre ew helbest e ku ji alîyê helbestkarekî/ê bi heman yekeya nezmê, bi heman kêş, serwa û paşserwayê ve weke helbestekê hatiye nivîsin.

Ji karê nivîsîna nezîreyê re jî “tenzîr” tê gotin. Di helbesten bi vî rengî de divê mijar jî heman bin. Di edebiyata klasîk de ji bo nezîreyê girîngîyeke zêde hatiye dayîn. Hema hema her helbestkarî ji helbesten helbestkarêni berîya xwe û yên hemdemên xwe re nezîre nivîsîne û bi vê rîyê xwestine hunera xwe pêşkêş bikin û pesnê xwe bidin. Di edebiyatê de nivîsîna nezîreyen ji helbesten helbestkarêni hoste re bûye sedema çêbûna kevneşopîyekê. Nezîreyen ku ji şibandina hin helbestan derketine holê gelek in û hin ji wan nezîreyan ji helbesta çavkanî serkeftitir û hêjatir jî derketine holê. Herweha nezîre ne teqlîdek ji rêzê ye (Kaplan, 2017:38-39; Köksal, 2018:15-24).

Di edebiyata klasîk a Tirkî de yekî/a ku nezîre li helbesta Fuzûlî nekiribe hema hema tune ye. Her

helbestkarê edebîyata Tirkî ya klasîk bûye heyranê hunera Fuzûlî û piranîya wan helbestkaran li helbêtên wî nezîre nivîsîne. Feqet ya ku Pertew li vir kiriye herçiqas taybetîyêne nezîreyê di xwe de vedi-hewîne jî ne nezîre ye. Di helbesta klasîk de em wê weke wergereke orîjînal dibînin û divê ev werger weke wergereke serkeftî bê hesibandin. Ji ber ku Pertew hemû helbest wergerandiye zimanekî dinê û perçeyêne nû li helbestê zêde nekiriye me ev bi nezîreyê nehesiband û me ew rasterast bi wergereke edebî û serkeftî qebûl kir.

Gava em bala xwe didin berhemên wan em dibînin ku hin helbestkarêne edebîyata klasîk, herî kêm bi du zimanan dizanibûn. Hin ji helbestkarêne wê demê yên Kurd zimanêne weke Erebî, Farisî û Tirkî jî dizanibûn. Herweha nivîskarêne biyanî jî bi çend zimanan dizanibûn û ji tezkîre û berhemên wan jî tê fehmkirin ku helbestên helbestkarêne hevdemên xwe û yên berîya xwe jî dişopandin. Em ji nezîre, şerh û wergerên heyî jî dikarin vê peyrewî û şopandina vî tiştê ku bûbû weke kevneşopîyekê bi hesanî bibînin. Lewra em dikarin bibêjin ku ev wergerên helbestên wê dewrê ku ji zimanekî ji bo zimanekî dinê hatine kirin di çarçoveya vê kevneşopîyê de ne û bi piranî jî bo pesn û hunerê hatine kirin. Çawa ku helbestkaran ji bo hunermendî û zanîna xwe derxînin pêş serî li şerh û nezîreyê dane; her weha dîsa ji bo pesn, huner û zanîna xwe îsbat bikin, serî li werger û adapteyan jî dane û ev xezel jî ji bo wergera helbestan mînakeke xweş ya vê kevneşopîyê ye. Em dikarin ji bo têkilî û danûstandina di navbera herdu edebîyatan de mînakêne wergerên helbestan zêdetir jî bidin.

Em dizanin ku di sedsala 19an û 20an de jî kesêne weke Xelîl Xeyalî, Mihemed Mihrî û Keyfî jî wergerên helbestan kirine (Adak, 2015:75-110; Veroj, 2017:113-120). Xeyalî bi helbestkî û ji Tirkî ber bi Kurdiya Kurmancî ve; Keyfî û Mihrî jî bi pexşankî û ji Hewramî û Soranî ber bi Tirkî ve wergerên xwe kirine.

Ev fikra ku me di mijara wergerên edebîyata klasîk de anîye ziman bi van ifadeyêne Ayhan Tek jî tê piştarstkirin: "Di edebîyata klasîk de şairan "kevneşopîya Îranê" bi rîya wergerê adapte kirine û bi vê rîye hem atmosferike edebî hem jî berhemeke edebî derxistine holê. Çunkî di edebîyata klasîk de weke kevneşopîya nezîreyê, kevneşopîya wergerê jî roleke mezin pêk anîye û ji bo şair bûye rîya bidestxistina berhem û zewqeke edebî. Metnên werger yên ku em di edebîyata klasîk de dibînin, ji metnên werger ên modern cudatîr in. Çunkî werger metna ku bi rîya wergerê bi dest xistiye ji xwe re weke berhemeke telîf dibîne. Ji ber vê yekê wergerê ku di heman demê de şair e jî vî tiştê ku werdi-gerîne û radigîhîne weke wergerê nabîne û wî tiştî weke telîfî dibîne (Tek, 2018:101-102). Herçiqas ev kevneşopîya ku Tek jî di nav de ji alîyê hin lêkoleran ve hatiye ziman ji bo mesnewîyê be jî em dibînin ku ev ifade ji bo helbestkarêne ku helbest wergerandine zimanekî din jî derbasdar e.

Ev wergera Pertew me ji tiştîkî din jî agahdar dike, ew jî ev e ku Pertew di dema xwe de helbestkar û edebîyatêne zimanêne din ên berîya dewra xwe jî şopandine û ji helbestkar û edebîyatêne heyama berê jî agahdar bûye. Ew edebîyat, ne tenê edebîyata Kurdi ye û ew helbestkar jî ne tenê yên Kurd in. Bi saya vê wergerê em dizanin ku Pertew, edebîyat û helbestkarêne biyanî jî şopandîye û bi şopandinê tenê nemaye, heta ji wan werger jî kiriye û ev xezel jî ji bo vê yekê mînakeke baş e.

### 3.3.2. Ji Aliyê Întihalê ve Analîz û Berawirdkirina Herdu Xezelan

Întihal, bêjeyeke Erebî ye û ji koka “nahî”ê hatiye dariştin. Întihal, bi awayekî neheq xwedîderketi-na li berhemekê ye. Heke ji alîyê kesekî ve ji berhemên nivîskar û helbestkarêne din nivîs, beş, perçe an ji riste bênen sitandin û weke malê kesekî din bide xuyakirin, ji vê yekê re întihal (dizi) tê gotin. Întihal, jêgirtin an jî îlhamgirtin, ji berê ve qada edebiyatê mijûl dike. Întihal mijareke wisa ye ku îsbatkirina wê gelek zor û zehmet e. Zehmetiya wê jî ji vir tê ku tesbîtkirina sînorêne wê ne hêsan e. Bi piranî întihal di berhemên biyanî de çê dibin, çunkî tesbîta întihala berhemên bi zimanê biyanî ji yên din dijwartir e (Karataş, 2005:67).

Gava fîkr û berhemên kesen din û nivîsen jêder, nekevin nav dunikan (“ ”) û bêyî nîşandayîna jêder û çavkanîyan were nivîsandin û hwd. dibe mijara întihalê. Ger ev întihal di warê helbestê de be ji wan kesen ku ev kar kiriye re “duzd-î suxen” (dizê peyvê) tê gotin û ji wî karî re ku hatiye kirin jî “sîrqet-î şîr” (dizîya helbestê) tê gotin. Ji dizîya bêguhertin re întihal û ji ya biguhertin re “îgare” yan jî “mesh” tê gotin û ji dizîya ma’neye re jî “îlmam” tê gotin (Mevlevi, 1994:67-70; Develioğlu, 2003:443; Karataş, 2005:65-68; Pala, 2007:233-234; Türk Dili ve Edebiyatı Ansiklopedisi, 1981; Kaplan, 2017:39-98). Eger berhem û ramanen kesen din bêyî çavkanî, bi awayekî din bênen nivîsin an vegotin ev jî dibe întihal. Ji bo ku ev tişt nebin întihal divê ji xwedîyen berheman destûr bê stendin û navêne wan di çavkanî û jêderkan de bênen destnîşankirin (Tosun, 2005:86-90).

Ji van danasînan jî tê fêhmkirin ku bikaranîna tiştekî bêyî destûra xwedîyê wî/ê û dîsa ji veşartina navê xwedîyê wî/ê tiştî re “întihal” tê gotin.

Weke tê dîtin ku ev xezela mijara vê xebata me bi eslê xwe ji alîyê Fuzûlî û bi zarevayê Azerî hatiye nivîsin. Lê di vir de jî wergera wê ya bi Kurdî ji hêla Pertew Begê Hekkarî ve bi awayekî xweş û hunerane hatiye kirin. Ji ber ku Pertew Beg di dawîya vê xezelê de ne mexlesa “Fuzûlî”, lê mexlesa xwe “Pertew/Perto” bi kar anîye; ji alîyê întihalê ve gumanek peyda dibe. Lîbelê em dibînin heman tişt ji alîyê Fehmî Begê Pêçarî ve jî hatiye kirin û ev yek jî teza me xurttir dike ku ev tişt kevneşopî ye û ne întihal e. Eger Pertew mexlesa Fuzûlî bi kar anîbûya me yê rasterast bigota ev bûye werger, lê ev tişt di vir de pêk nehatiye û Pertew mexlesa xwe di xezelê de bi kar anîye. Li vê derê divê em li bersiva hin pirsên din jî bigerin.

Di heyama kevn a edebiyata klasîk de gelo helbestkar û wergêren helbestan bi kîjan rîbazê navê xwe û navê nivîskarê metnê di bin wergerê de didan nîşandan? Bersiva vê pirsê hîn bi awayekî zelal derneketiye holê û ev mijar baş nehatiye tesbîtkirin. Ji alîyekî dinê ve jî hêj di mijara wergera helbestan de jî di nav edebiyatnas û rexnegiran de jî nîqaş berdewam in û lihevkirinek derneketiye holê. Li gorî nîrînekê helbesta ku ji zimanekî bê wergerandin li ser zimanekî din, êdî ew helbest ji nû ve tê dariştin û herweha ew helbest jî dibe helbesta wergêr ango ew dibe telîfa wergêr. Nîrîneke din jî jîxwe berevajî vê yekê ye û karê ku tê kirin jî weke wergerê dibîne û wî karî bi tenê werger dihesibîne û ew weke telîf nabe malê wergêr (Özgül, 2005:52-64).

Feqet pirsek din jî heye, gelo di wê heyamê de (dewra Pertew) agahîya wan helbestkarêne Kur-dînûs ji întihalê hebû yan tunebû? Belê haya wan jê hebû, weke nimûne Melayê Cizîri (1570-1640) (Dilovan, 2013:300) berîya Pertew jîyaye û Mela ‘Elî ‘Ilmî Zîla (1923-1995) (Zivingî, 2012:122-123)

jî piştî Pertew jîyaye û ev herdu helbestkar ji wan helbestkaran du kes in ku haya wan ji intîhalê yanî dizîya berhemên edebî hebû û li ser intîhalê jî helbest nivîsîne. Lîbelê tişte Pertew li vir kiriye werger e û Pertew jî di çarçoveya kevneşopîya pesindayîna hunerê de ev wergera nuwaze pêşkêş kiriye.

Nêrîna me ev e ku bi piranî helbestkarê wê demê tenê bi çavêن hunerê li van wergeran nêrîne û daxwaza wan jî tenê pêşkêşkirina zanîn, huner, pesn, zîrekî û danberhevkirina hunerê bûye. Ji ber ku Pertew di xaneya texelusê de mexlesa xwe bi kar anîye ev yek nikare weke intîhalê bê hesibandin. Lewra mexles di wê heyamê de weke îmzeyê dihat bikaranîn û bi vî awayî dihat zanîn (Kurnaz & Çeltik, 2011:3). Ger mexles tune bûya me yê bi awayekî tequez nekarîba idia bikira ku ev werger ya Pertew e. Bi saya mexlesê ev idiyaya me xurtir û tekûztir dibe ku ev wergereke Pertew e û tê dîtin ku ev helbest wergereke gelekî serkeftî ye.

Berîya ku helbestkarek bi intîhalê were sûcdarkirin divê kesê wî sûcdaрirin dike pêşî termînolojî û cîhana kevneşopîyê baş bizanibe. Li gor ku M. Kayahan Ö zgül dibêje, "Kevneşopî, kesen ku ji bo helbesteke yekî/a din bigota ya min e, ew kes bi tenê bi intîhalê sûcdaрir dikir. Lîbelê di mekanekî weha de ku danûstandina helbesten heman çandê hebûn ev yek jî tiştekî tebiî û asayî dihat dîtin û wergirtinêni ji hev û din û wergirtinêni ji kesen berîya xwe intîhal nedihat hesibandin" (Ö zgül, 2005:58).

Di helbestê de divê li ser wergeran jî bi baldarî bê sekinandin ku weke çavkanîya intîhalê tê bilêvkirin bi baldarî bê sekinandin. Çunkî di helbesta edebîyata klasîk de kevneşopîyeke heye û divê ev kevneşopî neyê piştguhkirin.

Ö zgül mafê xwedî derketina li metnê wergerandî dide wergêr û vê yekê weha ïzah dike:

115

Kevneşopî, bêyî ku li dirêjahîya metnê binêre destûrê dide mutercîm ku xwedîtiyê li metnê ku bi reya tercumeyen ku ji Erebî û bi taybetî jî ji helbesta Ecem hatine standin bike. Bi tenê berpirsyarîyeke şairê mutercîm heye, ew jî ev e ku wergera wî ji alîyê ma'ne û bilêvkirinê ve ji zimanê berhema orijinal xweştir be. Aşkerenekirina tercumeya şîir, rîzik an jî fîkrê ne li dijî exlaqê poetîkaya kevneşopîyê ye. Nîşandayîna wê jî dibe iqtîbas û wê demê jî êdî li holê curmeke ku dê bi intîhalê were sûcdarkirin namîne. Bi temamî ji ber vê sedemê ye ku gava di sedsala XIXan de di helbesta Rojava de tercume hatin destpêkirin; an dê tercumeyen gelek helbestan nehatana nîşandan an jî dê berhem di bin navê mutercîm de bihatana weşandin (Ö zgül, 2005:63).

Ö zgül, derbarê werger û wergêran de weha didomîne û dibêje, "Herçiqas her tercume û mutercîm nebe jî; şîrîn ku ketibe desten şairen mutercîm ên hostile ûdî ew şîir ji nû ve tên dariştin û ji ber vê yekê divê ew weke berhemên kesen mutercîm werin hesibandin. Bi kurtî şairê ku sûdê ji şîra kesekî werbigre û di bin fîkr, hêma/îmge û nukteya şîra wergirtî de neeciqe û bikaribe wê şîrê bi pêşdetir bibe û xweşiktir bike ew şair ne diz e" (Ö zgül, 2005:63-64).

Li gorî Ö zgül divê intîhal di nav poetîkaya şîra klasîk de were nirxandin. Ö zgül radîgihîne ku intîhal bi maneya îro di sedsala XVIIIem de ketiye edebîyata Rojhilat û Rojava û şair wê demê li ser intîhalê sekinîne. Di çaryeka duyem ya sedsala XIXem de jî di navbera şairan de ev fîkra intîhalê bi hêz bûye û bûye sedema endîşeya şairan (Ö zgül, 2005:57-60). Di edebîyata Kurdî de weke nimûne di sedsala 16em de em bi Melayê Cizîri re û di sedsala 20em de jî bi Mela 'Elî 'Ilmî (Zila) re rastî vê

endîşeyê têñ ku wan jî ev mijar di helbestêñ xwe de anîne ser ziman.

Turan Karataş jî dibêje Cemil Çiftçi nivîsiye li ser şêwaza intîhalkirinê di heyameke ku metbea tunebû û her tişt bi hêsanî û bi lez nikarîbû bihata zêdekirin û qeydkirin encex bi destan dihat kirin. Karakaş jî Çiftçi weha radighîne, “Nivîskarên tezkîreyan û şair rê nadîn teqlîd û dizîya şîfran; itîbara xwe bi şairên weha nînin. Kîjan şair rastî neheqîyê were û kîjan şîfr were dizîn, vê yekê aşkere dikin û şerma wan li rûyê wan dixin” (Karataş, 2005:67). Tişte ku Karataş û Çiftçi anîye ziman em dibînin ku ji alîyê helbestkarekî Kurd ve jî hatiye tetbîqkirin. Melayê Cizîrî di helbesta xwe de helbestkarekî din bi diziyê itîham dike û vê yekê bi rêya helbesteke xwe tîne ser ziman. Di çarçoveya vê zanyarîyê de jî em dibînin ku li ser helbestkarê berê çavek heye û biçûk be jî venêrîn û kontrolek hatiye kirin. Ev kontrol û rexne jî bi rêya berhemên nivîskî yêne weke helbest û tezkîreyan jî hatiye kirin.

Tahîr-ul Mewlewî jî radighîne ku bi rêya tercume û neqla maneyê ve pejirandina fikrekî, îxtîlaf e ku bi intîhalê were hesibandin. Herweha Mewlewî xwe dispêre Mola Camî û dibêje gava ku uslûb û ziman were guhertin ew nabe intîhal (Mevlevi, 1994:67-70).

Fuzûlî di edebiyata klasîk a Rojhilata Navîn de yekî pir bi navûdeng û bi huner e; mîna Şîrazî, Xanî, Cizîrî, Baqî, Heyyam û Mewlana meşhûr e. Ev xezela ku Fuzûlî nivîsiye jî xezelek pir hunerane û gelekî meşhûr e. Jixwe helbestkar bi armanca ku hunermendîya xwe derxîne holê helbestan dinivîse. Ji bo ku bikaribe hunera xwe nîşan bide li ser helbestêñ helbestkarê binavûdeng nezîreyan dinivîse û heta helbestêñ wan ên gelekî xweş û hunerane jî werdigerîne ser zimanê xwe yê ku pê dinivîse.

116

Di edebiyata Kurdî de em dibînin ku bi vî rengî Pertew Begê Hekkarî û Fehmî Begê Pêçarî (Namî) (1910-1969)<sup>29</sup> ev kevneşopî dewam kirine û xwestine hunera xwe bi rêya wergerandina helbestêñ Fuzûlî jî nîşan bidin. Lewra ew, helbestêñ Fuzûlî diecibînin û ji bo wan helbesta Fuzûlî pîvaneke hunerê ye. Pêçarî (Namî) xezeleke heft malikî ya Fuzûlî texmîs kiriye û di heman demê de ev xezel wergerandiye Kurdiya Kurmancî jî. Em bi vê yekê dibînin ku Fuzûlî bandor li Fehmî Begê Pêçarî jî kiriye. Herweha çawa ku Pertew Begê Hekkarî li cihê mexlesa Fuzûlî mexlesa xwe “Pertew” bi cî kiriye, bi heman awayî Fehmî Begê Pêçarî jî mexlesa xwe ya “Namî” di benda mexlesê de bi kar anîye û mexlesa “Fuzûlî” jê derxistiye. Malika ewil û ya dawî ya vê xezela Fuzûlî weha ye:

1. Aşıyân-ı murg-ı dil zülf-i perîşanundadur  
Kanda olsam ey perî gönlüm senün yanundadur
  
7. Ey **Fuzûlî** şem'-veş mutlak açılmaz yanmadan  
Tablar kim sünbülünden rişte-i cânundadur (Tarlan, 2013:244-246)

Texmîsa Namî ji heft bendan ve pêk tê. Di texmîsê de her sê risteyêñ serî yêñ Namî ne û her du risteyêñ dawî jî yêñ Fuzûlî ne. Serwaya texmîsê: aaa(aa), bbb(ba)... ye. Benda ewil û ya dawî ya Fehmî Begê Pêçarî (Namî) jî weha ye:

29 Namî, yek ji mexlesa Fehmî Begê Pêçarî (Hasan Akgül) ye û ev helbestkar li gundê Pêçara Liceya Diyarbekirê hatiye dunyayê û ew jî ji malbateke mîr tê û “Beg”bûna wî jî wir tê. Di sedsala 20. de bi terza klasîk bi Kurdiya Kurmancî li gorî kronolojiya elîfbayê dîwanek helbestan nivîsiye (Demir, 2019).

1. Meşriqê amalê qelbim çeşmê tabanê tu da  
    Gonçêê bext û umîdem le'lê xandanê tu da  
    Menbe'ê abê heyatim cahê zenexdanê tu da  
    Aşıyanê murgê dil zulfê perişanê tu da  
    Ger li kû bî ey perî dil min di seyranê tu da
7. Namiya fariğ nemayî her çiqas ez naleyan  
    Çunkê tabê dil nehin bê cewr û ba işkenceyan  
    Bernede destê umîd ez damenê durdaneyan  
    Ta bibînî nazenînê der şibak û baceyan  
    Pê dizanî muştlaqa yar can e der canê tu da (Demir, 2019:105-106)

Pertew jî Namî jî xwestine li ser xezelê navborî yên Fuzûlî hunermendîya xwe bidin xuyakirin û bi vê mebestê bi şarezayî ev xezelê navborî wergerandine ser zimanê xwe. Her duyan jî bi zimanê hunermendîya xwe xwestine bibêjin; va ye em jî hespê xwe di vê qada hunerê de dibezînin, em jî ne kêmî Fuzûlî ne, em jî dikarin mîna Fuzûlî helbestan binivîsinin û em jî ji çend zimanân fêhm dîkin û wan dizanin. Ji ber hindê meqseda Pertew û Namî ji van helbestan ne întîhal e, belkî pesn û nîşandana şiyana xwe ya di nezmê de ye.

Gava em qaîdeyên kevnoşopîya edebîyata klasîk li ber ber çavan digirin; em vê xezela ku Pertew wergerandiye Kurdiya Kurmancî bi întîhalê nahesibînin. Lewra ev wergereke ji zimanekî din e. Mexles îmzeya helbestkar e, ji bo ku Pertew mexlesa xwe di xezelê de bi kar anîye, dibe ku întîhal were bîra mirovan. Lîbelê ger ev mexles tunebûya me yê bi awayekî teqez nikarîba bigota ev werger ya Pertew e. Ji vî alîyî ve jî bikaranîna vê mexlesê karê me hêsanîr dike, ne ku dijwartir. Di heyama Pertew de haya helbestkaran ji hev û ji întîhalê hebû. Fuzûlî şâirekî gelekî bi nav û deng e û berhemên wî jî tê naskirin, ji bo helbestkaran jî zehmet e ku malê kesekî meşhûr bidize û li ser navê xwe belav bike. Ne pêkan e ku haya helbestkarê din ji dizîyeke weha çê nebe û vê yekê bi rîya tezkîre û helbestan neynin ziman. Ger ev yek weke dizîbihata qebûlkirin dê ji alîyê helbestkar û tezkîrenûsên heyamê û yêni piştî wê heyamê ve bihata rexnekirin. Herçiqas di edebîyata Kurdi de em hêj rastî tezkîreyan nehatine jî, lîbelê em dizanin ku tezkîrenûsên biyanî derbarê nezma Kurdi de jî nirxandinên xwe kirine (Bnr. Adak, 2015:79). Herweha heta niha tezkîre jî di nav de em di berhemên nivîskî de ne ji bo Namî ne jî ji bo Pertew rastî rexneyeke bi vî rengî nehatine. Lewra Pertew dikare xwedîtiyê li vê xezelê bike û mexlesa xwe li binê wê bi cî bike. Çunkî Pertew wergêrê vê metna edebî ye û ev karê wergerê jî di çarçoveya edebîyata klasîk de weke tradisyonekî tê dîtin. Pertew jî di çarçoveya vê tradisyonê de kedek daye û ev xezel wergeradiye zimanê xwe. Mafê wî heye ku îmzeya xwe jî biavêje binê vê kedê.

117

### 3.3.3. Ji Alîyê Werger, Huner û Uslûbê ve Analîz û Berawirdkirina Herdu Xezelan

Werger ji ber ku bi ziman re rasterast têkildar e û destekê dide pêşketina çand û zimên. Werger di her dewra mirovahîyê de bal kişandiye ser xwe û ji bo pêşketin û belavbûna çand û zanistê di her dewrê de hatiye bikaranîn.

Di zanista zimannasîyê de werger weha tê nasîn; Werger veguhestina metneke ji zimanekî bo zi-

manekî din e. Ji van zimanan û zaraveyan ve yek jê zimanê çavkanî û yê din jî zimanê di hedefê de ye. Werger di navbera zimanan de bi devkî an jî bi nivîskî dikare bê kirin. Bêjeya "werger" bi bêjeya "tercume" ya Erebî re hemwate ye, "wergêr" jî dîsa bi bêjeya "mutercîm" re hemmane ye. Destpêka wergerê digihêjê berîya zayînê û wergera ewil ya nivîskî jî di tabletên Sumerîyan de xuya dibin. Werger ji daxwaz û pêwistîya tesbîta peyman û nivîsîn dînî yêni di navbera civakan de pêk hatiye. Civakên dîrokî xwestine peyman û metnêwan yêni dînî di zimanê din de jî bêñ dîtin. (Gündogdu, 2004:93-101; Sucu, 2006:125-148; Bîçkıcı, 2016:373-383).

Li gor Joh Dreyden (1631-1700) hin cûreyênen rîbazên wergerê hene ew jî ev in; *wergera bêje bi bêje* (moda mod), *wergera serbest û wergera teqlidî*. Dîsa li gor Dreyden werger hunereke bi *îdia*, hesas û dijwar e. Divê wergêr hakimê her du zimanan be. Li gorî Dreyden xala girîng ya serkeftina wergererekê ew e ku wergêr û nivîskarê wê nivîsîn divê di mijara afirandinê de di heman astê de bin û divê bikaribe karaktera nivîskar bide xuyakirin (Kızılhan, 2001:37-68).

Rifat Arya jî dijwarîya wergerê û bi taybetî jî dijwarîya wergera helbesta bi serwa tîne ziman û derbarê wergerê de weha dibêje:

"Rewşike nazik e ku *hûn hem* bikaribin metna orîjînal biparêzin û hem jî hêza vegotineke estetîk û hunerî ya zimanê xwe bi kar bînin. Serêşîya wergerê ya esas, ji nav van her du pirsgirêkan diçe der. Ev serêşî bêtir di wergera helbestê de, bi taybetî di helbesta bi qafîye de çêdibe. Wergêr mecbûr e qafîyeyê biparêze, dengen ku di zimanê wergerandî de saz dibin, divê bi qasî yêni zimanê orîjînal helbestane, nerm û herikbar bin. Gelo rewşa kesekî/e ku helbesta bi qafîye werdigerîne, hinekî naşibe ya wî dims-firoşî ku di her destekî wî de eyarek dims heye û divê bêyî ku yekî ji wan deyne, hem devê wan girêde û hem jî nerijîne! Ez dibêjîm rewşa wergêr ne bi qasî ya dims-firoş talûke be jî gelek zehmet e û bê guman pisporîya temam dixwaze. Eger bête qebûlkirin ku werger jî hunerek e, wê çaxê divê bête zanîn ku gelek girêk û pirsgirêkên wê, gelek kul û kurrederên *îcrakirina* wê jî hene. Lê wergerek ku qet nebe, divê ji bo destpêkê ji gelek pîvanên wê haydar be û hewl bide ku eslê metnekê dema tê bihîstin bandorekê dike, divê li ser xwendevanê zimanê wergerandî jî heman bandorê bihêle" (Arya, 2003:35-37).

Wergera ji zimanekî bona zimanekî din bi serê xwe hunereke payebilind e. Wergereke payebilind ji nivîsîna helbest, çîrok, romanê ne kêmtir e. Ew kesê/a ku nivîsekê werdigerîne, divê di hunera wergerê de xwedî têgihiştineke bilind û hakimê herdu zimanan be. Ger wergêr di vî karî de ne şareza be dê serkeftinê jî bi dest nexe.

Di çarçoveya van zanyarîyan de wergera Pertew, tiştekî din jî bi me dide zanîn. Ew jî ev e ku Pertew ne tenê bi Kurdî, bi zimanên biyanî jî zanibûye. Ji ber ku ev werger ji zimanê Tirkî bo Kurmancî hatiye kirin, em hîn dibin ku Pertew bi zimanê Tirkî jî zanibûye. Ev xezela ku Pertew wergera wê bo Kurmancî kiriye ne werger tenê ye. Her weha ev afirandineke jînûve ye, lewra zimanekî din e û wergererek gelekî serkeftî û payebilind e. Çunkî nivîsa wergera wê hatiye kirin ne nivîsek ji rîzê ye û ne cureyek ji pexşanê ye. Ev xezelek e ango cureyek ji helbesta klasîk e û wergera helbestan jî ne karekî hêsan e. Werger; huner, şarezayî, zanebûnî û kedeke mezin jê re divê. Karê wergera hunerane tecrû-beyê dixwaze. Divê wergêr di her du zimanan de jî şareza be û amûrên helbestê yêni weke kêş, serwa, paşserwa, melodî û herweha maneya bêjeyî û hevokî jî baş bizanibe.

Zimanê Pertew xweş tê fêhm kirin, uslûba wî jî xwerû û hunerane ye, lê ev xezel li gorî helbestên wî yê din ne xwerû ye, ji bo zimanê roja me jî hinekî giran tê û di nav vê helbestê de gotinên Erebî û Farisî zêde ne, lê li gorî heyama wî û kevneşopîyê jî ev yek asayî ye. Herweha ev ziman di ya Tirkî de jî heman e. Pertew ev xezel mîna ya resen (ya Azerî) bi serwa, paşserwa û kêşa erûzê wergerandiye Kurdî. Serwa, paşserwa û qalibê kêşa wergerê û ya resen jî mîna hev in û ev mînakek ji wergera edebî ye. Bi kurtasî Pertew ev xezel bi şarezayîyekê ji Tirkî wergerandiye ser Kurdiya Kurmancî. Di xezel Kurdî de me bala xwe da uslûb û zimanê wergera Pertew û me tê de ev taybetî tesbit kirin:

Taybetîyên devoka Hekkarî/Behdînan têde xuya ne, hin bêje jî taybetîyên vê devokê di xwe de dihewîne û herweha hin lêker jî li gorî devoka Hekkarî/Behdînan hatine kişandin: Lêkera "nebit" li gor vê devokê ye (Nebit = Nebe, mi = min, ji xeyrî = ji xeyni/ji bili, qe=qet, çu/çi=tu/ti). Ev hevok jî yek ji taybetîyên devoka Hekkarî/Behdînan e "... mi sultan her nebit ya Reb". Yanî ji min re Sultan ne lazim e. Weke tê dîtin ev hevok jî rengê vê devokê li ber çavan radixîne.

Wek ku di piranîya helbestên klasîk de heye di vê xezelê de jî peyvîn ji Erebî û Farisî hene. Weke mînak: Mecrûh, 'afiyet, tehsîl, 'edl, ebrû, peykan û sultân... Hin bikaranîn gramatîk yêng Farisî jî di xezelê de xuya dibin, weke van daçkan: "der xatir", "ez 'afiyet". Di vê xezelê de ji gihanekan bi piranî gihaneka «û» hatiye bikaranîn. Hin gihanekên din jî ev ïn: Eger/gerçî, meger. Di cîyekî de jî "ku" heye.

Mezmûnên edebîyata klasîk yêng hevpar hatine bikaranîn. Di taswîkirina yarê de ev mezmûn hatine bikaranîn: "but, kafir, dilber, sultan" Hin mezmûnên din jî ev in: "kevan, qews, ebrû, xemz, peykan, meykede, wêran" û hwd.

Ji bo ku kêş pêk bê di hin bêjeyan de guhertin (xistina tîp û kiteyan ango kurtkirina bêjeyan û hwd.) pêk anîye û di hinan de jî qertafîn vegetandekê bi kar neanîye. Weke: "qe=qet", "mi = min", bêçaran=bêçareyan, "dil mi = dilê min".

Di ya Kurmancî de ev lêker hene; Ne-b-it (awayê neyînî), bû-m, pê girt, kir û e (lêkera bûnê). Di ya Azerî de jî ev lêker hene; Ol-ma-sun (awayê neyînî), çek-tüg/k-üm, bu-dur, çik-ar-mak, çek-üp, çik-an, ol-sun, ol-ur, bul-di.

Di xezelê de hin cûreyêni ciwankariyê jî pêk hatiye: Ji bo mînandin/şibandinê (teşbih); Helbestkar yara xwe geh şibandiye "kafir, pût û zilmdaran" geh jî şibandiye "siltanan". Bi bêjeyêni "but, kafir, musilman û Reb" ciwankariya peyvîn têkildar / pêwendârî (tenasub) pêk hatiye û ev bêjeyêni têkildar di malikekê de û bi hev re hatine bikaranîn. Di bêjeyêni "kafir û misilman" de jî ji ber ku ji hêla maneyê ve ev bêje li dijî hev in, ciwankariya dijiti/dijwateyî (tezad) derketiye holê. Bi " ya Reb"ê jî bangî (nîda) pêk hatiye, lewra bêjeya "ya"yê bêjeyeke beneşanî ye û di wateya bangkirin û gazîkirinê de hatiye bikaranîn.

Ev helbest, ji ber ku hemû taybetîyên xezelekê di xwe de dihewîne, ji wê re "xezel" hatiye gotin. Ev xezel ji alîyê yekeya nezmê, şemaya serwayê, hejmara malikan û mijarê ve ne xezelek kêm e, ev hemû taybetî bi tevahî tê de hene. Ger di hemû malikên manzûmeyekê de heman mijar hebe û ew yekbûna mijarê bi aşkereyî di helbestê de were dîtin û hîskirin ji wê helbestê re helbesta "yek-aheng" û ji xezelê

re ji “xezela yek-aheng” tê gotin. Herweha ligel yekbûna mijarê hemû malikên helbestekê di heman hêz û xweşikahîyê de be ew ji dibe helbesta “yek-awaz” (Kurnaz & Çeltik, 2011:66; Sarac, 2013:49). Ji ber ku di nav malikên vê xezelê de yekîtiya mijarê heye dibe “xezela yekaheng” û herweha hemû malikên wê ji ber ku di heman hêz û xweşikahîyê de ne ji vî alî ve ji dibe “xezela yek-awaz”.

Hin ji ïzafet û bêjeyên hevpar ên edebîyata klasîk û herweha yên ku di vê xezelê de hatine bikaranîn li jêr hatine dayîn. Em di vê xezelê de dibînin ku di edebîyata klasîk de îfade û bêjeyên çanda hevpar ji gelek in. Gava em bala xwe didin vê wergera xezelê em dibînin ku Pertew li gorî kevneşopîya edebîyata klasîk tevgerîyaye û weke wergêr zêde midaxaleyî mezmûn û îfadeýen hevpar ên vê kevneşopîya edebîyatê nekiriye. Ji ber ku Pertew ji alîyê ruxsarî ve serwa, paşserwa û heman qalib bi kar anîye uslûba Fuzûlî ji parastiye û guhertinê mezin ji çê nebûne. Ev bêje û mezmûnên hevpar ên li jêr derbarê wergerê de ji fikrekê didin me. Ev bêje û ïzafetê di her du xezelan de hene ev in:

zâr û perîşân = jar û perîşan; yâ Rab = ya Reb; Esîr-i derd-i = Esîr û derdidarê; dâg-i hicrân = dağê hicran; bütler = butan; kâfirler esîri = Esîrê kafiran; endîşeden = ji wê endîşê'ê; Cefâsına û cevrine = cewr û cefaya; dil-i mecrûh = dilê mecrûh; meyhâne künçinde = kuncê meykedê; Cefâ vü cevr ile mu'tâdem = mu'tadî cewr; müselmân = Misilman; endîşe-i կatlümde = qetla, endîşe; derd = derd; peşîmân = peşemân; vîrân = wêran; pâyân = payan; ‘adli = ‘edl; ǵayrı = ǵeyrî; tahtina = textê; sultân = sultan; peykân = peykan; ‘âfiyet = ‘afiyet...

Herweha ji hêla maneyên xwe ve ji em dikarin van bêjeyan mînak bidin; “Wekî min = Benüm tek (Benim gibi), Qet = Hîç. û Pertew ji bo “ol mâh”a Fuzûlî “ew dilber” bi kar anîye.

### Encam

Ev xezela ku bi paşserwaya “Ya Reb” e û ji heft malikan pêk hatiye bi eslê xwe bi zaraveya Azerî û ji alîyê Fuzûlî ve hatiye nivîsin û di dîwana Fûzûlî ya Tirkî de ji cî digire. Gava em qaîdeyên kevneşopîya edebîyata klasîk li ber ber çavan digirin; em vê xezela ku Pertew ew wergerandiye Kurdiya Kurmancî bi intîhalê nahesibînin. Lewra ev wergereke ji zimanekî dinê ye. Pertew ji bo hunermendî-ya xwe pêşkêş bike ev xezel bi awayekî xweş, bi uslûbeke hunerî wergerandiye ser Kurdiya Kurmancî. Ya ku Pertew li vir kiriye ne nezîre û şerha wê ya bi Kurdi ye, em dikarin bibêjin ev bûye wergereke serkeftî.

Di nusxeyên Tirkî de du malikan di nav xwe de cî guhertine. Ji ber ku nusxeya muelîf di destêne me de tuneye, me çavkanîya vê guhertinê tesbît nekir. Herweha di wergera wê ya Kurdi de ji dîsa me dît ku cihê du malikên cuda di nav xwe de hatine guhertin. Dîsa ji ber ku yek nusxe di destê me de bû û ji ber nebûna nusxeya muellîf çavkanîya vê guhertinê ji me nekarî derbixista holê.

Herçiqas gava ku wergerê Pertew ev xezel wergerandiye Kurdiya Kurmancî û li şûna mexlesa “Fuzûlî” mexlesa xwe “Pertew”bi cî kiribe ji em vê yekê weke niyeteke xirab û intîhal nabînin. Herweha ev ne pexşanek e; lê helbestek bi kêş, serwa û bi paşserwa ye. Di edebîyata klasîk de ji tê dîtin ku werger weke kevneşopîyekê hatiye qebûlkirin û em vê yekê dîsa li ba Fehmî Begê Pêçarî ji dibînin ku wî ji xezeleke Fuzûlî wergerandiye Kurdi û paşê ew texmîs kiriye. Lêbelê wî ji mexlesa xwe ya “Namî” li şûna ya Fuzûlî bi kar anîye. Ev yek ji di Edebîyata Kurdi ya Klasîk de ji hebûna

vê kevneşopîyê piştarst dike. Ji ber ku daxwaza helbestkarên edebiyata klasîk herî zêde pêşkêşkirina huner, jêhatîbûn, pesindan û danberhevkirina zanebûnê bû; em jî vê wergerê wek întîhal nanirxînin û weke wergereke ku di çarçoveya kevneşopîyê de hatiye kirin, dibînin.

Ev xezel bi zelalî bandora Fuzûlî li ser Pertew dide xuyakirin. Jixwe gava hewla wergera berhemê kesekî/ê hebe, ew bi xwe ji bo bandorê dibe nîşaneyekê jî. Ger bandora berhemên Fuzûlî li ser Pertew çê nebûya û Pertew ev xezel neecibanda dê ew wernegeranda ser Kurmancî.

Pertew jî bi şarezayî li vir xwestiye hunermendîya xwe bide nîşan û bibêje; va ye ez jî ne kêmî Fuzûlî me, ez jî dikarim mîna Fuzûlî helbestan binivîsim û ez jî ji çend zimanî fêhm dikim û dizanim. Ji ber hindê meqsedâ Pertew ji vê helbestê ne întîhal e, belkî pesn û nîşandana şiyana xwe ya di nezmê de ye. Di wergera vê xezelê de ti kîmasî nayê xuyakirin û wergêr ji metnê re sadiq maye. Ev xezel ji bo têkilîya di navbera edebiyata Tirkî û Kurdî de nimûneyeke gelekî baş e.

Di vê xezela Pertew de bi gelempêrî taybetiyê devoka Hekkarî-Behdînî xuya dîbin. Tê de mez-mûnên edebiyata klasîk ên hevpar hatine bikaranîn. Wekî di piranîya helbestên klasîk de hene, di vê xezelê de jî peyvîn biyanî hene û bikaranîna van peyvan di edebiyata klasîk de hevpar e û ev tiştekî asayı ye.

Ev xezelek tesewiffî û lîrîk e. Pertew ev xezel mîna ya resen (Azerî) wergerandiye Kurmancî; bi heman serwa, paşserwa û kêşa erûzê ve mîna ya resen wergerandiye.

Ev werger me ji tiştekî din jî agahdar dike, ew jî ev e ku Pertew di dema xwe de helbestkar û edebî-yatêr berîya dewra xwe yê gelên cîranan jî şopandiye û ji wan agahdar bûye. Em ji wergerê têdigihêjin ku Pertew bi zimanê Tirkî (devok an jî zaraveya Azerî) jî zanibûye.

121

Herweha ev helbest têkilîya di navbera edebiyata Tirkî û Kurdî de jî hinekî li ber çavan radixîne û em pê dizanîn ku hinek berhemên Tirkî di mîrektyîn Kurd de jî tê dîtin ku yek ji wan jî dîwana Fuzûlî ye.

### Çavkanî

- Adak, A. (2014). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, (Çapa Duyem). Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Adak, A. (2015). Li Gorî Serdemên Tarîxî Têkiliyên di Navbera Edebiyatêrîn Kurdî û Tirkî yên Klasîk de. *Sempozyuma Edebiyata Berawirdî- Ji Duh Heta Íro di Edebiyatêrîn Tirkî û Kurdî de Texeyulên Nasnameyi-*. Mêrdîn: Weşenên Mardîn Artukluyê, (r. 75-110).
- Akyüz, K., Beken, S., Yüksel, S. & Cunbur, M. (1958). *Fuzûlî Türkçe Divan*, Ankara: Türk Tarih Kurumu Basımıevi.
- Alkan, A. T. (2010). Mimar Sinan'ın Ermeniliğine Dair. *Aksiyon Dergisi*. (*Gihadina Dawî*: 25.12.2015), <http://ahmetturankalan.com/yazi/mimar-sinanin-ermeniligine-dair/>
- Amêdî, S. B. (1978). *Pertew Begê Hekarî Dîwan*. Komara Íraqê, Bexdad: Wezareta Rewsenbîrî û Hunerê, Çapxaneya Dar-ul Huriyetê.
- Amêdî, S. B. (1991). *Pertew Begê Hekarî Dîwan*. Zeynelabidîn Zinar (Wergerandina ji tîpêr Ere-

bî). Tyskland/Bonn: Weşanê Rewşen.

Arya, R. (2003). Çend Gotin li ser Wergerê. *Kovara Kevan (Çapa Yekem)*. Stenbol: Weşanên sî (h. 6, r. 35-37).

Bıçkıçı, T. (2016). Çeviri Kuramı İşiğında Edebi Çeviri Eleştirisi. *Akademik Sosyal Araştırmalar Dergisi*. (Yıl: 4, Sayı: 24, r. 373-383).

Cizîrî, M. (2013). *Dîwan. (Çapa Sêyem)*. (Selman Dilovan Amd.). İstanbul: Weşanê Nûbihar.

Çelebî, E. (1965). *Evlîya Çelebî Seyahatnamesi* (cilt:3-4). İstanbul: Üçdal Neşriyat.

Demir, Y. (2019). *Dîwana Namî (Fehmî Begê Pêçarî)*: “Meğmuru ‘d-Dewawîn” Metn û Lékolîn. Mêrdîn: Teza Lîsansa Bilind a **Çapnebûyî**, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanêن Zindî yên li Tirkîyeyê, **Şaxa** Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.

Develioğlu, F. (2003). *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat*. Ankara: Aydın Yayınları.

Durmuş, İ.(2000). İntihal. İslam Ansiklopedisi. (22. Cilt, r. 347-350). İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı.

Fuzûlî, *Dîwan* (Tirkîya Osmanî), Nusxeya Fotokopî ya Destxetê: <https://sufiworld.com/divan-i-fuzuli> (Gihadina Dawî: 05.02.2021)

Fuzûlî, *Dîwan û Beng û Bade* (Tirkîya Osmanî), Nusxeya Fotokopî ya Destxetê: <https://sufiworld.com/divan-i-fuzuli-kitab-i-beng-u-bade> (Gihadina Dawî: 05.02.2021)

Fuzûlî. (2014). *Fuzûlî Türkçe Divanı* (2. Baskı). İsmail Parlatır (Yayına hazırlayan). Ankara: Akçağ yayınları.

Gündoğdu, M. (2004). Çeviride Kuram-Uygulama İllikisi. *Uluslararası IV. Dil, Yazın ve Deyişbilim Sempozyumu Bildirileri*. Çanakkale Onsekiz Mart Üniversitesi yay. (r. 93-101).

Hekkarî, P. B. (2006). *Dîwana Perto Begê Hekkarî*. Tehsîn Îbrahîm Doskî (Amd.), (Bi herfîn Ere-bî), Duhok: Weşanxana Spîrêz.

Hekkarî, P. B. (1945). *Dîwana Pertew Begê Hekkarî*, (Nusxeya Destxet a Kemal Badillî).

Hekkarî, P. B. (2011). *Dîwana Pertew Begê Hekkarî* (Çapa yekem). Tehsîn Îbrahîm Doskî, (Amd.), (Latînîzekirin: M. Xalid Sadînî-Îhsan Guzereşî). İstanbul: Weşanê Nûbihar.

Ilmî, M. E. (2012). *Dîwana Mela 'Eli 'Ilmî (Zila), Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*. Necatê Zivingî (Amd.), İstanbul: Weşanê Banga Heq, 2012.

İpekten, H. (2013). *Fuzûlî Hayatı Sanatı ve Eserleri*, (10. Baskı). Ankara: Akçağ yayınları, 2013.

Kanar, M. (2015). *Fuzûlî Dîvani* (1. Baskı). İstanbul: Ayrıntı Yayıncılık.

Kaplan, H. (2017). Divan Edebiyatında İntihal: Alıntı mı Çalıntı mı?, *Akademik Sosyal Araştırmalar Dergisi*. (Yıl: 5, Sayı: 40, r. 39-98).

Kaplan, Ü. (2007). *Divan Şiirinde Tasavvuf*, Ankara, Birleşik Yayınları.

Karahan, A. (1989). *Fuzûlî Muhiti, Hayatı ve Şâhsiyeti*. (İkinci Baskı). Ankara: T.C. Kültür Bakanlığı Yayıncılık, Başbakanlık Basımevi.

Karataş, T. (2005). ‘İntihal’ Terimi Etrafında Bazı Tesbitler. *Hece Dergisi*. Ankara: (hej. 107, r. 65-68).

Keyfi, “Gazel”, *Tercüman-i Hakikat Gazetesi*, no: 969, r. 2, 18 Şevval 1298 (13ê ilona 1881ê).

Keyfi, "Cevabnamî Manzûm", *Tercüman-i Hakikat Gazetesi*, no 974, r. 3, 25 Şevval 1298 (19ê ilona 1881ê).

Kızıllhan, R. (2001). Tarihte Çeviri. *Ankara Üniversitesi Dil ve Tarih-Coğrafya Fakültesi Dergisi*, Ankara: (41, 1, r. 37-68).

Köksal, M. F. (2018). *Sana Benzer Güzel Olmaz Divan Şiirinde Nazire*. İstanbul Büyüyen Ay yâynları.

Kudret, C. (1985). *Divan Şiirinde Üç Büyükler-I Fuzuli*, İstanbul: İnkilap Kitapevi.

Kurdî, M.B. (2010), *Dîwana Kurdî*, Mihemed Mistefa Hemebor (Amd), Hewlêr: Weşanxaneya Aras.

Kurdo, Q. (1992). *Tarîxa Edebyeta Kurdi*. Ankara: Özge Yayıncılar.

Kurnaz, C. & Çeltik H. (2011). *Divan Şiiri Şekil Bilgisi*, İstanbul: H Yayıncılar.

Macit, M., Ceylan Ö. & Yılmaz. O. (2015). *Klasik Dönem Osmanlı Nazmı*. İstanbul: Kesit Yayıncıları.

Mengi, M. (2016). *Eski Türk Edebiyatı Tarihi*. (23. Baskı). Ankara: Akçağ Yayıncıları.

Mevlevî, T. (1994). *Edebiyat Lügati*. İstanbul: Enderun Kitabevi.

Mewlewî, A. (1966), *Dîwana Mewlewî*, Mela Ebdulerîm Muderîz (Amd), Senendec: Weşanxaneya Kurdistan.

Nebez, J. (2013). Wergerandin Huner e. Kovara W. (h. 45, Rêbendar-Reşemî).

Özgül, M. K. (2005). İntihâlden Çalıntıya, İntikalden Alıntıya. *Hece Dergisi*. Ankara: (hej.7, r. 52-64).

Pala, İ. (2007). *Ansiklopedik Divân Şiiri Sözlüğü*. (15. Baskı). İstanbul: Kapı Yayıncıları.

Rûhanî, B.M. (2017). *Kürt Meşhurları Tarihi*, Hüseyin Siyabend (Edt). İstanbul: Hîvda Yayıncıları.

Sağrıç, F. H. (2002). *Dîroka Wêjeya Kurdî*. Stenbolê: Enstituya Kurdî ya Stenbol.

Saraç, A.E. (2018). *Fuzûlî'nin Farsça ve Türkçe Gazellerinin Aruz ve Kafîye Bakımından İncelemesi* (Basılmamış Yüksek Lisans Tezi). İstanbul: İstanbul Medeniyet Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı.

Saraç, Y. (2013). *Klasik Edebiyat Bilgisi; Belagat*, İstanbul: Gökkubbe Yayıncıları.

Sucu, N. (2006). Eski Türk Edebiyatında Tercüme Geleneği. *Türkiyat Araştırmaları Dergisi*. (r. 125-148).

Tarlan, N. (2013). *Fuzûlî Divanı Şerhi* (7. Baskı). Ankara: Akçağ Yayıncıları.

Tek, A. (2018). *Hâmîsiz Şâir Babasız Metin Mem û Zîn ve Osmanlıca Çevirileri Üzerine Bir İnceleme*. İstanbul: Nûbihar Yayıncıları.

Temo, S. (2016). Fuzûlî'nin Kürtçe Şiirleri. *Gazete Duvar*. <http://www.gazeteduvar.com.tr/kitap/2016/12/01/fuzulinin-kurtce-siirleri/> (Gihadina dawî: 20.01.2017).

Tosun, N. (2005). Yazar Taklidi. *Hece Dergisi*. Ankara: (hej. 107, r. 86-90).

*Türk Dili ve Edebiyatı Ansiklopedisi*. (1981). İstanbul: Dergâh Yayıncıları, (cilt: 4).


Veroj, S. (2014). Ji Dîwana Fuzûlî Ber Bi Nasnameya Wî Ve. *Kürt Tarihi*, İstanbul. (hej.12 r. 44-49).

Veroj, S. (2017). *Abdurehman Nacîm -Edîb, Şâîr, Perwerdekar, Hîqûqnas-*. Stenbol: İsmail, Beşikçi Vakfı Yayınları.


Yûsif, E. (2012). *Dîwana Kurmancî Şairên Klasîk ên Kurd*. (Latînîzekerin: Ziya Avcı), Stenbol: Weşanê Diwan.

Yüksel, M. S. (1972). Sohbetü'l-Esmar Fuzûlî'nin Değildir. *Türkoloji Dergisi*, (Cilt: 4, Sayı:1, r. 115-136).

**Pêvek-I:** Destxeta xezela Fuzûlî ya “Ya Reb”ê. (Nusxe: Qudbeddin el Kirmanî, r. 37-38)



**Pêvek-II:** Destxeta xezela Fuzûlî ya “Ya Reb”ê, (Nusxe: Mustensîx Nedîyar, r. 18-19).




**Pêvek-III:** Destxeta xezela Fuzûlî ya “Ya Reb”ê, (İpekten, 2013:253).

<p>بئم نئچ بیچ کیم زار و پر شان او لسوون یار بب اسیر در عشق و داعن هجران او لسوون یار بب بوکافر اسیر بی بر سلمان او لسوون یار بب که او اندیشیدن او اول پیشان او لسوون یار بب چقمن انسه لر تندن چاکیپ پیکانک اول سروک چخان او لسوون دل جروح بیکان او لسوون یار بب چفاو جور ایله مفتادم آنکه سر زن لوز حالم کوکل تختیتندن اندن او زک سلطان او لسوون یار بب دیگر کیم عدل یوق یا ظلی حق هرال ایله او لسوون یار بب</p>	<p>بئم نئچ بیچ کیم زار و پر شان او لسوون یار بب دامدم جورلر در چکدیکم بی رحم بسته دن کور ببندیشیدن قتلده او اول هایی بود در ددم چقمن انسه لر تندن چاکیپ پیکانک اول سروک چخان او لسوون دل جروح بیکان او لسوون یار بب چفاو جور ایله مفتادم آنکه سر زن لوز حالم دیگر کیم عدل یوق یا ظلی حق هرال ایله او لسوون یار بب</p>
<p>ضفولی بولدی کنج عافیت میخانه کجنه مبادرک ملکه اول ملک و پران او لسوون یار بب</p>	<p>ضفولی بولدی کنج عافیت میخانه کجنه مبادرک ملکه اول ملک و پران او لسوون یار بب</p>

Pêvek-IV: Destxeta xezela Fuzûlî ya "Ya Reb"ê. (Macit, Ceylan & Yilmaz, 2015:226).

<p>بئم نئچ بیچ کیم زار و پر شان او لسوون یار بب اسیر در عشق و داعن هجران او لسوون یار بب بوکافر اسیر بی بر سلمان او لسوون یار بب که بو اندیشیدن او اول پیشان او لسوون یار بب چخن او لسوون دل جروح بیکان او لسوون یار بب چفاو جور ایله مفتادم آنکه سر زن لوز حالم کوکل تختیتندن اندن او زک سلطان او لسوون یار بب دیگر کیم عدل یوق یا ظلی حق هرال ایله پ ضفولی بولدی کنج عافیت میخانه کجنه</p>	<p>بئم نئچ بیچ کیم زار و پر شان او لسوون یار بب دامدم جورلر در چکدیکم بی رحم بسته دن کور ببندیشیدن قتلده او اول هایی بود در ددم چقمن انسه لر تندن چاکیپ پیکانک اول سروک چخان او لسوون دل جروح بیکان او لسوون یار بب چفاو جور ایله مفتادم آنکه سر زن لوز حالم دیگر کیم عدل یوق یا ظلی حق هرال ایله او لسوون یار بب ضفولی بولدی کنج عافیت میخانه کجنه</p>
--	---


Pêvek-V: Destxeta Xezela Pertew ya “Ya Reb”ê, (Nusxe: Kemal Badıllı)



**Pêvek-VI:** Xezela Pertew ya “Ya Reb”ê, (Amêdî, 1978).

ز ده نگنی «ب» (۳)  
وه کی من قدت آنچه دلک زارو په رسان هدر نه بت یاره ب  
نه سیرو ده ردداریت داغنی هجرانی هدر نه بت یاره ب  
و دهستی وان بتان هدر جهوزو غیزاو جه فاکیتیسم  
نه سری کافران مثلا مو سان قدت هدر نه بت یاره ب  
زو قم تلا من نهود دلبه مو دام نهند شه ده ر خاطر  
و ون نهند یشه اگنی خاطر په رسان هدر نه بت یاره ب  
وه کی مو عنادی جهوری ده ردنی وان بوم و م خو پی گرت  
مه آنکه جهوده و جه خایا وان پچو پایان هدر نه بت یاره ب  
نه آنکه رج بو مه بن چاران نه وان عدل و نه وان انصاف  
و غیری وان نه مختنی دن مه دلstan هدر نه بت یاره ب  
کنان و قوس و نه بسرویان و غه مزان تیره بارانه  
نه خالی نه دل مه جروح و نه په یکا هدر نه بت یاره ب  
ن گونجی میکه دی کونجه دلک ته مام (از عایت په رتو)  
کو کر ته حصیان نهود کو نجه دلک نه ویران هدر نه بت یاره ب

